



AHMEDE

HEPO

REWIYE BE MAL

(BIRANIN - POVEST)

AHMEDÊ  
HEPO

S

RÊWÎYÊ BÊ MAL  
(BÎRANÎN - POVËST)



BAKÛ-2006



### وەزارەتى رۆشنېرى

#### بەریوەدەرایەتىي گشتىي چاپ و بلاوكىردىنەوە

- ناوى كتىب: رەتىن بىن مال (بىرانىنا - پۇقىتىست)
- نۇرسەر: نۇرسىنى: ئەحمدى ھەپقىز.
- چاپ: يەكەم (٢٠٠٧)
- سەرىپەرشتى چاپ: سەددە شاكى
- نەخشەسازى بەرگ: شىروان فاروق
- نەخشەسازى ناودەرگ: نەزىن عابدوڭلار.
- لەكتىيەخانى گشتى ھەولىر ئەمارەت سىاردنى (١٩٩٤) سالى ٢٠٠٧ دراوهەتى
- چاپ : بەریوەدەرایەتىي چاپخانى رۆشنېرى / ھەولىر
- تىۋاڑى: ٥٠٠ دانە
- نىخ: ٣٠٠ دينار

Rêdaktorê berpirsiyar-

Torin Pervan

Rêzkarê tîpêñ kampûtêrê:

Selaheddînê Barzanî

Rastkar:

Eslîya Îsmayîl

Pirtûka ne xwendî mîna wê yekêye, tu bêyî ser  
ber-fêkîyanra bisekinî, tem nekî, lê bêjî:

-Ew tirşin, ew bê temin!

Xwendevanê birêz! «Rêwîyê bê mal»-ê bixûne,  
paşê tu Xwedayê xwe, ci hêjayê didî bidê!

Ahmedê Hepo

## XWENDEVANÊN HÊJA



Ahmedê Hepo û Huseynê Qadir

*-Li ser çiyayê herî bilind,  
Yanê li bal kurdê ser bilind,  
Erê, bira herdu jî yekin.*

*Huseynê Qadir*

Jîyanêda mîranî, mîrxasî, gernasî yek jî comerdî nabe para her kesî. Xwezila wî kesî ji van nav-nîşanbilindaya yek, dudu bal wî hene.

Gel yên awara gotine:

-Mîr heye kulma xwe da şêre,  
Mîr heye aqilê xwe da şêre,  
Mîr heye comerdîya xwe da şêre.

Yek jî gotine: -Mîr hene xemila mîrane!

Wekî em bêjin Huseynê Qadir him kulma xwe da şêre, him aqilê xwe da rêzaneye, him jî bîna camêriyê jê tê, qe ne şaşin, ne cewtin.

Ji carenûsa wî çend hevok.

Huseynê Qadirê Nadir sala 1953-a li gundê Develîyê, nehîya Vêdîyê, komela Ermenîstanê hatîye dunê. Pey mekteba navînra, bona xwendina bilind dest bîne li Rûsîyayê diqeside, înstîtûtêda dixûne, ew xitim kîrinê diploma sexmankar-muhendisîyê ênêrgêtikayê destîne.

Çawa rîya her kurdekî di jîyanêda dolhêr-dolhêr, fitil bi fitile, Huseynê Qadir jî, nava wê xe-leqêra derbaz dibe, bi malbeta xweva tê dertê sere-kbajarê Azerbaycanê-Bakûyê. Mêtropolîtêna bajarê Bakûyêda dikebe ser kar. Ev mirovê kardar, zane û destemel nava wedekî kinda bi karên xweye qencva tê naskirinê û ew dibe berpirsiyarekî rîyên bin erdê.

Huseynê Qadir xwedanê malbeteke navdare, ji ber ku ew jîyanêda xemxure.

Rojekê em çend rewşenbîr beştarî dora destexanekê, mîvandarîkê bibûn. Yekî ji min pirsî:

-Apê Ahmed, pirtûka teye nûh nivîsî heye?

-Belê, heye, -min bersîva wî da, -povêst-bîranî-na bi navê «Rêwîyê bê mal» nivîsiye xilaz kirîye, lê di alîyê aborîyêda dijwarîyê dikişînim, wekî wêya bidi-me weşandinê. Bi dil êşî ewa quncikê tarîyêda maye.

Êmê çend çirika seqirtiyê domand. Huseynê Qadir ew seqirtî teriband, bi comerdî kêlimî:

-Ezê piştovanîyê, alîkarîyê li «Rêwîyê bê mal» bikim, bila ew bigihîje mala xwe, bê weşandin.

Me gişkan hevra-hevra wîra malî ava, zef-zef sipas got.

Ahmedê Hepo -----

Vê demê rojeke sala 2003-a, dema qewm-pismam, dost-hogir beravî rêstoraneke mezin bibûn û 50 salîya Huseynê Qadir bi heyte-hol derbaz dikirin, kete bîra min. Ez jî wê şayîyêda bûm.

Ez û Huseynê bira nikî hev sekinîn me wêne da kişandin. Gava wênekêş wêne da me, Huseynê maqûl li pişta wêne awa nivîsî:

-Li ser çiyayê herî bilind,  
Yanê li bal kurdê ser bilind,  
Erê, bira herdu jî yekin.

Wê demê nêta van gilîyan ez hingavtim. Naha jî dixwezim zelalîkê têkime nava wê nêtê, kurt ser rawestim.

Min berê jî zanibû, ku Huseynê Qadir bi ruhê xweva helbestvane, lema jî car-cara helbesta dinivîse, comerde, bilindayî, paqîşîya çîya bal wî heye. Çîya jî timê bûne piştovanê mirovan.

Me jî birîyar kir, wî wêneyê me tev kişandî, bi rêzen Huseynê Qadir destpêbûna pirtûkêda bidine weşandinê û bila rind bê zanebûnê, ew gilîyana badilhewa nehatine ser zara.

Belê, beqî xemxuriya Huseynê Qadir, ewledê kurdhiz «Rêwîyê bê mal» ji quncikê tarî derket û berê xwe da xwendevanan.

## Jİ JANA DİL

Xwendevanên delal!

Ev pirtûka destên we him bîranîne, him povêste.

## BÎRANÎN...

Meydana gilîyê bîranînê gellekî fireye, him jî şirîta wê dirêje. Wetaya wê kûre. Ya yekê, qew-mandinên qewimî ta-derzîyêra dikî, ya duda, ewa ji xwîn-qinêtê, ji bîr-bawerîyê, ji hiş-sewdayê mirovan tê. Lema dibêن bîranîna welat, bîranîna axa helal, bîranîna dayîkê, bîranîna zimîn, ya malbetê, ya hub-hizkirinê û yên mayîn. Wekî ev giş ser şirîta bîranîna gel, di nava şanîkên (hucêyre) her mirovekîda hatibe cîwar kirinê û mîna xeleqên zincîran ber hevra, ser hevra di hişê netewîda hatibe derbazkirinê, hûnandinê wê demê ew gel xwedanê çarenûsa xweye, rizgare, serbeste û kakîlsirîn-xwedan Welate. Çima? Ji ber ku, nava wanda Yekîtî hebûye. Lê ji wan yek qetîyabe, welat dibe berdest, ax ji alîyê neyaranda tê pêpeskirinê, dayîk hey hênsira dibarîne. Zimanê te tê wegerandinê, hub-hizkirin dibe derew, biçûk-mezinê malbetê nayê kivşê... Şanîk jî usane, wekî ji şanîkê mirovan yek biteribe, ew timê nexweşe û jîyanêda nabe xwedanê tu tiştî.

Ev qenderana-bîranîn û şanîk bona gel pirr-pirr evranin... Lê em bi xwe jî nizanin di rûyê çida, kîngê û kîjan bîranîn, şanîka me hatîye teribandinê. Lê idî

Ahmedê Hepo -----

em ewê yekê rind dizanin, ku eva çendî-çend salin hemû Bîranîn, Şanîk û Yekîtiya gelê me mîna polayê hevra hatîye kelijandin.

Ev bîranîn û şanîkên, ku me derbarê wanda çend gilî qal kir, ew bona nefsa gele!

Rojekê me jî, ji Azerbaycanê bere xwe da parwelatê Krasnodarê-Rûsiyayê, çûyîn-hatina me, kirinên bûyî, qewmandinên qewmî bûne bîranînameye taybetî. Ew bîranîn rastîye, heqîye, neqîşê dewra wî welatiye. Min ew neqîş nava çend rojanda ber çavêن xwe dît.

Ez nava gera çend rojanda bi carekêva hatime ser wê nêtê, bûme şehedê wê yekê, wekî gava welat ne welatê teye, çîyî te tevî neqşê dewrê, neqşê wî welatî tune. Ew neqîş xirabe, yanê rinde, pûçe, yanê bi kakile, bedewe, yanê bê rewş-zîşte tera ci ey birao, ey xûşkê! Çavêن xwedanê welat ronbe! Kîye xwedanê welat? Welat ser navê kîjan gelîye, ji ewledê wîye hêlecanê, landikêda girtî hetanî serkar-rêvebirê komardewlet û hukumetê xwedan biriyare. Lê tu, kesê ku hatî vîra wedelî, yanê her tîmî qesidîyî qoncê ber destê wanî. Çawa ser qonc qırşık-mîşik, dar-êzing, goşt-hestû û yên mayîn têne qet kirinê, têne hûr kirinê, yê xwedan daraz ser te hemû qanûna, biriyara, daxweza dilê xwe mîyaser dike. Ew rind zane tu «mêvanî» hatîyî. Mêvan, hatî ji çûyane... lê bi culet dikarim bêjim em idî bûne xwedan welat, naha kî dixweze bila bi mêvanî here-bê...

## POVÊST...

Meremê me ne ewe em şirovekin povêst çiye? Raveya wê wêjezana zûva dane. Her tenê çend nêta bêjin, lê çima ev pirtûk him jî povêste? Wirda nîgara çend mirovan heye. Qewmandin hevra hatine girêdanê. Bi pivandina sala ewana dûrî hevin, lê gorî pîvandina jîyanê ewana mîna çiya pişt dane pişta hev. Bedew-nivîsar, rêzên gili-gotina, kêm-zêde nitirandinâ xwezayê heye. Çi heye, çi tune ew karê xwendevanaye. Bila ew nêtên xwe bêjin. Me him qewilên bîranîna, him jî hinek qewlên povêstan hevra dane girêdanê, wekî bîranîn-povêsta «Rêwîyê bê mal» baş bê xwendinê. Ewa ser rastî-heqîyan hatîye nivîsarê, nitrandinê, cî-cîna serda zêdekîrinêne me ji hundurê kakilê wê derketine holê. Me qe nedecandîye, wekî zorê qewmandina bînin wêra bidine hûnandinê.

Torîvan Ahmedê Hepo, nivîskarê Kurd,  
Endamê Yekîtiya Nivîskarêne Azerbaycanê

## RÊWÎYÊ BÊ MAL (BÎRANÎN - POVÊST)

Ez qurbana wî serîme, wekî serkarîyê li sed serî dike, lê ew serîyê nikare serkarîyê li serîkî bike, bila ew qurbana minbe  
(Ji gel)

Ji roja ku pîyê mirov erd digire rê diçe, ew hey rêuîye. Rêwîyê rîya dûr û nêzîk.

Îro, 23 tebaxê, sala 2003-a, rêuîyê rîya parwelatê Krasnodarême. Rûsîyayêda parwlatekî pirr mezine...

Sedem çibû min berê xwe dabû wî parwelatî?

Ji sala 1988-1989, besêke kurdên ku, bi salzemana li Ermenîstanê dijîn, hatine vira cî-war bûne. Gava ermenîya pirsa Qerebaxa Çîya derxiste holê, dest bi dew-doza Ermenîstanê-Azerbaycanê bû, ermenîya bi zorê bere weke 200 hezarî azerî, 20 hezar kurdên musulman kir. Ew kurdên dero-dero kirî hinekan bere xwe dane Qazaxistanê, Azerbaycanê, parwelatê Krasnodarê û li cîyên Rûsîyayêye mayîn.

Xwestina min ew bû, wekî herim bi çavêن xwe rewşa wan Kurdan bivînim, qewm-lêziman, heval-hogiran, tîrbêن kesêن dunya xwe guhastî zîyaretkim.

Danê rojeyî duda avtobûsa Bakû-Krasnodarê ji têrmînalê derket. Ya bi mirovan tijî , barê giranova barkirî, kire gure-gur û rîya rêspûblîka Azerbaycanê da ber xwe, rêket çû.

Ahmedê Hepo

Jineke rûs nikî min rûniştibû. Dibên rêu zû hevra dibine nas... Dihate kivşê ewa jineke xwendîye, çawa dibên, yeke ser xweye jîre.

-Hogirê minî rê, -ewa berbirî min bû, -emê nêzîkî du rojan rê herin, were em hevra bibîne nas.

Ewê awa got û destê xwe dirêjî min kir:

-Tatyana Barîsovna.

Min jî destê xwe dirêjî wê kir û nav, paşnavê xwe got.

Ewa jî diçû bajarê Krasnodarê. Bi gotina wê ewa berê li Azerbaycanê jîye.

Ro idî şikestibû em gihîstine dawîya tixûbê Azerbaycanê. Di niqitka kontrolîyê-lêhrandinê nasnama her yekê me ji me stendin, weke sehet nîvekê şûnda ew li me vegerandin û em derbazî tixûbê Rûsîyayê bûn. Vê qasê Tatyana Barîsovna'yê bi hesretîke mezin got:

-Şikir, ez idî li mala xwe me.

-Biborînin,-min ji wê pirsî,-ne we got ezê herime Krasnodarê, hetanî wê hezar km zêdetir rê maye.

-Hogirê minî rê, rind bizanibe, rîya mala mirovan ji tixûbê Welatê wî destpê dibe.

Min qe dengê xwe nekir, hatime xitimandinê. Tevzîyêñ kulê laşê minra bezîyan. Vê roja havînêda, ku derva qije-qija tavê bû, hundurê avtobûsêda ji mirovan, ji destî germê bi dijwarî bîna xwe dikişand, ez cemidîm, lerizîm. Min tê derxist poz-guhê min hatine xitimandinê, nikarim bîna xwe bikişînim.

Ahmedê Hepo -----

Carekê-duda kire xize-xiz. Jinika rûs bi rewşa min hesîya û berbirî min bû:

-Hevalo, çima usa sipîçolkî bûyî? Reng li te firîyaye. Dilê we dêşê?

Ewa qe hîvîya bersîva min nesekinî ser axavtina xweda zêde kir:

-Dermanê dilêşê bal min heye.

Ewê xwest dermîn derxe bide min, lê min nehîst. Min xwest wêra bêjim:

-Dermanê :êşa dilê min li tu dermanxane-aptekêñ dunyayêda nayê firotanê. Dermanê dilê min-welate, ew jî hê destêneyarandaye. Lê ez zanim welatê minê seranser azabe. Bila bijîk, loxmanên me dermanekî dijî dilêşê nûvedankin û navê wî dayinin -«Welat».

Min hêdî-hêdî xwe qunculande ser hev, weş-weş bûme xwedanê hiş-sewdayê xwe, hê, paşê germayê ez jî hingavtim û xwe-xwera kire piçe-piç:

«Ê dunya gewrikê, wekî usane eva nêzîkî 70 salaye ez rê diçim, lê hê negihîştîme mala xwe. Wekî usane em 30-40 mîlyonin, kesek ji me hê negihîştîye mala xwe. Jinika rûs dibê:

-Rind bizanibe, rîya mala mirovan ji tixûbê Welatê wî destpê dibe. Erê, xuşkê, tu rast dibêjî... Welatê min neyaran zûva kerî-kerî kirine, zûva tixûbê Welatê min teribandine. Ez rêuwyê bê malim».

Pey çend sed mêttranra avtobûsa me dîsa dane xayîkirinê. Eva jî niqitka lêhrandin-kontrolîya Rûsî-yayê bû. Li wira xênî ji lêhrandin nasnaman, her kesê

Ahmedê Hepo

ku ne binelîyê Rûsiyayê bû, dêklarasîya-daxûyanî  
dane tijî kirinê.

Hêjaya daxûyanîyê stendinê şûnda em ji wir jî  
rêketin.

Tatyana Barîsovnayê dîsa berê xwe da min û bi  
şabûn hewal da:

-Îro roj, roja mine. Ez bin burca keçikêda bûme.  
Biborînin, lê hûn bin kijan burcêda bûne?

Te hew dizanibû bi vê pirsa xweva jinikê singê  
min qelaşt û dest avît dilê min guvaşt. Daxê, janê ez  
hildam.

Min çendî-çend cara ji dîya xwe pirsibû:

-Dayê, ez bi gorî, te kîjan salê, kîjan mehê, çendê  
mehê ez anîme?

-Ez heyran, -ewê mîna miroveke sûçkar digot,- ez  
çi zanim. Tu du-sê salî bûyî em sûrgûn (nefi) kirin.

Timê bersîva wê ev bû û paşê kere-ker ser dêmê  
ercimekda hêşir dibarandin.

Naha ez vê jinika rûs çawa serwaxtkim, ci bê-jime  
wê. Bêjime wê, wekî lîlê, hetabê tu hew dizanî  
dayîka kurd jî mîna we xwedan welat, xwedan dew-  
lete, wekî bixûne, serbestbe, zara wê bûnê, here  
dîwanê bi dilê xwe navekî ewledê xweke û şeha-  
detnamê bistîne? Na! Ez wêya çawa bidime serwaxt  
kirinê, wekî eva çendî-çend salin dujmin, neyarêne  
kurdan ser şehadetnama mera qelema reş kişandine.  
Naha ez wêya çawa bidime serwaxt kirinê, wekî me  
pê avitiye sedsalîya bîst û yekê, jina kurd îro jî nikare  
navekî netewîyê xweyî taybetî dayne ser ewledê xwe.

Min xwest bêjim, lêlê, serbilind, kaw-kubarê, gava zar-ewledê dayîka kurd dibe, ewa diçe awa gotî dîwana hukumeta xwe û dibê:

-Minra keçek bûye, yanê kurek bûye. Ez dixwezim navê keçikê daynim Zînê, Evîn, Bêrîvan, navê kurik daynim-Memo, Bahoz, Kawa, Zinar. . .

Xwedanê dîwanê dibê:

-Na! Binihêre, ser pêşxwîna hanê çend «pirtûk» hene. Here, rûnê, wan «pirtûkan» bide ber xwe binihêre, kîjan navî ji wir bêjî, emê wî navî daynîne ser ewledê te û şehadetnamê jî binivîsin, bidin.

Dê, yanê bav wan navara qayîl nabin, hey diçin-tên. Roj dibe hevtê, hevtê dibe meh, meh dibe sal. Îdî dê-bav ji bîr dikin, ewledê wan kîngê bûye. Ew zar mezin dibe, dibe yê ber kar, yê ber zewacê, lê bi fermî navê wî, yê wê tune. Ew kes, ew kesa ser axa kalbayên xwe dibe yekî, yeke «mêvan», mêvanê, mêvana bê rûmet, dibe yekî, yeke beyanî, yekî, yeke bê nav. Lema jî min bi dengekî fetisî got:

-Tatyana Barîsovna, ez hê burca xwe nizanim.

Ewê hewzanibû ez heneka dikim û bû pirqe-pirqa wê kenîya.

Min dîsa xwest wêra bêjim:

-Lêlê, ya bi nav, bi nasnameyê, ser min nekenê, ser neyar, cîranêñ me, ser dewranê usa bikene, bila ewana ji hovîtiya xwe şermkin, bese dunya li wanra hev hatîye, naha jî dewir, dor yameye!

Rêva, hetanî dawîyê em çendî-çend cara dane sekinandinê û ji mîzekara hatine derbaz kirinê. Ez

hatime ser wê nêtê stendina hêjaya daxûyanîyê, lêh-randina çend cara giş bona wê yekêye, wekî xwedanê axê hatîyanra, mîvananra dixweze bêje:

-Binê, fesalbin, bizanibin, axa me ne bêxûyîye. Bi parêzgehe!

Ez jîyanêda ne mirovekî çavnebarim. Lê him ew gotina jinika rûs, him lêhrandina vî awayî çavnebarîyê hundurê minda serê xwe bilind kir, ez sotim, peritandim. Min dîsa nêta jinika rûs wekiland:

«Rind bizanibe, rîya mala mirovan ji tixûbê Welatê wî destpê dibe». Belê, axa welatê min beş-beş, par-pare, tixûb jî destê neyarandaye, ger em tenê rîya jîyana beşeke kurdan, wa gotî, yên welatê Rûs, bîr bînin xwendevanê bi xwe tê derxe çawa çarenûsa wana dorhêl-dorhêl li hev hatîyê alandinê.

Jîyana wane ser axa kal-bavan ya bereka çiyayê Agirîyê, paşê koçberîya berbi Ermenîstanê, Azerbaycanê (xênî kurdêن bingehî), nefikirina salên 1937-a-1944-a, Rêspûblîkêن Asîya Navîn, Qazaxistan, Rûsîya bê sero-bin û cî-warêن mayîn. Sedem û şîrovekirina van pirsa mijareke dinêye. Ezê vegerime ser rîya rêuwîtiya xwe. Avtobûsa me ji tixûbê Rûsîyayê livitînê şûnda te hewzanibû em ketine nava dunyake nûh. Rîya bere-ber, ya rastê mîna kefa destêن mirovan, xwezaya heftreng, hêwa hênik, tarîya şevê, ronahîya fanûs-farêن avtobûsa «Daêwo»-ê dêmê me rêuwîya hinekî xwes kiribû. Naha ez ji kîjan tixûbî destpêkim herime mala xwe û mîna Tatyana Barî-

sovnayê bi kubar, bi ser bilindayî, bi hetabî, bi qure,  
bi şabûn bêjim «Şikir, ez îdî li mala xweme».

Belê, «Daêwo»-yê rîya şeva kere-lal dabû ber xwe  
û sehetê 100-120-km dişûşilî. Rêwî payê pirr razabûn,  
hinek jî mîna min dihênjîn. Vê gavê hezar nêt,  
xwestin tijî dilê min bibûn û mîna pêlên bera ber bê  
dihatin hiş-sewdayê minra derbaz dibûn. Ë, li vê axa  
dunya Xwedê mirov çi dikin, çi nakin...

Mirovan axa gerdûnê beş-beş, kerî-kerî, pirtî-pirtî  
kirine û ser singê wê şayiyê-şînê, rev-bezê, xwîn-  
hêsiran, ken-henekan, derm-daxbûnê, hilweşandînê-  
çêkirinê derbaz dike, qat-tayê erdê serhevda dide  
welgerandinê. Qe tu nizanî ev bende-mirov li gerdûnê  
şaye, posîdeye, dikene, yanê digirî, direve, yanê  
hêmîn rûniştîye, dixwe-veduxwe, yanê jer vedireşe.

Gelo kîye hetabê vê dunyayê? Yê ku padşa-haye,  
prêzidênte, serekwezîre, serekkomare, yanê yê ku  
şeran radike, xwînê dide rêtinê, qetikarîyê dike,  
têrorizmêva mijûle, yanê belengazê ber dîwêr rûniştî,  
parsekê, ku destê xwe dirêjî hatî-çûya dike, yanê ew  
hukumdare, yê ku qe xema tiştekî nakişîne, ne rehm,  
însafa wî heye, ne nexaşî, ne qezîya, ne mirin dikeve  
bîrê. Lê wedê dikeve ber xof-tirsa mirinê pêşiyê dest  
davêje dirav, mal-milkê bi heramî beravkirî,  
«Merdtîyê» dike, xerc dike. Hê ulm, ol-dîn dikeve  
bîrê. Diçe ser doxtiran, mellan, şeyxan, pîran, ocaxan,  
ziyaretan digere. Dikeve bîrê, wekî bimire her tişte  
serobinbe, wê sê mêtî kefen xwera bibe. Ew sê mêtî  
çîtê sipî jî çend rojan şûnda wê birize. Hê dikeve bîrê,

Ahmedê Hepo -----

ewî çawa xwîna mirovan mêtîye, ruhê wanra lîstîye, a usa kurmê têkevine nava mêtûyê wî û wê xwera hey dewranê derbazkin.

Lê kîye hetab? Ev avtoajoyê «Daêwo»-yê me. Yê ku hukumdarîyê li avtobûsê, rê û rêuwan dike. Ji germê, tîbûn-birçibûnê zarok digirîn, ser mezinda diqîje, wekî nehêle zara te bigirî. Dayîk nêzîkî wî dibe, ber digere:

-Ez heyran, eva çend sehetin em rê tê, çend deqîqan bisekine, bila bîna zaran bêne ber wan!

Ew mîna melkemotekî, celatekî şûrê xwe dikişîne û dibêje:

-Ez nikarim her deqîqê bisekinim!

Çerx-fermana avtobûsê destê wî daye, rîya bere dirêje şimşet li pêşiyêye, xema wî tiştek nîne. Gelo qe dikebe bîra wî, wekî diqewime nişkêva qezîyake usa dest bide, çerx ji destê wî derê, him ew bi xwe, him ev hemû rêuwî têkebine bin axa sar. Qe kesek tune hinek bendaran bêje:

- Heylo kundê merzelan, li ser axa dunyayê ci dikî, nakî, bi fesal, bi rehm, bi însaf bike!

Ez dibêm dibe hema hetaba dunyayê ev jinika rûse, ya ku kêleka min rûniştîye. Hê 1000 km zêdetir ewê rê here, lê bi dêmekî geş, bi şabûn dibêje:

-Şukur, ez idî li mala xweme.

Çima usa bi firanax dibêje? Ji ber ku welatê wê heye... Ewe ne sêwîye...

... Em-rêwî idî ketibune kûraya şevê. Wedekî şevê ketime xewê. Kêm razabûm, zêde razabûm,

Ahmedê Hepo -----  
nizanim, çavêن xwe vekirinê, tarîya şevê cîyê xwe  
dabû berbanga rojê.

Sehetekê-duda jî me rîya xwe domand. Avtoajo tê derxist rêwî nerehetin, zaran deng dane dengê hev digirîn, lema jî avtobûs da kevîlêvika rê, sekinî. Me rêwîyan bê sebir rê nedida hev zû-zû derketine derva. Rastî jî azayî şirîne. Me hêwa paqîş daqurtand, pizav da xwe, dest-pîyê xwe bakir û ji qermayê aza bûn. Dor-berê xwe mîze kir.

Alîkî zeviyêن gulberanda-gulberbirojan bûn, alîkî zeviyêن silqabûn. Devê rêda jî pêda-pêda darbûn. Nizam çima vira mesele-metelokeke gel kete bîra min: «Dar bi kurman, mirov bi derdan dikeve».

Qasek derbaz bû, me-rêwîya pişta xwe da xwezaya rengîn, tijî avtobûsê bûn, her yek cîyê xweda rûnişt û berê xwe da rîya şûstî-mûstî. Rîya me hate domandinê.

Min sibaka pêşberî avtoajora li rê mîze dikir. Te hew- dizanibû, rê zû-zû ser hevda qat dibe, tê beravkirinê û vê gavê ewê bê dawîyê. Lê avtobûsê çiqasî ewa qevz dikir, te tirê ewa qesbende dirêj dibe. Min sehetê nihêrî, ew sûtkek-şev-rojek bû em rê dihatin.

Danê nîvro ji nîvro derbaz bibû. Li cîkî çend avayî lê, em sekinîn.

Avtoajo agahdarî da:

-Rêwîno, peyabin, emê sehetekê vira hêsabin. Nîn buxun.

Ahmedê Hepo -----

Qe me nizanibû sehetek çawa hat ser mera derbaz bû. Dîsa avtobûs, avtoajo, rê, rêu. Gel gotîye:

Dîsa ew aşe,  
Dîsa ew aşvane.

\* \* \*

Dîsa ew kevçîye,  
Dîsa ew kode.

Dibêñ, rê dilara fireye. Lê dilê me idî teng bibû, rîya me jî kurt bibû. Tava ku idî zer dikir, paşê qijiland tirêjên xwe hêdî-hêdî dikire nava perda êvarê û minê dibû. Tarîyê weş-weş cîyê xwe digirt. Gava avtobûsa me gihişte Krasnodarê bajar nava ronahîya lampada birq vedida.

Bi gorîya min rêu gişk şabûn, lê ez posîdebûm. Rêwîyan rê nedida hev peyabin. Ez giran-giran peya bûm. Avtoajo bi henekî gote min:

-Çima usa, mîna kalekî hiz-hizî peya dibî .

Min qe dengê xwe ne kir. Ezê bi ci şabûma. Axinîke kûr rihaşt. Ji welatekî xerîb, hatibûme welatekî xerîb...

Avtobûsê peyabûm, çend mêtرا ji wê dûrketim û çentê destê xwe danî erdê û mîna parêzgekî ker-lal sera sekinîm, roja min, êvara min, şeva min tev-hev bibû. Ez ji rewşekê ketibûme rewşeke dinê. Kî pêş kêva hatibûn, hinekan hev hemêz dikirin, dihatine

rûyê hev, hinekan dest didane hev, bi kêfxwêş kelmelê xwe hildidan diçûn. Qasek derbaz bû.

Ez ber avtobûsa vike-vala tenê mam. Ser qewilê me, gotî pêş minva jî bihatana. Min dora xwe mêze kir, lê kesekî nas tune bû. Ketime nava dunya xwe min hew dizanibû vî bajarê mezinda ez tik-tenême. Hezar mitale hatin serê minra derbaz bûn. Bîna min teng bibû. Min tirê hewa nagihîje min, di nava xweda tême pişavtinê.

Doxtirîyêda nexweşik heye jêra dibêjin dêprêsiyaru h şikestî. Te qey digot ew nexweşî li min alîyaye.

Ew 20-25 deqîqebûn ez ser çenteyê xwera sekinbûm û dunya min tev hev bibû. Min dora xwe nihêrî, ji cîyê ez sekinbûm hinekî wê wêda baxekî bi şen hebû. Sê mûjîka (mêrkoka) «destexan» vekiribûn ci dixwerin nizam, lê zû-zû stekan hevdixistin veduxwerin. Bîna vexwerina wan mîna tiştekî genî dihat. Vira dîsa ew çend giliyê jinika rûs kete bîra min. «Rind bizanibe, rîya mala mirovan ji tixûbê Welatê wî destpêdibe». Dova ev giliyana herek bibûne çendî-çend kelem û hey dilê min didane ber janê, ber kulê. Hişê minra ew yek derbaz bû, diqewime hetabê dunyayê ev mûjîkanin. Diqewime. Tixûbê wan heye, heye, welatê wan heye, heye, li mala xwenin. Belê! Lê ez kîme?...

Min birîyar kir çend deqîqa jî sebirkim. Kesek pêş minva neyê, ezê çantê xwe hildim herime wî baxî. Qe mîvanxane jî ne pêwîste...

Wura rûnêm, rabim, hinekî virda, wêda bigerim, bêm dîsa rûnêm û bere xwe bidime rîya şerkarîya meye azadarîyê.

Ji agirê şûrê Kawayî hesinkar gavdim, nava bi sedan şoreşên meye dijî zulmê, bindestîyêra derbaz bim, bêm derême sedsalîya XX. Vira jî xwe heyrana bi dehan şerê bona azadîraya Kurd-Kurdistanê bikim û dîsa pirskim:

-Lê çîma hetanî roja îroyîn rîwîyê bê malim?

Kî bawer dike bira bawerke, kî bawernake bila Xwedê tevî çarenûsa wî be, bi namûsa xwe kim vê weşê çavê min reşeva hatin, min ew dane ser hev û yekî nûranî di nîgara Şeyx Seyîdê ji Piranê li bilindaya Agiriyê sekinî bû gotê min:

-Qe ber xwe nekebe. Sedsalîya XXI di Rohilata Navîn da Kurdê bibine serbilindên dest ne gihiştî, emê bibine xwedanê tixûb.

Vê gavê yekî destê xwe stûyê minra bir. Pak bû ew nehate rûyê min. Ez qe heznakim mîr bêne rûyê hev. Yek jî, ne axir, em kurd dest didine ser singê xwe kêf-halê hev dipirsin. Ci edetekî rinde.

Ê, ez hinekî ji pirsê-qewmandinê dûrkêtîm. Yêñ pêş minva hatî camêrê Ûsivê Evasê Balo Bala-yêv, yek jî kurê wî Kerem bû. Min qestbende ev paşnav anî holê. Bi vê paşnavê, çawa dibêñ, êleke giran tê naskirinê. Ûsivê Evas yekî bejinbilind, dest-pê, bi rengê xweva qemere. Qe nizam xwendina wîye navîn heye, tune, lê mirovekî haj dunyayê heye.

Ez ser bîranîn-zêna wî heyir-hejmekar bûm. Bawerbikî, hemû malbetên kurdêni ji Ermenîstanê derketî yeko-yeko nas dikir. Zanibû kîjan malbeta kurdan li Ermenîstanê kêderê jîne, ermenîya bere wana danê şûnda kî hatîye Krasnodarê, kî çûye Azerbaycanê, kî çûye Qazaxistanê û cîyê mayîn.

Zarşîrîne. Zargotina gelê xwe rind zane, dengbêje, merd-comerde. Belê, ew kurê xwe Kerem, bi maşîna «Mêrsêdêş»êva pêş minva hatibûn.

Me kîf-halê hev pirsî û maşînê sîyar bûn. Rêva çend pirs dane min;

-Tu çawa hatî? Li Azerbaycanê ci heye, ci tune? Filan Kurd, bêvan Kurd çawane? Jîyana wan çawa derbaz dibe? Û yên mayîn.

Hetanî min bersiva pirsên wî dan, Kerem ber avayîkî hawe sekinî û karnîyarî min bû:

- Apê Ahmed, keremkin peyabin, ev malameye.

- Malî ava,-min bersiva wî da, -û ji maşînê peya bûm.

Hewseke mezin, paqîş, ya bi rewş ez heyir-hejmekar hîştim. Çend kes ser rûniştek û krêşloyan rûniştibûn. Ewana gişk pêş me va rabûn. Min hinek naskirin, hinek na. Me bi şîrînayî kîf-halê hev pirsî. Xût li hewşê, bin çartaqa mezine ser şîfîrkirî, rûniştin. Keça xûşka min sîte Almastê-jina Üsivê Evas, wê deqîqê destexana çayê danî.

Me wedekî dirêj dor destexana çayê hevra gellek pirs qal kir. Îdî westandina rojnîvekê, posîde bûn, tenê bûnê koça xwe ji ser min bar kiribû. Bîna min hatibû

### Ahmedê Hepo

ber min. Vê gavê xwedanê malê Ûsivê Evas bi dengekî qayîm got:

-Canim bese, bihêlin mîrik rêke dûr hatiyê. Rabin em derbazî mal bin, nanî hazire.

Xwedê malê şenke. Destexan bi risq bû, me xwer, vexwer û dîsa beravî bin çartaqê bûn. Heta wedekî şevê, bawer bikî, derbarê her malbeteke kurdaye li Krasnodarê, derbarê malbetên mayîn da pirs-hewal hevra da girêdanê. Ser rewşa Kurdistanê, herekên heyî êpêce nêt hatine ser zara.

Camêrê, ku bona qedirê min hatibûn xatirê xwe xastin cûn. Ûsivê Evas kete pêşîya min û ez anîme odeke fire û got:

-Bira, tu çend roja vira bimînî, bizanbe eva oda teye. Têda rabe, rûnê, binivîse, razê.

Min bi şekirdarî-şabûneke mezin qayilbûna xwe da wî û got:

-Xwedê malê şenke, te ji, ji camêrtiyê kêm neke!

Belê, odeke fire bû. Bi kel-melê nûhdemva hatibû xemilandinê. Xwedanê malê cûnê ez zû ketime nava cî û têderxist westîyame, xewa min tê.

Çawa çîrokada dibêjin, ez gellekî razabûm, yanê hindikî nizanim, ji xewna dîfî veciniqîm, rabûme ser xwe. Min xewnêda dît, ez zarekî 9-10 salîme. Li gundekî mezinim. Minra dibêjin, wekî ev gund gundê zarotîya teye. Avayê gund yek ta, du ta, bi xemil, hewşen malaye fire dor bi çarmedor bûn. Ew nava darêñ fêkîyanda bi xemileke nebinîyayîva hatibûne xemilandinê.

Alikî darêن tûtan, zerdelan, sêvan, hurmîyan , sincan, yên ku hinekan barê xwe danîbûn, hinek bin behrê giranda çiqilên xwe xar kiribûn, alîyêن dinêda berojêن pêşberî gund, kulîlkêن reng bi rengî, lema-lema avêن kanîyan, xuşe-xuşa çemê zelal mirov zendegirtî dihîst. Te dixwest xwe bidî fêza gund, ser kevirekî rûnêyî û bi sehetava vê dîdema gund mîzekî û bi ruhê xweva hêسابî. Paşê te dinihêrî gund nava du çiyayêن bilindda cî-war bûye. Çiyak nêzîkî gund bû, yê dinê êpêcekî dûr bû. Li kolozê çiyayê dûr berfê qerqaş dikir, li berojêن wê belekî dihatine kivşê. Kerî bizinêن qerqaş rahaştibûne beroj dicêrîyan. Zarêن gund hinekan xwe dabûne bintara belekîyan. Yekê-duda bizin didotin, yekê-duda berfê belekîya dihanîn dikirine nava kodêن şîr. Wê şûnda bi ken-henek hevra digotin:

-Warêن «Şîrberfê» bixwin!

Zar beravî dora kodan bûn. Lê yekî kodeke tijî hilda û pêberjêr bû. Zaran pey wî kirine qîrînî:

-Tu kuda diçî?

Ew qe piş xweva nezivirî û qîrîya:

-Kalikê min nexweşe! Ewî wê rojê «Şîrberf» dixwest

Nava çend deqîqada ew zar gîhişte ber avayîkî derge fire. Dergeh bi pîyêن xweva vekir, hate odeke mezin. Kalikê wî nava cî-nivînada nale-nal bû. Endamê malbetê dora cî-nivînê wî rûniştibûn, hinekan ker-lal hêsir dibarandin. Zarokê anî koda «Şîrberfê»

Ahmedê Hepo -----

danî ser sîngê kalikê xwe û ser xûşka xweye biçûkda qîrîya:

-Rabe, kevçîkî bide min!

Xûşkê wê qasê kevçî anî. Zarokê bi lavayî gote kalikê xwe:

-Kaliko, kaliko! Çavêñ xwe veke, min tera «Şîrberf» anîye.

Ew qe hîva tiştekî nesekinî, kevçîyê darîn tijî «Şîrberf» kir, devê kalikê xweva kir. Kalikê du-sê kevçî xwerinê şûnda çavêñ xwe vekir. Gişk ser vê yekê ecêb man.

-Lawo,-kalikê bi dengekî şîdyayî got,-gişkî bide buxum.

Kalikê kod vala kir, rabû hate rûyê nevîyê xwe. Kincêñ xwe xwekir, derkete derva, berê xwe da çiyê, herdu jûnîyêñ xwe danî erdê, herdu destê xwe berbi xwedê bilind kir, karnîyarî çîyan bû:

-Çiyano, Xwedê me bê we, we jî bê me meke. Hingî hûn xuliqîne, em xuliqîne, em bûne piştovanê hev. Hûn bûne melhemê dilê me, em bûne mîrxasên we! Wekî yekîtîya me, biratîya me hevra tunebûya, naha dujmin zûva em xeza kiribûn, hûn jî hilweşandibûn.

Lê li çiyayê nêzîkî gund avbezeke gur hebû. Em, tevî deste zarêñ gundê cîran hatine bin avbezêda avê xwe dikin. Nişkêva kêleka mera mirovekî gapêran dertê. Ew xardibe kincêñ me yeko-yeko hildide, dide piçenga xwe û berê xwe dide hevrazê çiyê. Em dîqîrînîn, naqîrînîn qe talaşa wî nîne. Em mane rût-

Ahmedê Hepo -----  
tezî. Hindik mabû ew piş çiyêva biqulibe agir kincên me ketin.

Ewî mirovî hey dixwest kincên me ji piçenka xwe bavêje, lê te hewzanibû kînc piçenga wîva hatine zeliqandinê. Ew mîna mirovekî dîn-har, gêj-ewter dor hev diçû-dihat. Weşekî awa derbaz bû. Paşê ewî berê xwe da avbezê. Hinekî berbi me-avbezê hatinê, nava agir alavêda nedihate kivşê. Qîre-qîra wî erd û esman hilda bû. Ew mîna gilokeke agir pêketî hol dibû berbi avbezê dihat. Ewî dixwest xwe avbezêra bigihîne, agirê wî ketî bitemirîne. Hindik mabû ew bigihîje avbezê cîyê xweda sekinî, lipitandin bi wî nebû. Şewiti, helîya, don jê nuquû. Ew mîne bû. Vê gavê ewrekî reş wêda hat, cîyê ku ew şewitîbû, bibû xwelî, baraneke gur lêkir. Ew der-dor şûştî-mûştî kir û taveke neder erd û esman xêlî bi xêlî kir.

Vê weşê kalekî rûdansipî gopal dêstda hat ser zinarêñ avbezê sekinî û bi dengekî sewgirtî gote me:

-Ewledêñ van çîyan! Ci dikin-bikin, bi fesal bikin, tu dema firêqet nebin, bizanibin çavêñ dujmin timê li weye! Ya destê xwe bernedin çarçavîbin, bîrmekin, ku hûn xwedan neyarin. Dujmin timê dixweze we tezî bihêle!

Ewî awa got, dest avîte piçenga xwe, kincên me yeko-yeko jorda avîtê me!

Dibêñ, mirov tijî nava salêñ jîyanê bûnê, zû-zû zarotîya wî, kirinêñ zarotîyê, gund, war-warkozêñ dîtî dikebine xewnê. Lê ez li xerîbîyê hatime dunê, di vagonêñ barbirda zarotîya min derbaz bûye, li

Ahmedê Hepo -----

nefîkirinê mezin bûme, jîyanêda ber tendûra xelqê kar kirîye! Ê, zemano, ez ku zarotî ku, gund ku? Lê ev xewn, ci xewn bû?

Pâşê vê oda mezine paqîşda, vê dema berbunga tavzer da xwe-xwera kire piçe-piç:

«Nuqutîye dilê min, ev gundê xewna min wê bibe qismetê ewledên gelê Kurd û ewanayê esse miqatî kincêن xwe bin» Bila wekilandin nebe, siba rêuîtîgera min, ya roja sisîya, li mala Ûsivê Evas, li bajarê Krasnodarê vebû. Me, êvarda şêwir kiribû, wekî sibê, 25 meha tebaxê, tevî Velîyê êgin bona «Gostêvoyê», herine îdara milîsiyayê. (Gostêvoy-kaxazê mîvan).

Pêwîst bû mîlîsê cî ser dêklarasîya, ku li tixûb dabûn, binivîsiya ezê çend roja li Krasnodarê bimînim, çawa mîvan. Pâşê herine mala Kurdan ya Krasnodarê û çend gundêن ku kurd lê dijîn. Cîye tiştekî ferz bêjim, pey wê yekêra vegeŕime ser pîrsa «Gostêvoy»-ê.

Destpêbûna bîranînêda min çawa êpîgraf gotineke gel bîranî: «EZ qurbana wî serîme, wekî serkarîyê li sed serî dike, lê ew serîyê nikare serkarîyê li serîkî bike, bila ew qurbana minbe». EZ ji dil evê gotina bi sed salan, derbarê xort, kes, efatê mîna Keremê Ûsivê Evas, Velîyê Îsrafîl û Farizê Ûsivê Feqî Evdile da dibêjim. Nava wan çend rojêن ku, ez wur mam, min rind dît û tê derxist, wekî ev lawêن gelê kurd, ne ku tenê serkarîyê li malbeta xwe dikin, lê bi dehan kurd li wana disekekin.

Ez bûme şedê wê yekê, çawa hero ew kes, ev kes, dihatine bal Velîyê Îsrafil û hîvî dikirin. Velî, minra nasnamê bide derxistinê, Velî min bibe ser filan doxtirî, Velî, li Alma-Atê pismamê min çûye rehmetê, bilêt tune, minra bilêtê destxe, Velî, kurê min dayne ser filan karî. Velîyo, malî ava, Velîyo, emir dirêj, lê te çîma carekê ne got:-Na! Velîyo, xêrxwez-mêrxaso, şîrê dê li te helal, keda bavê li te warbe!

Xwendevanên hêja! Pêwîstê navbendekê têkime nava gotinên jorîn. Dîrok şedeye, wekî ji sedsalên hên kurd wa gotî li Ermênistanê, ser wê axê jîne. Gava pirsa Qerebaxa Çiya derkete holê, ermenîya him jî bi zorê bere bi hezeran kurdan dan, ji wir dane derxistin. Wê gavê, 10-12 salan berê, dê-bavan destêñ tifalên xweye mîna Velî, Kerem, Fariz û yêñ mayîn girtibûn û nizanibûn wana kuda birevînin, çawa ji qetilê, tîbûn-birçîbûnê bidine xilazkirinê. Tifalên do, iro bûne xort, zîlam, xwedanê malê-malbetê, bûne rênîş, piştovanê netewîyêñ xwe. ... Me taştê kiribû. Velîyê delal jî hatibû, wekî bona evraqê «Gostêvoyê» herine îdara mîlîsyayê, ew stendinê şûnda bibine rêuwyêñ rêzên gundan, kêderê kurd lê dijîn. Lê gava bi hîvîkirina me xwedanê malê bişkoka têlêvîzorê givaşt, wekî nûçeyêñ rojê bibîhîzin, li êkranê nivîsibûn:

«Mêzekarêñ hêja! Pey çend deqîqanra bibihêñ agadarîyêñ ecele». Emekî şûnda dîktorê têlêvîzorê bi dengekî lerizî got, wekî vê berbangê térorîsta li bajarê

Ahmedê Hepo -----

Krasnodarê filander teqandine, 2 kes cî bi cî mirine,  
çend mirov birîndar bûne»

Em posîde bûn. Hema vê demê Keremê Ûsiv  
têlêxist û minra axivî:

-Apê Ahmed, ez hîvî dikim ji mal derneyê.  
Mîlîsan hemû rê-dirb birîne, evreqa dinihîrin.  
Mirovên «reş» gişkan digirin dibine îdara mîlîsayê.  
(Bi gorîya Rûsa, mirovên dinê reşin. Ev gotin daha  
gelleki ser mirovên Kafkazê hatîye belakirinê). Oxira  
me teribî.

Ê, rind gotine:

-Ro derbaz dibe,

Qeda-bela derbaz nabe.

Yek jî dibên:

-Rêwî kete rîyan,

Berfê xwe da serê çîyan.

Bav-pîrên me, rehme li webe, cîyên we cinetîbe.  
Ez ci bêjim jî, ezê ji we rintir nikaribim bêjim. Wê  
rojê rê-dirb li me hate girtinê, tu derada neçûn, jî ber  
têlêvîzorê dûr neketin. Her tenê danê êvarê Ûsivê  
Evas gote min:

- Rabe, em derêne mehelêن der-dora me. Weke 40  
malêن kurdan ser du kuçanîn.

Ew mîna rêber-rênişekî cêrbandî zane kete pêşîya  
min û kolaneke fire-dirêjra birim. Him vî alî rê, him  
wî alî rê, hemû avayêن ser kolanê bi pergal, yek  
himberî yeke mayîn hatibûne avakirinê.

Ahmedê Hepo -----

-Hema vê kuçêra, - Ûsivê Evas dest bi rênîşa xwe kir got, - dibêjin «Avana Kurdan». Malên me kurdan payê pîr ser vê kuçeye.

Min ji Ûsivê bira pirsî:

-Kurdan ev avayî kirîne, yanê xwera ava kirine?

-Na, -ewî bersiva min da, -payê pir kirîne, lê paşê dest lê gerandine, serda zede kirine.

Me kolanêra usa dida gava te hewdizanibû, nav avayan dipîvînîn. Em gihiştinê ber dergah, yanê ber vî avayî, wî avayî Usivê Evas bi xwestineke mezin salix dida:

-Eva avayê mala Velîyê Xalite, eva ya Farizê Ûsivê Feqî Evdileye, eva ya Barîyê Têmire, eva ya Xalitê Mehmede û yên mayîn...

Em weke cil derê malbetê kurdanra derbaz bûn. Mal hebûn gava em diketine hewşa wana, xwedanê malê hatina me hesîyanê, derdiketine pêşîya me, bi şabûn em dewatî hundur dikirin, lê me qayîlbûna xwe dida û diçûn. Li hewşa avayîkî jineke navsere got:

-Çima nayêne hundur? Çima hûn hatine aşekî xirab?

Me jî bi şêkirdarî bersiv da û dîsa da ser rîya xwe. Gotî vira tiştekî jî serda zêdekim. Gava em digihîştine kîjan avayî disekinîn, Ûsivê Evas deynê xweyî rênîşê awa diqedand:

-Eva mala filankesêye...

Paşê qal dikir, çend ewledê vê malbetê hene, kî karê dike, kî nake, çawa debara xwe dikan û nasîyên

Ahmedê Hepo -

mayîn şirovedikir. Van gişkara esse tiştek dihanî ser zara.

-Ev mal, malda hevra kurdî diaxivin, yanê jî digot, ev mal hinekî şaşîyan dike, cîwanê wan hevra rûsî diaxivin.

Gernasîya me wedekî dirêj kişand. Me bi rêbarî serîk hemû avayên «Avana Kurdan» xist. Paşa vegerîn. Serê me ber meda kolanêra hêdî-hêdî, mîna mirovê piştî giran gav-gav ber bi mala Ûsivê Evas dihatin. Hewa ne germ, ne sar bû. Hênik bû. Nizam çîma min tirê ez dixeriqim. Çend mîtra şûnda Ûsivê Evas karnîyarî min bû:

-Bira, çi bûye, tu xwe-xwera xeberdidî?

Min tirê bîna min diçike. Lê ji van gîsîyan zimanê min vebû:

-Kek Ûsiv, min xwe-xwera digot, ku em gişk kirêda dimînin. Him jî, bê xweşîya me, zimanê me ji me tê stendinê.

-Na, - ewî bi ecêb bersiva min da,-ev avayên te dîtî gişk yên xwe xwetîyêne. Alîyê zimînda jî ewê dikarim bêjim ku, zimanê kurdî Xwedê daye me, her tenê ew dikare ji me bistîne.

-Belê, avayî yên taybetîne, lê ne yên li welatin. Tu zanî qewlê heytîya welat, dewletê, yên here sereke çi bi çîne?

Dihate kivşê naha jî ew ketîye xema. Weşekî xurt derbaz bû, hê ew kîlimî:

- Kek Ahmed, min hê nêta te derz kir. Hema tenê nava van 60-65 salê emirê minda me çendî-çend cara

Ahmedê Hepo -----  
avayên ji van jî rintir ava kirine. Ew xelqêra man. Ev  
avayên naha wê kêra bimînin Xwedê zane?!

Vira ewî navbirîn da axavtina xwe. Pey çend  
gavara hêdîka milê min girt, hejand û got:

-Bersiva pirsa xwe tu bi xwe bide.

-Ser çavêr min. Üçivê bira, rind bizanibe her  
avayîk kevirê bingeha welate, her malbetek sûra  
wêye, ziman jî heytiya gele. Wekî usane qewlê  
heytiya gel û welat ji avayî, ji malbetê, ji zimîn dest  
pê dibe.

Rêvebirê min zûr bû, pirikekê ji sêrî hetanî pîya  
ez mêze kirim. Ew xweda pirpijî bû, reşqemilî bû.

-Bi gorîya te, - ewî bi dengekî ricaf gote min, -ew  
kurdêñ ku ne ser axa welatin, ne kevirê bingeha  
welatin, ne sûra wênin, ne jî zimanê wan hene?

-Tu çawa derz dikî derzke, min ya dilê xwe got.

-Lema kal-bavêñ me gotine: «Kevirê te qulibe». Kevirêñ me kurdêñ Yekîtiya Sovêta berê qulibîye, em  
kêrî tiştekî nayêñ.

-Na, Ûsivo, pismamo, ez wê yekêra neqayîlim. Lê kevirê me bi destî me ne ku ji cî qulibandine,  
hildane mîna zinarekî ji çiyakî bilind hêlkirine. Em  
jorda hatine, hevketine, girik-girik bûne, paşê hûrik-  
hûrik hincirandine. Zimanê şirîn, fen-fêlê dujmin em  
kerî-kerî, beş-beş, pirtî-pirtî, zîtol-zîtol kirine.

Pey van giliyêñ minra Ûsivê Evas mîna mirovekî  
birîndar kire axinî. Min dîsa dûmayîn da axavtina  
xwe:

-Îdî kevirên me hev digirin, yek ser yekê disekine. Gotî her kurdek kê derê dibe, bila bibe, pêwîste biçerçire, xwîdanê bide rêtinê, kevirê xweyî qilibî bona welat rastke. Nehêle dîsa neyar destê sar têke nava wan.

Ew mîna mirovekî sancî kişandî serhevda qincilî. Çend çirikan şûnda ewî bi awakî dijwar newqa xwe rast kir.

-Of-ax,-ewî berê xwe da min,-te him kînora mine salan givaşt, daxa min derxist, him ew der kir.

Bona wî ji vê rewşê dûrxim, ez derbazî pirseke mayîn bûm:

-Ûsivê bira, wekî sibê ermenî rabin bêjin, gelî kurdan, warêن vegerine cî-warêن xwe? Hûn Kurdêن Krasnodarê herine Ermenîstanê?

Ewî bi dengekî rik got:

-Na! Tu çi dibêjî? Çima me çi kiribû, wana rabû, mal-halêن me, avayêن me ji me stendin, bere me dan.

Me ermenîyara xulamî dikir. Wanara heywan xayî dikir, wana nizanibû goşt ji ku tê. Azerîya ji wanara zerzewat didebirandin.

Salê 12 meha ji Nexçivanê, ji Gencê wêdatir Azerîya her tişt dihanîne bazarêن Ermenîstanê kirîn-fîrotan dikirin. Gel bi hev disekinî. Rabûn mîna mirovêن telk pêketî em dero-dero kirin, rind bizanibe, wekî nava Kurdanda yekî serevde jî hebe, ew jî careke mayîn berê xwe nadî Ermenîstanê.

Ez ketime milê wî, me çend gav hevra avît û bi dengekî bawerî berê xwe da wî:

Ahmedê Hepo -----

-Îcar emê heta-hetayê berê xwe bidine welatê xwe-Kurdistanê.

-Kîjan Kurdistanê?

-Kurdistan yeke.

Em îdî gihiştine ber dergê malê, dîsa çend camêr hatibûn hîvîya me bûn. Min ji wan camêran êpêce wekokên zargotina me nivîsîn û hilda ser qeytana dîktafonê. Roj-êvara me hetanî gaveke şevê xwes derbaz bû.

X            X            X

Ez ji xewê hişîyar bibûm, lê hê nava cî-nivînada bûm. Şev ji şevê hatibû qetandinê. Tîrêjên tavê ji şûşen sibakêra xwe davítine hundur. Min kincên xwe ker-lal xwekir, hêdîka derketime derva, wekî neferên malê hişîyar nebin.

Rind dihate têderxistinê, ku şev hewayê xunava barê giran girtîye. Naha, gava royê dizeriqand, hewayê ew barê xweyî giran diweşande erdê. Ji erdê bîna fisegurê dihat. Ji wê mirov sisto-misto dibû.

Dîsa, êvarda em Velîyê delal pev ketibûn, ku iro, danê rojeyî yekem herine îdara mîlisayê bona kaxez-evraqê «Gostêvoyê». Bê sebir hîvîya wî bûm.

Nava van ramanada bûm, dengê maşîna wî li me tesele bû. Sopek, dudu derbaz bûn, em rêketin, soqaq, rê, durîyan, meydanê Krasnodarêra derbaz dibûn.

Ahmedê Hepo -----

-Apo, - Velî berbirî min bû, -îro li rê-dirban mîlîs hindikin. Dibêñ seba teqandina do na, pêr êpêce mirov girtine.

-Digirin, çi dikin?

-Qet, diravê wan distînin, berdidin. Gune giranbe, dibêñ mîlîsan bi xwe teqandin mîyaser kirine?

-Çawa? Qe tiştê usa dibe?

-Naha çi bêjî dibe... Mîlîs usa dikin dirav qezençkin.

Vira gotineke nivîskarê rûs Maksîm Gorkî kete bîra min: « Dunya bona mirovan şeveke tarîye. Gotî li vira her kes ronahîya xwe bi xwe bibîne». Em ji diçûne ïdara mîlîsîyayê ronahîya xwe dest bînin.

Gava em gihîştine ïdara mîlîsîyayê, êpêce mirov li wir bûn.

Velîyê bira maşînê da alîkî, dûrî devîya rê. Em ji maşînê peya bûn û ber bi girseya mirovan çûn.

Ji qelsa mirovan çend mêttran virdatir jinekê kîncêñ kurdan lê, destê xwe dabû piş xwe, te tirê barekî giran li piştêye, bi gavêñ hûrik-hûrik wêda, vîrda, diçû-dihat. Em gihîştine raberîya wê, Velî sekînî û karnîyarî wê bû:

-Meta Zeyneb, qe tu çawanî? Te xêre van-deran?

Jinikê hinekî hêz da xwe, pişt xwe rast kir û weşekî Velî mêze kir û hê got:

-Velî, qurban, hela were meta te, bê rûyê te.

Velî herdu destê wê kirine nava destêñ xwe, ser wêda mîl bû, ewa hate rûyê wî.

Ahmedê Hepo -----

Ewa kewgirî bû. Dixwest biaxive, lê gewrî lê ziha bû, te hewzanibû gilî li hev alîyane, dêvda bûne serteşî, wêya dixeniqînin û nahêlin ewa derdê xwe dereveke.

Velî ber dilê wêda hat. Bona wêya ji wê rewşê derxê Velîyê bira ez wêra kirime nas.

Jinikê bi çavêن hêşir, bi belengazî rûyê min nihêrî, zû jî serê xwe kire ber xwe. Bi kujê mêzerêva hêşirê ber çavêن xwe paqîş kir, dil da ber dilê xwe û bi dengekî lerizî got:

-Velî lawo, bila mîvan ji efûke, yeke newî hatîye serê min porkura ber dîwaran.

Me hevra ji wê pirsî:

-Çima, çi qewimîye?

Min têderxist vê germa havînê ewa mîna mirovê ta ketî diricife. Kî zane diqewime jinika belengaz wê nexweşiyê ketîye. Lîv li wê hejîyan, dirana kire çeq-çeq bi awakî ne mir, ne jîyînê got:

-Lawo, eva çend rojin Memoyê min girtine.

-Çima?

-Ewî wê rojê hemû kaxazê xwe anîye daye vê idara mîlisayê. Bona...

Kela wê dîsa tijî bû, hêşiran rê nedanc hev. Min jî sêrî hetanî pîya ewa mîze kir. Çavên min reşevehatin û min ew yek tê derxist, wekî dayîka navsere mîna çiyakî ser minda war bûye, hêl bûye, min bi hezar dijwarîyava bîna xwe dikişand. Ji me hinekî wêda peykelek hebû, min ew yek derz kir, ku ez jî cîyê xweda bibûme peykelekî. Cudatîya min û wî peykelî

her tenê ew bû, di tamar-deremên minra xwîn xilte-xilte dikişîya. Min dîsa dayîk ber çavêن xwera derbaz kir. Qerçimekê rûyêن wê ez birim derxistîme salêن zarotîya bi posîde. Em hatibûne nefkirinê. Li Qirqistanê, cîyê em li hêwirandibûn zivistanê sarşexte bû, havînê germ-germistan bû. Bavê min derê malê bostan reşandibû.

Ewî ew bostan dep-dep (kerdî-kerdî) kiribû, wekî av bê, wana avde. Bavê min hero mer dida destê xwe û diçû ser depanra diseokinî, wekî av bê, wana avde. Wê havînê av nehat, bostan jî, jî tîbûna şewitî. Qerçimekêن dêm-rûyêن vê dayîkê dep-dep bibûn û depêن bostanê bavê min kire bîra min.

Wanra av nedikişîya ew şewitîn. Lê çîma rewşa vê dayîkê mîna dara zîpik lêdaye, çîma şewitîye? Kê ewa usa qelandîye, kelandîye, şewitandîye? Kê hey barê giran daye pişta wê, wekî ewa hey têke inte-int, nale-nal, zare-zar?!

Rû-dêmên vê dayîka kurd bi destî zordestan, beqî neheqîyên zemîn, dewrê hatine dep-dep kirinê, qestbende tûrê bostanê dilê wê qusandine, wekî pişta wê kuzbe, çav torreşbe. Zef zelal dihate kivşê, wekî nava wan depêن rûyê dayîkêra zare-zar, qîre-qîr, qûje-qûja zarên tî-birçî, pêxas-tezî, nale-nal, oxe-ox, ofe-ofa kal-pîran hatîye dor bi dor kirinê. Xofa neyaran, hovîtî-hurutîya wana, rev-beza wê dîtî pişt lê kûz kiribû. Serî lê dihejîya, lêv lê daliqîbûn, her tenê diranekî-duda dêvda parêzgehî dikir.

Derd-kul, êş - ax, daxa salan wêra bibûne barekî giran. Wana ewa serhevda qunculandibû, dûrva, ewa mîna gulokekê dihate kivşê. Ew jî rind dihate mîze kirine, ku ewa ber tavê qemilîye, ber sur-sermê ricifîye, bona parî nan destê xwe dirêjî kesî neke, kefîn destên wê qalik-qalik bibûn, tilî-pêçîyan pifik dabûn. Ewana şedetîya wê yekê didan, wekî dayîkê hey bi keda xweye helalva giranîya jîyanê kişandîye. Lê naha hatîye ber dergekî girtî, tarî, ber kelkê-zindanekê sekinîye.

Vira nîteke lêkolîvanê alman A.F.Şvîygêr Lêrxenfeld (Pirtûka wîye bi navê «Jin», S. Pêtêrbûrg, sala 1885)- kete bîra min. Ew dinivîse: «Jina kurd ji berbangê hetanî êvarê kon da, derva karê dike, zaran xweyî dike, xurek dipêje, çekan paqîş dike, hespa mîrê xweyî hizkirî qeşav dike, gava ew ji nêçîrê bi qismet hatinê, yanê ji şêr bi serfinîyazî vegerînê, torbenda kulîlkan yê ku berêda hûnaye, dike ustuyê kihêlê wî. Jina kurd ser kar dike şinge-şing, ewa bi ruhê xweva şaye. Gava ewa teşîyê dirêse, yanê jî nexş tewnê dixe, kilamên wêye strayî nava hewa paqîşda bela dibin.» Lê naha jina kurd ji van hemûya dûre ji ber ku, welatê wê destê neyaranda dike hewar-gazî. Dujmîn destê wê daye ber rûyê wêya lema jî, ji hêza wê der, kûr û dûre, wekî vî dergê girtî ser xwe û kur da veke. Nişkêva ewa bû çemekî kişîya:

-Lawo, wekî eva welatê mebûya qe ev yek nedihate serê min. Serbarê serda ez zimîn nizanim, têkevime hundur ya dilê xwe rehet kim!

Ahmedê Hepo

Velî dîsa ji wê pirsî:

-Meta Zeyneb, ne te ne got çi qewimîye?

-Lo metê qurbana tebe, wê rojê Memo anîye hemû kaxazê xwe daye vê kambaxê.

Ewê bi destê xweva îdara mîlîsîyayê da kivşê û paşê dûmayîn da axavtina xwe:

-Ew ji vir derketinê, rêva wî digirin, senetê wî dixwezin. Ew jî dibê, bona qeyd kirinê, min senetên xwe daye filanderê. Naha kesek ji wî bawer nake, ewî girtîye!

Dilê minra hezar nêt hatin derbaz bûn. Ya rebbî, ez çawa destê alîkarîyê dirêjî vê dayîkêkim. Min xwest derxim hinek dirav bidime wê, lê te qey digot ewê nîta min derzkir û got:

-Velî, lawo, ez ber malê dunê nakebim, çi bixwezin ezê bidim. Bi van destava eva 50-60 salin karkirîyê, qezenc kirîye!

Velî bi lewzekî xemxurî got:

-Meta Zeyneb, naha emê herine hundur, cem mîlîs, ka binê çi dikin!

Min xwe-xwera got:

«Ê, dîroka kal, dilê min kerî-kerî, pirtî-pirtî bû. Ez li welatekî xerîb pêşberî neheqîkê rû bi rû sekinibûm. Ez çawa bibûma alîkarê vê dayîkê?»

Nışkêva mîna ronahîkê meselek dilê minra derbaz bû:

«Xwedê yeke, derge hezar».

Em çend gava ji wê dûrketibûn, nizam çawa bû, bawerîkê hundurê minda serê xwe hilbirî, ez careke

Ahmedê Hepo -----

mayîn paşa vegeŕim, hatime pêşberî xûşka Zeyneb û  
gote wê:

-Xûşka Zeyneb, kerema xwe, hetanî em çawa te  
got, ji wê kambaxê derneyên, meçe!

-Lo, xûşk qurbana tebe, ez ber pîyê te bimirim, ezê  
kuda herim. Herin bila Xwedê bê hewarîya we.

Em bi awakî dijwar derbazî hundur bûn. Velîyê  
bira derê odekê vekir kete hundur, ez jî pey wî...

Odêda mîlîsekî hurpizî û keçikeke cîwan  
rûniştibûn. Wî û Velî dest dane hev, kêf-halê hev  
pirsîn. Dihate kivşê mîlîs êvarda ya gewir-araq, şerab  
vexwerîye, te digot, qe şev xew nekirîye. Xîtîka poz,  
gilêza dêv tev-hev bibûn, çav bi şilaq bû, mîna  
mirovekî arsimê ketî zû-zû dibênijjî.

Velî ez wîra kirime nas, menîya hatina me wîra qal  
kir.

Mîlîs destpê kir pirs ser pirsa da min:

-Hûn ji ku hatine? Bona ci hatine? Kingê hatine?  
Hûnê çend roja li bajarê me bimînin?

Min bi sebir bersiva hemû pirsên wî da. Paşê dîsa  
karnîyarî min bû:

-Kerema xwe pasport, karşandinok-  
komandîrovkayê, palpişta xwe bidin.

Min dest avîte çeltê destê xwe û nasname-pasporta  
xizmetkarîyê ya ji alîyê Wezîrîya karê der, ya  
rêspûblîka Azerbaycanêda dayî, palpişta Niştewarê  
rêspûblîka Azerbaycanê, evraqê karşandinokê, palpiş-  
ta têlêradîyoya dewletê, ya Rêspûblîka Azerbaycanê,  
wekî ez rêdaktorê sereke, yê bernama zimanê Kurdi-

Ahmedê Hepo -

---

me, palpiştên wekî ez-Endamê Yekîtiya Nivîskarê Azerbaycanême, Endamê Yekîtiya Jurnalistên Rêspûblîka Azerbaycanême, derxist danî ser pêşxwîna wî.

Ewî yeko-yeko li van evraqa nihêrî û ber xweda vebîşirî. Paşê ewî dexilê pêşxwîna xwe kişand, mor hilda û berbirî keçika berdesta xwe bû:

-Dirav bistîne, çêkê binivîse, ez jî kaxazê «Gostêvoya» mor kim.

Velîyê bira nizam çend rûbil (manat) dirêjî keçikê kir.

Mîlîs «Gostêvoy» dirêjî min kir û bi vebîşirî got:

-Uvajayêmoy pîsatêl (nivîskarê birêz), ji me nexeyîde qanûn awaye.

Êmekî ker bû, cake dûmayîn da axavtina xwe:

-Dibe we bihîstîye têrorîsta bajarê meda ci kirine?

-Belê, -min bersiva wî da, -lê ez ser tiştekî, ser pirsekê ecêb mame.

-Keremkin, bêjin, ew çîye?

-Ji Azerbaycanê hetanî bajarê we-Krasnodarê rêda 25-30 cara avtobûsa me dane xayîkirinê, em jî mîzekarîyê, kontroliyê didane derbaz kirinê. Ger tixûb awa tê parastinê, lê ev têrorîstanâ çawa tênen û ber pozê we cî-wara didine teqandinê? Lê ew kesê ku bi xwe tê ber derê we, hûn di nava wanda têrorîsta digerin.

Ji vê pirsa min ew hinekî soro-moro bû, çirikekê zûr ma rûyê min nihêrî. Mîna xwendevanê nezan ziman hev alîya û giran-giran kîlimî:

Ahmedê Hepo -----

- Welatê me-Rûsiya welitekî mezine, hezar-hezar rê-dirbêñ wê hene. Ya dinê em nava hatîyada têrörîsta nagerin. Lê qanûn dimîne qanûn.

- Biborîne, maqûl mîlis, ez wê nêta wera ne qayîlim. Ji ber ku, hezar-hezar jî parêzgeh hene. Pirs ne di wêdaye! Mêzîna dunyayê rast nayê kişandin. Vî zemanê meda heqî ji deste neheqiyê direve. Lema jî dunya bûye gola xwînê, lê mirovayê hê xwe ker kirîye.

Mîlis bi hewaskarî guh dida min. Lê mîn dest avîte evraqên xwe, hildim herim, ewî nchişt û got:

- Tê kivşê hûn mirovekî hewaskarin, rûnên em hinekî jî guh bidine we.

- Maqûl mîlis, derva êpêce mirovîn bêgav dor bi dor sekinîne, wekî bêne bal we, bona serê wanî neêşîyayî, neyê êşandinê. Ez naxwezim zêde rûnêm, naxwezim gunê wan têkme ustûyê xwe.

Ew jî ciyê xwe rabû, destêñ xwe hevxist, kire pîrqe-pîrq kenîya û berê xwe da Velîyê bira:

- Dorogoy Valî(Velîyê ezîz), ew rast dibêje. Ezê ji kar seheta 19<sup>00</sup> derêm. Tu mîvanê xwe hilde were ber filan kafeyê. Metirse îcar mîvandarîyê ezê bidim. Emê li wir nêtêñ xwe bidomînin.

- Sêrgêy Pavloviç,-hinekî bi kin min berê xwe da wî,- hema vî serîda wera bêjim, ezê tev we nîn buxum, lê stekanê li îstekana we herda jî naxim.

Min destê xwe dirêjî wî kir û xwest ji bal wî derêm, herim ewî pêşbirî da min.

Ahmedê Hepo -----

-Dorogoy gost (mêvanê birêz)-got, -çima usa bi xeyîdî dibêjî? Me çi kir, çi got, wekî dilê we ket?

-We qet tiştekî usa nekir, ku ez ji we bixeyîdim. Ez ji derva bi xeyîd, bi posîde hatime bal we!

-Çima, çi bûye!

Min rewşa Zeynebê wîra qal kir. Ew hinekî kete mitala û berbirî min bû:

-Navê kurê pîrê Memoye.

-Belê!

Ewî berê xwe da Velî:

-Velî, tuyê bibî kefîlê Memo?

-Erê, bi serê xweva.

Sêrgêy Pavloviç dest avîte nava kaxazên dexilê, dirûvek (form), du rîfekê bi ser nivîsî: «Porûçîtel» (kefîl) derxist û bi Velî da navandinê û got:

-Ezê vîrda nav, paşnavê te, yê Memo binivîsim, wekî te Memo hildaye kefîl. Dema pêwîstbe tuyê wî bînî mîlîsîyayê.

-Ser sera, ser çava,-Velî bi şabûn bersîva wî da, - emê bê sebir hîvîya webin.

Sêrgêy Pavloviç ji cîyê xwe rabû destê min girt, kire kefa destê xwe:

-Dorogoy gost, -bi dengekî hukum got, -ez hîvî dikim ji vir bi beşer xwes here, eva yek. Ya duda, ez gîlî dîdîm, hûn êvarê warêne cîyê dibêjîm û hêjaya çi dibe bila bibe,ezê Memo jî xwera bînîme kafê. Derbarê wîda emê wira fire biaxivin.

Me herduya jî wîra bi dil got:

-Spas!

Ahmedê Hepo -----

Me evraqên min hildan û ji wir derketin.

Min derva ji Veli pirsî:

-Te çima gilî da? Te bona xatirê Memo gilî da?

-Mamoste, min bona du sedema gilî da. Ya ye-kê, bila ew bizanibe nava me kurdanda yên mîna we hene. Ya duda, belê, bona Memo, ya sisîya emê rûnên çawa hûn dibêن yeke gewir (araq) bidinê, bila vexwe. Beqî wê araqê ezê şuxulê çend kurdan çareserkim.

Eva ne cara yekeme , wekî usa nebûya, iro ji dorê der em bermedidane bal wî, him jî pirsa Memo ne dihate safikirinê.

Min qe dengê xwe nekir, ketime mitala: «Eva jî awekî rewşa zemîne, gotî bikaribî nava wêra derbazbî. Ê, jîyan ne ava zelale, hildî vexweyî».

Em çend gava ji îdara mîlîsîyayê dûrketibûn, me dûrva didît xûşka Zeynebê destêن xwe daye piş xwe û çawa bin barekî giranda virda, wêda diçe, tê. Tê hew dizanibû ewê tiştekî pirr hêja unda kirîye lê digere, yanê jî dixweze cîkî bibîne rûnê û barê ku, neyarêñ gelê wê bi salan dane pişta wê dayne erdê.

Lê kesek tune bû ewa bida serwext kirinê:

-Hey-hey, hey-way, dayîkê, çiqasî bigerî tu li vira tiştekî nabînî, ne jî tuyê cîkî usa bibînî hêmîn rûnêyî û ji barê ku bi salanva neyarê gelê te daye pişta te, jê azabî! Ew cî-war tenê Kurdistanê...

Hindik mabû em nêzîkî wê bin, berê wê kete me. Te tirê wê deqîqê ewa bû bûkekê û bû şinge-şinga wê, bi gavêñ şidîyayîva ber bi me hat.

Ahmedê Hepo

Velî dîsa ewa hemêz kir û bi şabûnekê mezin gote wê:

-Meta Zeyneb, çavêن te ronbe. Ahmedê Hepo kurê te daye aza kîrinê.

Ewa ji nava milê Velî derket, dest ustuyê minra bir û girîya, bi hêşirên çava berbirî me bû:

-Ez heyrana we bibim, de bêjin, ezê kîngê Memoyê xwe bibînim?

Ez ber dilê wêda hatim:

-Qe metirse, tiştekî bi tirs tune. Were maşînê sîyarbe, em te bibine mala we. Xêr-xweşî emê êvarê Memo bîne mal.

Mîlîs gilî da. Yek jî rind bizanbe, ez vira kesî nas nakim, mîvanim beqî vî xorêtê êgin, xêrxaz, kurdhiz, zimanê min vebû min mîlîsra çend gilî gotin. Ewî jî Velî nasnekira gilî nedida.

Belengaza Zeynebê wê weşê qe nizanibû ci bike, ci bêje.

Me ewa maşînê kir, rêke dirêj çûn, gîhiştine mala wê. Derê malê peya kir û gilî da, wekî emê bi Memora vegerin...

Ewa û çend malên kurdan li perê bajêr, xanîyên bê pergâlda diman.

Paşa vegerinê, rêva Velîyê bira ji min pîrsî:

-Çima ketîyî mitala? Ci bûye?

-Velî can, ez jîyana xwe da ji tiştekî hey tîrsiyame. Ew jî ew bûye, ez bawarîya xwe unda nekim. Ez ditîrsim ew mîlîs me bixapîne, êvarê Memo xwera

Ahmedê Hepo -----  
neyne. Xûşka Zeynebê ji her tiştî bawarîya xwe  
undake. Ew jî derdekî girane.

-Na, apê Ahmed, xêr -xweşî emê êvarê zêde şabin.  
Diqewime te tê dernexist, min bi dest-çavan Sêrgêy  
da serwextkirinê, Memo bîne, ezê navtilîya bidime te.

Ez him şabûm, him bi pirçûk bûm. Paşê jî  
meseleke gel kete bîra min:

-«Tu ku çûyi derekê, te nihêrî gişkan çavekî xwe  
girtîye, tu jî bigire».

Êvara bajarê Krasnodarê, bi gorîya min, daha  
bedewe. Li hemû kuçe, kolan, rê-dirban ronahîyê birq  
vedida. Wêra tevayî paqîşî jî dihate ber çavan.

Rast sehatâ 19<sup>00</sup> Velîyê bira ber kafêkê maşîne da  
sekinandinê.

-Apê Ahmed, -ewî berê xwe da min, -kerema xwe  
peyabin. Ev kafêya Sêrgêy Pavlovîç hizkirîye.

Ew kafê ji çend xanabûn. Em çavekî wêda, cuda  
rûniştin. Her deqîqe bona min dibûne mîkut serê min  
diket. Ez hey heyra wê yekêda bûm, gelo mayorê tenê  
bê, yanê...

Ez ditirsîyam zêde navê Memo bikişînim. Çend  
deqîqe derbazbûn Sêrgêy Pavlovîç qure-qure derî  
vekir hat, pêşiyê ez hemêz kirim, paşê Velîyê bira.  
Hema pey wîra keçika xizmetkar sînîyêda şûşe araq,  
du zirîyê tirşînê cêh-cêhê, hinek nan, sê rûmke-badîn  
anî danî ser destexanê -pêşxwînê, ewê xast paşa  
vegere Velîyê bira nehîst û bi wê navê hinek xurek-  
xwerina da nivîsarê. Mayor jî serda zêde kir:

-Delalê, badînekê jî bîne.

Deh-panzdeh deqîqa şûnda destexana me bi xwerin û vexwerinanva rewş bû.

Ez, hema mayor derî vekir tenê ketinê hundur, tehev bûm. Min ew dunya anî ber çavan. Lê gava evî hurpuzê kurê hurpuza xizmetkarêra got, wekî badînekê jî bîne, min dilê xwera derbaz kir, zûtirekê Memoyê jî bê.

Zêna min ez nexapandim. Ez hê nava wê armancêda bûm derî vebû, xortekî bejin bilindî, sîmîl reş, dêmî qemer kete hundur. Derbêra tê derxist ew Memoye. Min Velî wêda devda û Memo hemêz kir.

-Memo, lawo, -qe tu çawanî, -min jî wî pirsî.

-Pakim, apo.

Wî Velî jî kîf-hewalê hev pirsîn û ez wîra kirime nas.

Em rûniştin. Velî wê deqîqê her çar badîn tijî araqlî kir.

Sêrgêy Pavlovîç badîna araqlî, ya ber xwe hilda, li badînê destê me xist û kîlimî:

-Biborînin ezê saxîkê bêjîm.

-Keremkin, -me herduya hevra anî ser zara.

Ewî badîna xwe nêzîkî pozê xwe kir, bîn kir û dûmayîn da axavtina xwe:

-Warêñ em vê badînê eşqa mîvanê delal, Axmêd Gapoyêvîç vexwin! Vê sibê gava ewî çend evraqên xwe dane min, min nihêrî û çawa dibêñ, şabûm. Ez eva sê salan zêdetire vî karîda dixebeitim, eva kurdê yekemîne ewqas evraqê wî hene, him jî gişk bi qanûn, cî bi cî. Ya duda nêtîn wî xweşa min hat.

Ahmedê Hepo -----

Ewî awa got û rabû araqa badînêda kişand serê xwe. Velîyê bira jî badîna xwe hilbirî û kîlimî:

-Sêrgêyê delal, bila ser gilî-gotinê tebe.

Ewî jî vexwar.

Îcar çawa dibêñ dor ya min bû. Min badîna xwe, badîna destê Memo xist û got :

-Ez dora xwe didime Memo.

Memo rabû ser pîya û bi dengekî şermoke karnîyarî me bû:

-Biborînin min tu car ne araq, ne şerab venexwerîye. Ez gellekî hîvî dikim bona vexwarinê zorê nedine min.

Çavêñ mayor girbûn, çawa dibêñ, dudu bûne çar. Dest avîte şûşa araqê badîna xwe tijî kir, bi destê dinêva ustîyê Memo girt, ber bi xwe kişand, hate rûyê wî.

-Heyrana kurêñ xîret bim, naha zarêñ 14 salî serxweşîyê dikin.

-Maqûl mayor,-min berê xwe da wî, -lê mirov çawa qêmîşî lawê awa dike, digire dike kelê.

Mayor ser minda vegerî û got:

-Cara ewlin ew negirtine, ew dane xayîkirinê, cara duda gune ne wîdaye, ne mîlîsandaye. Bihêlin em buxun, vexwin paşê emê wê pirsê safikin.

Dilgir bibûm,, dixwest derbarê xweyîkirina Memoda her tiştî bizanibim, min dît mayor him birçîye, him dixweze vexwe. Min badîn da destê xwe, rabûme ser pîya û raste, rast berê xwe da mayor:

Ahmedê Hepo -----

-Îcar dor, dora mine. Hîvî dikim rind guh bidine min.

Hevalê mîlîs, hûn zanin pirs di çidaye? Ez sedî sed bawerim ew kurdên hatine bal we û çûne, û yên ku, wê ji vir hada bêne îdara we, nava wanda ji min hiştir, ji min bi jîr û zane pirr bûne.

Eva sî salî zêdetire ez bajarê Bakûyêda dijîm, îdarênav bilindda kar kirîye û îro jî dişuxulim.

Biborînin ezê minakekê bikişînim û nêta xwe ser hevda bînim.

Êmekê derbazbe hûnê rabin herine mala xwe. Xwedê neke, tu gîhîştinê ber derê xwe, binihêrî jin-zarê te dervanîn, derê te jî morkirîye. Çend sawkar-boyavîk, yanê têrorîst, çawa navdikin, navkin destê wanada çek û wera bêjin:

-Destêñ jin-zarêñ xwe bigire îşev ji Krasnodarê derkebe! Yanê na, emê ber çavêñ te sosreteke mezin bînine serê te û malbeta te!

Paşê bigihîjine te, te bişêlînin, qe tu bi xwe, xwe nas nekî?

Ewê jî bêjim kuda herî, kesek gazinê te nenihêre! Naha bêjin binihêrim, hûnê çi bikin? Dîsa eferîm wan kurdanra, wekî ji wê zulm, zordestîya boyavîkêñ ermenîya xilas bûn. Çend hezar kurd hatine parwelatê Krasnodarê, hinek çûne Azerbay-canê, Qazaxistanê û cîyêñ mayîn.

Sêrgêy Pavlovîç ji van gotinêñ min xwe şaş kir, te hew dizanibû rastî jî boyavîka ser wî birîye.

Bîstekê şûnda kêlimî:

Ahmedê Hepo -----

-Welleh, heta naha min awa nizanibû. Ji vir hada ezê Kurdanra rûmetê bikim.

-Sérgey Pavlovîç, zef spas. Lê pirs ne tenê ser Kurdane. Naha li dunyayê şere-dewe-doze, reve-beze, têrorîstîye, koçberîye. Alîyê dinêda jî dibêñ-dêmokratîyaye.

Çekêن mirovkuştinê, gelqirîyê, komkujîyê ki-lûr-kilûrin. Wekî awa bidome ditirsim vê sedsalîyêra bêjin : «Sedsalîya hovîtîyê». Lê ez wê jî bawerim hişê mirovan ser her tiştîraye. Ewê rojekê tilîya xwe ser dêmokratîya iro da bihejîne, serê xwe hilbirîne, dêmokratîya heyîra şerkarîyê bike, dunê nûhke û dêmokratîke usaye nûh bîne gerdûnê, wekî nava wêda durûtî, derewî, mixeneti, xapandin, siyaseta qilêr tunebe. Destekîva du zebeşa negirin.

-EZ seranser tera qayîlim.

Pey wêra destê xwe da ser girika milê min û pirsî:

-Minra bêje binêm çima qe cî-warê Kurdan, welatên wan tunebûyê?

-Çima tunebûye. Ew axa ku, iro Kurd ser dijîn hema dewra hêne-hêñ da ya Kurdan bûye. Lê yên iro hukumdarîyê li ser kurdan dikin, ew koçber bûne, ji cîyêñ mayîn hatine. Eva 500 salî zêdetire, wekî axa Kurdan-Kurdistan nava dewletada-nava Tirkîyayê, Îranê, Îraqê û Sûriyêda beş-beş, kerî-kerî, par-par bûye.

-Erê min kêm-zêde derbarê Kurdanda xwendîye, mixabil carna em nakebine xemxurîya tu kesî.

-Naha dewran bi carekêva hatîye guhastinê. Mirov bi xwe bûye neyarê mirovan. Hêjaya mirovan ya heywana erzantir bûye.

-Na usa jî nîne, lê gotina teda heqî heye.

-Sêrgêy Pavlovîç, eva çend salin ez bernama «Mîr jîvotnî» («Dunya heywana») mîze dikim. Bona heywana biparêzin dewlatan qanûn derxistine, înstîtût hene, bi ulmî pirsa wanava mijûlin. Pey heywana, teyr-tûya dikebin digerin, bê dirav, bê hêja dû-derman dikin, nîşana dikine pîyê wan, ustûyê wan, guhê wan.

Çawa dibên, wana hildidine ber jimarê. Mirov tê ber îdarêن we, ber yên hukumetê, wekî hîvî dikim min jî hilde ber berisandinê, herim xwera karekî bikim, serê zarêن xwe xweyîkim, hûn hezar menîya bi wan digirin: Çima hatine? Ji ku hatî? Here ji cîyê jîyanêyî berê kaxazekî-evraqekî bîne, wekî tu rastî li filanderê jîyî? Her tişt hebe, rastbe dîsa wekilê hukumetê, mirovên organêda kar kirî, hêdîka wî kaşî odeke tarî dike bertilîyan distîne, paşê evraqê pêwîst têne morkirinê.

Bertilî stendin jî di vê dewra meda bûye qezî-yake pirr mezin. Naha hûn bi xwe bêjin kurd dikare vegere cîyê berê wera evraqekê bîne? Yek jî kurd çiva here?

-Ê, ez jî kurdan rind nas dikim-Sêrgêy Pavlovîç got,-meseleke gelê rûs bîr anî: «Kûrdi nê mokraya kûrîtsa» (wetaya vê meselê awaye: Kurd ne mirîşka şile, ne mirîşka melisiye, ne bêgavê, ne mirovên tişt pênebûyîne, ne bûma korin).

Ahmedê Hepo -----

-Belê, kurd şere, pilinge. Şêr, piling xwînê digerin, kurd heqîyê, rastîyê, azayê.

Hinekî seqirtîyê domand. Min ew teriband:

-Sêrgêy Pavlovîç, helbestvanekî meyî navdar Cîgerxwîn helbesta xweye bi navê «Em û gur»-da gotîye:

Ey destebirakê gur, hûn jî weke me mîrin,  
Lê hûn gamboxene, hevalê piling û şêrin.

Min vegevê ew herdu rêzana bi rûsî wîra wergerand, daxweza helbestvan wîra şirove kir.

Vê weşê wîra têlêxistin. Ew ji berîka xwe têl-mobîla xwe derxist da ber guhê xwe û axivî.

Careke dinê têl kire berîya xwe û got:

-Lawikno, jina mine têlê xistîye. Dibê, hatinê nîn bistîne, bona sibê, taştê, nan tune.

-Erê, Sêrgêy Pavlovîç, -ez rabûme ser pê û min berê xwe da wî:

-Îdî derenge. Xwedê bike hemû mîrên dunyayê êvarê çûnê malên xwe, diravêwan hebe û malbeta xwera nîn bibe.

-Ahmedê ezîz, te rind got. Ev giliyêney teyê timê bîra min da bimînin. Lê jîyan barekî girane, sivikaya wê nabe qismetê her kesî.

-Belê, Sêrgêy Pavlovîç, usane. Xwezila hemû mirovêny dunyayê, her kes tenê derbarê xweda mitale nekira. A, ew barê giranî ku, hûn dibêjin, wê sivik bûya.

-Hûn derbarê dewreke usa da dibêjin, ya ku ne hebûye, ne jî wê hebe! Naha bêne ser pirsa Memo. Memo sala 1987 li Ermenîstanê dibistana deha kuta kirîye û ew birine eskerîyê. Wan sala Yekîtiya Sovêtê bû. Memo dişînine vira-Krasnodarêda eskerîyê dike. Ew rind jî eskerîyê dikişînê, bona emelîyateke eskerîyê ew tê rewakirin.

Eskerîyê sala 1999 xitim dike û nikare vegere Ermenîstanê. Vira Krasnodarêda dimîne û ew nikare têkeve qeyd kirina nasnamê. Nasnama wî li Ermenîstanê bû. Ji vir hey dinivîsin, wekî vaykomat -beşa eskerîyê ya wira, ji ku, ew şandine eskerîyê, nasnamaya wî bişîn, naşînin. Çar sala zêdetir wede derbaz bûnê şûnda Memo nasnamâ xwe ji Ermenîstanê distîne. Çawa, nizanim? Nasnamê, him evraqê eskerîyê dide îdara me, beşa duda. Ji îdara me derketinê mîlîs rêva wî digirin, evraqê wî dipirisin. Eyan dibe tiştekî wî tune. Wî tînin xweyî dikin, alîyê dinêda ew pirs dertê holê, wekî nasnamêda paşnavê wî Kaloyêve, lê evraqê eskerîyêda Kaboyêv hatîye nivîsarê.

Min îro, pey wera serokê pareskerîya wî qulix kirîra axivîye, wana got, ew şaşîya wane. Velî, ez Memo dispêrme te, hetanî evraqê wî rast kim. Ezê zûtirekê tera têlêxim, Memo jî hilde ware îdarê.

Weşek derbaz bû, ewî destê xwe dirêjî me kir, ku xatirê xwe bixwezê here, dîsa kêlimî:

-Jîzn-êto borba!(Jîyan-ew têkoşîne).

Ahmedê Hepo -----

Me xatirê xwe ji hev xwest, ew çû. Mayor çûnê şûnda em daha serbest bûn. Ez, Velî û Memoyê bira rûniştin, êpêcekî hevra axivîn.

Memo lez diket here mal û gote me:

-Welleh min usa bîra dayîka xwe kirîye!

-Memo can, -min bi hesretîke mezinva gotê,-ca bêje binê te çawa nasnama xwe ji Ermenîstanê stendîye? Tu çûbûyî wira?

-Na, apê Ahmed. Vira Krasnodarê gellek ermenî jî hene. Ermenîkî ji nehîya Zengîbasarê vira karê dike. Min ji wî hîvîkir, ew çûnê mala xwe, here ji nasnamedarê nehîyê nasnama min bistîne bîne.

Ewî jî anî bû.

-Lê wana çawa qanûn teribandîye? Nasnama yekî, dane destê yekî mayîn?

-Ê apê Ahmed,-Velî kenîya got,-naha ci qanûn. Ermenîya bi hezaranya nasnamên me şewitandin, bila ew jî bibe hezar yek.

Naha parwelatê Krasnodarêda ewqas kurd hene, wekî evraqêñ wan, nasnamên wan tunenin. Rûyê wê yekêda nikarin karekî kêrhatîva mijûlbin. Hinek nikarin ji mala xwe derêن.

Ji van gilîyêñ Velîyê hizkirî aloşeke germ ez hildam. Ne ewe bigirîyî, ne ewe bikenî?

De, fermo, binihêrin çawa girî-kenê me tev-hev bûye. Eva çar-pênc sale zilamekî mîna vî zilamî malla rûniştîye. Xîret wî dixeniqîne, dixweze here karekî, qe na, parî nan qezencke, wî digirin, dibêñ: - Tu qe ne tu kesî ! Navê te, paşnavê te, ciyê jîyana te

Ahmedê Hepo -

tune, wekî usane tu bi xwe tunenî? Tu, tu nînî, tu sîya rîyî, hatî-çûyî ser tera derbaz dibe! Welleh, billeh, hezar carî sond buxum, bona tu, bibî tu, welat, welat, dîsa welat pêwîste!

Em ker-lal rabûn maşînê sîyar bûn, wekî destê ewled bigihîne dê.

Rêva Velîye êgin gote min:

-Apê Ahmed, em Memo dayînine mala wan, zû vegerin, sibê dewata pismamekî meye.

-Bila, Velîyê mîrxas.

Ew kenîya.

x      x      x

Sibeke geş û xweş bû. Roja havînê dest bi germaya xwe kiribû. Kuça mala Üsivê camêrra maşîne kêm derbaz dibûn. Di nava wê seqitriyêda dengê çivîkan, qazên malan dihate bihîstînê.

Me taştê kiribû û em amade bûn rêkevin. Îro tevî malbeta Üsivê Evas emê biçûna dewata birazîyê wî. Digotin gundê, ku Qulîyê Evas lê dijî, weke 120-130 km dûrî Krasnodarê bû.

Du maşîne tijî mirov em rêketin. Yek Keremê Üsiv, yek Velîyê Sirafîl dajot. Ez maşîna Keremê Üsiv da rûniştibûm.

Ewî maşîne rîya fire, ya rastra sehetê 100 km zêdetir dajot.

Îro ez kêfxweşîbûm. Him bin şabûna bandora berdana Memoda, him bin rasthatina şeva

Ahmedê Hepo -----  
derbazbûyîda bûm, him jî şabûm, wekî ezê li dewatê  
rastî gellek mirovên nas, ne nasan bêm, him jî kabinê  
dewatê çawa derbazbe?

Ji du sehatâ hinekî këmtir em rîya asfaltêra çûn.  
Hinda gundekî devî rêda avtoajoyê me berê maşînê da  
alîyê rastê û em ketine nava gund. Min hîvî kir avtoyê  
hêdî bajo, dixwest rewşa gund rind bibînim. Xwedê ji  
wî razîbe cîkî, duda sekînî.

-Dibêñ, gundê şen, gundê ava ji dûrva kivşê.

Min ev metelok ber xweda anî ser zara. Lê Ûsivê  
bira dûmayîn da nêta min:

-Lê gundê xirab ser gunda bela-bela dibe.

-Belê, usane.

Dîsa em rê ketin.

Mirovan wê deqîqê tê derdixist gund gundekî bi  
şene. Avayî yek ta, du ta bûn. Ew bi çarmedoranva  
hatibûne wergirtinê, lêlafkên ser hevra, ber hevra çûyi  
rewşeke nebîniyayî dida der-dora. Bîna fêkî û rezên  
cuda-cuda davîte pozê mirovan. Darêñ sêvan bê jimar  
bûn. Çiqilêñ wan ji çarmedoran derketibûn û li kuçê  
pêda-pêda erd bi sêv bûn.

-Tê kivşê, -ez karnîyarî Ûsivê Evas bûm,-gund  
gundekî mezine. Dewlemende, gelo çend malêñ  
kurdan vir cî-war bûne?

-Belê, gund weke 500 malîye. Dewlemende. Weke  
150 malêñ kurdan vira dijîn.

Hema vê gavê dengê zurnê qube-qube, pêl, bi pêl  
li me tesele bû. Min şabûna xwe da der:

-Ev dengê zurna Sîyabendê Xelîle.

Ahmedê Hepo -----

-Erê, kek Ahmed, -Ûsivê Evas bersîv da, -tu lap ecêbî, te kura zanibû ew Sîyabende zurnê dixe?

-Welleh, nişkêva nuqutî dilê min.

Sewt, qam, awaza ku naha Sîyabendê Xelîl lêdida ez birim derxistime salê 1960-î. Wan salan min Ermênistanê-Êrevanê ûnstitûtêda dixwend. Ez odeke biçûkda bi kirê dimam. Usa minra hevhatibû ez cîranê Xelîlê bavê Sîyabend bûm. Zû-zû diçûme mala wî. Min ûnstitût xilaz kirinê şûnda em daha gellekî hevra hatine girêdanê. Ez rôdaksîya rojnama «Rya teze»-da dixebeitîm, ew jî radioya bermama kurdîra hevkari dikir. Gellek cara ez û dengbêj, helbestvan Mecîdê Sulêman diçûne mala wî. Xelîlê Evdile awaz, miqam lêdida, ew hevdihanîn, Mecîdê Sulêman helbest dinivîsî, diefrand, min jî gilî-gotin rast dikirin. Bi vî awayî, bi miqamên Xelîle Evdile, ser helbestên Mecîdê Sulêman êpêce kilam-stran hatine xuliqadinê û Êrêvanê, radioya beşa kurdîda hatine dayînê, êfir xemilandin. Rehma xwedê li Xelîlê Evdilebe.

Vira min xwe ker kir. Lê bîranînê reş-sipî ketine pêşîya min ez birim derxistime kûraya salan, hêjaya sazbendê tilî-pêçiyê bi mûmanî:

«Xelîlê Evdile, zurne, mey, bilûr, fiq lêdayîkî bêhimber bû. Ew awazzan, awazkar, efrandarê sazbendîyê bû».

... Sala 1970 min barkire bajarê Bakûyê. Me kêm hev didît. Du sal, sê sal carekê. Lê sala 1988-a pirsa Qerebaxa Çiya derketinê holê ermenîyan bere Kurdên muselman jî da. Xelîlê Evdile di rewşeke

Ahmedê Hepo

xirabda hat li Bakûyêda cî-war bû. Me dîsa dostîbiratîya xwe domand. Lê ew giran nexweş ket û sala 1991 çû ser dilovanîya xwe.

Wê salê min gotareke bi navê «Nexşê dor bi reş» derbarê Xelîlê Evdileda nivîsî û rojnameya «Sibeyêda», ya ku li Qazaxistanê ronahî didît da weşandinê. Çend rêz ji wê gotarê: «... Hêdî-hêdî nav-dengê wî, daha rast dengê sazbendî-zurna wî gîhişte hêlanê bilind. Îdî seba Xelîl gellek cara xwedanê şayîyê şayîya xwe paşa dixistin. Wana dixwest, wekî li dewata ewledê wan tenê Xelîlê Evdile sazbendiyê lê bike. Lê Xelîlê Evdile îro vî gundî dewat derbaz dikir, sibê gundekî dinê. Xêni ji Ermenîstanê dengê sazbendîya wî ji komelan Azerbaycanê, Gurcistanê, Qazaxistanê û ji cîyên mayîn dihat.

... Em bi xwe bûne şehedê çendî-çend dewatê wî derbâzkirî. Xelîl miqam lêxistinê, te tilîyê wî nihêrînê, te hew zanibû wana mîna evîndaran hevra dikirine piçe-piç, qal dikirin. Belê, wedê îdî govend dihate teribandînê, ewî bi çavêن xweye girva çav dikire diholvan û te qey digot, dibêje:

-Xorto, hazirbe, emê serê hespê buguherin.

Derbêra miqam dihate guhastinê.

... Van roja ev nexş-nîgarê miqamên kurdaye, ku Xelîlê Evdile xemilandibû, nitirandibû reş girêda. Xelîl bû mêvanê 50-î salê zivistana vê dunya ronahî».

Dîsa nêtîn min hespên bobelîskê, birûskê sîyar bûn, ser salêne nefikirina kurdan, aqara Ermenîstanê, Qırqıztanê Azerbaycanêra derbaz kir û du sazbendêن

Ahmedê Hepo -----

mayîne hêleye hêja anîne bîra min. Ez îdî 12-13 salîbûm.

Salên nefiyêda em avana Qorqandaşêda diman. Ew quntara çiyê, nava du newalada hatibû cî-war kirinê.

Berjêr derdiketî rastê, hevraz çîya û daristan bû. Fêza malên me kurdan weke 100-malbetên mirtiban hatibûne cî-warkirinê. Ewana jî sala 1937 ser kurdan hatibûne nefîkirinê.

Ew mirtibên kurdan bûn û biçûkan, hetanî mezina ji me rintir kurdî diaxivîn. Hê zarotiyêda gilîkî wan, gotineke wan bîra minda maye. Yekî ku, yekîra tiştek digot, paşê dipirsî:

-Tu ketî sérî? Yanê ku, te fem kir, kete serê te.

Ez him zarotiyêda, him cîwantiyêda gellek caran bûme şehedê zurne, mey, tulum lêdana Evdileyê Mirtib, şayî-dewat derbaz kirina wî. Dihol lêdayê wî ji mirtibû.

Evdileyê Mirtib bêjimar qam-miqamên kurdî lêdida. Dema yekî digot, hîvî dikir:

-Evdile bira, filan miqamî lêde.

Lê govend girtîya govend teribandinê, ewî zurne ji ser lêvîn xwe hilnedida, dikete pêşîya wan, direqisîya, nişanî wan dida, wekî çawa bireqisin. Wîra jî digotin: «Evdileyê Mirtib gula govendêye». Îro jî ez ser wê nêtême, wekî kesekî mîna wî ji govendê serederî dernedixist. Her miqamek, govendek-reqa-sek bû.

Mirtibara girêdayî qewimandineke mayîn qe bîra min naçe.

Ahmedê Hepo -----

Sala 1947-a bi biriyara Stalîn destûr dan, ji kurdan kî dixweze bila vegere cî-warên xweye berê.

Kîjan malbetê hinekî rewşa wan pak-qenc bû, bar kirin, berê xwe dane Kafkazê.

Êpêce malbetên kurdan û mirtiban bi xwestina xwe ji cî-warên nefikirî paşta vegerin Kafkazê. Malbeta Evdileyê zurne lêdayî jî tevî wan.

Vira pirs dertê holê, le çima Ermenîstanê nehîş em vegerinê cî-warên xwe? Ji ber ku, nava wan deh sala da Ermenîstanê ji Sûriyayê bi sedan malbetên ermenîya anîbûn û wan gundêñ kurdanda dabûne edilandinê.

Pêwîste ewê jî bêjim mirtibên, ku me kurdanra hatibûne nefikirinê, ewana ji nehîyen Azerbaycanê ji Yêvlax û Qazaxê hatibûne nefikirinê. Ewana her kes çûne cîyên xwe.

Malbeta me, qewm-pismamên me li nehîya Yêvlaxê û Kasim-İsmayılovê cî-war kirin. Malbeta Evdileyê Mirtib jî bajarê Yêvlaxêda ma.

Min vira mekteba navînda dixwend. Sala 1950 bû.

Rojekê Yêvlax hevket, wekî mîrekî mirtib, mirtiban bi xwe, ro nava royê, di kuçêda kuştine. Bi kurt bêjim-mîrekî mirtib girtin. Çendekê şûnda xwedanê mirovê mirî û mirtibên dinê, biçûk û mezîn, beravî derê idara mîlisayê, prokûrortîyê bûn, wekî mîrê me ewî girtî ne kuştîye, lê yekî dinê kuştîye. Sê rojan şev-ro ewana ji derê mîlisayê, organên mayîn dûr neketin. Belê, ew mîr dane berdanê, îcar jî yekî dinê dane girtinê.

Ahmedê Hepo -----

Hevtêk, dudu durbaz bû dîsa hemû mirtib berav ber derê mîlîsayê û organên cî bûn, na yê girtî merivê me ne kuştîye, lê filankesê kuştîye.

Çend rojan ew qal-şer çû.

Îcar jî ew mirtib berdan, yekî dinê dane girtinê. Çendek derbaz bû, wana dîsa ew hêl-kirinêne xwe wekilandin. Rast salekê ev yek hate wekilandinê. Nava salekêda çend mirtib hatine girtinê, hatine berdanê. Pey salekêra mirtiban ser navê Stalîn erîzedew nivîsîn û du-sê mirovan berê xwe dane Moskvayê.

Vê carê jî dewa wan ew bû, wekî hevalê Stalîn, mirovê me bi ecelê xwe mirîye. Lê mîlîsiya, prokûrortûra qest dibêن hinekêne me ew kuştîye, meremê wan ewe, ku ji me bertiliya-dirava bistînin.

Em hîvî dîkin ji Moskvayê mîzekara-komîsyayê bişînin, bila bêñ, binihêrin mirîye me bi ci derbê mirîye?...

Em we didine bawerkirinê, ew bi ecelê xwe mirîye. Ger usa nebe me dîsa bidine nefîkirinê!

Rojekê jî li Yêvlaxê bû hewêrze, wekî ji Moskvayê, Bakûyê deste komîsiya hatîye gazinê mirtiban nihêriye û ser ecêbeke mezin vekirine.

Komîsiya hatî tevî mirtiban, xwedanê mirî, çûne merzel, tirba mirtibê mirî kolanê, vekirinê, nihêrine laş tune. Naha Moskva û Bakû hevketîye.

Mirtib dibêñ, ku hukumeta cî, mîlîsiyayê, prokûrortûra Yêvlaxê pêsta zanibûne, wekî ji Moskvayê, Bakûyê komîsiyayê bê, wê derewê wan

Ahmedê Hepo -----

derxine holê, lema jî wana hatîye laş ji tîrbê derxistine  
birine, cîkî mayîn veşartine.

Ez bi xwe bûme şehed:

Weke sed mirtiban, biçük-mezin-ahilan herekê  
şivek, warkozek destâ da, jînan paşil-pêsilên xwe tijî  
kevir kiribûn, derê idara mîlîsîyayê, prokûrortûrayê  
girtibûn, deng-dabûne dengê hev, ew didane ber  
kevir, kestekan, wekî zûkin mirovê meyî girtî berdin û  
laşê yê mirî derxin bidin!

Yê girtî zûtirekê hate berdanê, laş nehate dîtinê.  
Ser wê yekê serokê milîsîya nehîya Yêvlaxê, prokûrî  
ji kar derxistin, hinek hatine girtinê.

Sal derbaz bûn. Pey hilweşandina Yekîtiya Sovêtîra ji alîyê hakumeta Azerbaycanêda birîyar hate  
pejirandinê, wekî bona netewîyên kemjimar navend  
bêne sazkirinê, çawa organên wana rojname bêne  
weşandinê. Bi serkarîya me, bi alîkarîya rewşenbîran  
Navanda Çanda Kurd «Ronahî» hate damezirandinê,  
birîyar hate pejirandinê çawa organa navendê  
rojnameke ya bi navê «Dengê kurd» bê weşandinê.

Ez him bûme serokê navendê yê yekem, him jî  
rêdaktor-berpirsiyar. Sala 1992-a bona weşandina  
rojnama «Dengê kurd» çûme gellek nehîya, wekî  
rojnamê ser navê mirovan bidime nivîsarê, bi hêja,  
diravê destanî ewa ronahîyê bibîne.

Pey gellek nehîyanra hatime Yêvlaxê. Me li  
gundan pirs da safikirinê û vegerîne bajarê Yêvlaxê.

Cîye bêjîm ez tevî Nerîmanê hevalê xweyî zarotîyê hatime bajarê Yêvlaxê. Çend hevok derbarê malbeta Nerîmanê Eyyûbda reşevekime ser kaxez.

Sala 1948-a ji Ermenîstanê azerî, usa jî êpêce malbetên kurdan bi zorê koçberî Azerbaycanê kirin.

Malbeta Eyyûbê Memmed hatin bûne cîranê me. Eyyûbê Memmed Azerbaycanî, jina wî-Xatûna Qaso Kurd bû. Ev malbeteke giran bû-6 keçik, 2 kur.

Min û Nerîman 10 salan tev xwend. Pey dersxana dehara ez çûm Èrêvanêda înstîtûtêda hatime pêjirandinê, Nerîman bona xwendina bilind desbîne çû Bakûyê.

Pêwîste bona pirseke gellekî ferz, çawa minak, ser rêjîyana vê malbetê rawestim.

Çawa dibêن, koça vê malbetê timê tevî koça kurdan bû. Ev jî beqî ewleda Kurd Xatûna Qaso bû. Mesele-metelokeke meda tê gotinê: «Şêr şere, ci jine, ci mère». Ev hinartina gel, welleh, billeh raste rast li bejina Xatûna Qaso dihat.

Ezê her tenê du qenderê vê dota kurd bînime holê. Bila xwendevan bi kurtbe jî tê derxe ev xatûna Kurd xwedanê ci nav-namûsê, xîretê, bilindayê, mezinayê bûye.

Ya yekê: Keça vê malbetê, ya biçük, yek salî bûye, gava mezinê malê Eyyûbê Memmed diçe ser heqîya xwe. Qara mala giran, ya 8 zaran dikebe ustûyê Xatûna Qaso. Di wê rojêda dayîk ser zarên xwe dibe firara giran, wana mezin dike, ji wana sisê dibine-xwedanê xwendina bilind.

Ya duda: Hemû zarên Xatûna Qaso bi kurdî zelal, paqîş diaxivîn. Her 6 keçen wê bûne bûka malbetên kurdan, ji wan keçan yek jî bûye bûka malbeta me, jinbira min.

Ji wan 8 zaran naha ji 50 kesî zêdetir mirov hene, xwedanê çend malbetanîn.

Dawîyêda ewê jî bînîme ser zara. Bavê min Xatûna Qasora digot:

-Bilbila zimanê kurdî!

Bajarê Yêvlaxêda him çend malbetên kurdan, him êpêce malê mirtiban dijîyan. Dema ewana mere-mê hatina me hesîyan, li dora me civîyan.

Jineke navsere gopal dêstda derkete pêşberî hemûya û bi dengekî gur got:

-Weylo, weylo mirtibên meno! Ev bira bona me dixweze bi zimanê me qazêtê (rojname) berde. Ezê bona mala me sê qazêta bistînim. Kî qazêtê nestîne bila torbê wan qulbe, hemêse (timê) hewcî tûrikbe, ew jî qe tijî nebe!

Evê jinika mirtib helanekî usa da wana, kela netewîhizîyê dilê her yekî germ kir. Pêncî rojname ser navê mirtiban hate nivîsarê.

Me ne ku bi dilekî, lê bi hezar dilî qayîlbûna xwe da wana û çend gava ji avayêwan dûrketibûm, yekî parava gazî min kir:

-Birayê Ahmed , cirkekê bisekine!

Min piş xweva nihêrî, mîrekî 60-65 salî bi gavêne fire pey me tê. Em cîyê xweda sekinîn. Ew gîhişte me, destê xwe dirêjî min kir û got:

Ahmedê Hepo -----

-Careke mayîn selam. Navê min Asoye. Min tu wê deqîqê naskirî. Naha ezê bêjim, ezê têkevime bîra te.

-Fermo!

-Sala 1951-ê te li vira dixwend. Dîya min çûbû rehmetê. Em kasibûn. Kavireke meye jar hebû. Min ew anî we pezeke fîrma kolxozi guherî. Min ew pez xêra dîya xwe da. Sebebkar tu bûyî.

Belê, ew bûyer kete bîra min. Ewî qe nehîst ez gîlîkî bêjim gote min:

-Keremkin em herine mala me. Tu neyê ezê bi zorê te kaşkim.

Vê gavê ew qewmandina mîrkuştinê kete bîra min û min çavkire Nerîmanê bira, wekî em gotina wîra qayîlbin. Ewî nêta min derzkir û min berê xwe da mirtib:

-Emê bêne mala te, lê bi qewilekî?

Ewî ez bi herdu destan hemêz kirim, carekê-duda dor-hev fitil da.

-Birayê Ahmed, - bi lewzekî şîrîn got,-çi qewilê te hebe ser herdu çavîyê min. Çemê Kurê nêzîkî mala meye. Wekî bêjî ava Kurê îcke (vexwe), ezê îçkim.

Em ji rê dagerîne mala mirtib. Ser avayê du ta, hewşa fire ya paqîş, carmedora bilinde bi keviran hilçinî heyr-hejimekar man.

Çend kur-keçik ser carcimeke neqîş bi naqîş rûniştibûn. Wana em dîtinê çawa dibêñ herek derekêda revîn.

-Ewana tûrikê minin, -ewî gote me.

Min bi ecêb wî nihêrî. Te hewzanibû ewî nêta min fem kir.

-Hûn dibêñ zarêñ min, em dibêñ tûrikêñ min. Ewana mezin bûnê, herek tûrikekî hildide diçê, xebatê. Bi femdarîya we diçine parsê.

Aso kete pêşîya me, em derxistine tayê duda, derê odekê vekir:

-Keremkin,-got-,derbazî hundurbin.

Em derbazî odê bûn. Hundurê odê qe ji nava malê me cuda nîbû. Mêbêlên nûhdem bi pergel hatibûne cî-war kirinê. Li ser raxêrê berîke bi «Nexşê masîyan» raxistibûn. Du dîwarê odêda xaliçen Îranê darda kiribûn, fera-fotikêñ reng bi reng rewşeke birq vedayî dida odê. Li quncekî odêda çend xaliçen vajîkirî , dirêjayî, gilol-gilol kiribûn û çik danîbûn. Ewî stol nîşanî me da û got:

-Hûn rûnên, vê gavê têm.

Em rûniştin û me êpêcekî çavêñ hev nihêrî. Nizam Nerîmanê bira ci mitale dikir, lê ez heyra wê yekêda bûm, ew sura çendî-çend salan iro wê bê vekirinê. Lê dibêñ, «Mirov tu ya xwe bike, binê felek ci dike».

Ez rex roderê rûniştibûm, min bê hemdî xwe derva nihêrî. Min dît Aso elokek danîye erdê, bi pîyêñ xweva baskêñ wê didemisîne û dixweze serjêke.

-Nerîman, -ez berbirî wî bûm,-ca binihêre, binê mirtib ci dike?

Ew ji ciyê xwe rabû hat roderêra nihêrî û kêlimî:

-Asoyê bira mera hindûşkê (elokê) serjê dike. Zarên wî jî qırşikan tînin didine ser hev. Tê kivşê emê kibaba bixwen .

Em hev kenîyan.

Vê weşê derî vebû keçikeke 15-16 salî sinîya bi stekanê çayê, şagalatên here hêja anî, danî ser pêşxwînê, stekanê çayê danî ber me û çû.

Me hê çay venexwer bû Aso hate hundur.

-Qe ber xwe nekebin. Vê sehetê her tiştê hazirbe,- ewî got,- û derbazî oda dinê bû. Çend deqîqa şûnda du-sê şûşen araç, konyak hemêzda anî danî ser pêşxwînê. Bi dengekî ken-hen gote me:

-Lo birano, çay çîye hûn veduxwen. Naha emê ava zelal, şerbeta dunyayê vexwen.

Nava wedekî kinda destexaneke têre-tijî hate vekirinê, tasên kibaban danîne ber me. Ewî stekana her yekê me tijî araç kir, ya xwe da destê xwe û rabû ser pê, wekî bi axive, eşqa me vexwe, min nehîst û got:

-Birao! Ne em bi qewilekîva hatine mala te. Hetanî tu bersîva du pirsen min nedî, emê serê nanê te jênekin.

Ew hêdîka rûnişt, stekana araçê wêda danî, desten xwe ber hevra bir û got:

-Keremke!

-Sala 1950-ê vira Yêvlaxêda mîrekî we kuştin. Kê ew kuştibû, bona ci kuştibû?

Ya duda, rind tê bîra min we dew kir ji Moskvayê, Bakûyê komîsiya hatin, tevî we çûne merzel, tirb

Ahmedê Hepo -----  
vekirin nihêrîn laşê mirovê we tune? Eva 40 salî zêdetire ser wê qewmandinêra derbaz bûye, bêje metirse!

-Birayê Ahmed, tirsa min her tenê ji Xwedêye. Ezê caba (bersiv), suwaleke (pirs) te bidim. Wê şûnda hûn zanin dixwezin nanê min buxwin, naxwezin mexwin.

-Keremke!

-Kerema te Xwedêbe, -Aso got,-û dest bi qewmandinê kir. Ew mîrê me kê kuşt, bona çi kuşt ew bûye sura me. Her gilîk nabe sura mirtiban. Çaxê (gava) tiştekî vacîb (giring) diqewime, koma mirtiban biçûk-mezin dicivine derekê, gişk milê xwe bilindî hewa dikin, destê xwe vedikin û hevra-hevra dibêjin:

-Hey, hey, way!

Ew dibe sonda me, surameye qîyametê. Kîngê dibe, bila bibe, yê ku ser wê surê veke bi nisila xweva diçine cehnemê. Him jî ew mal-malbet tê hesebkirinê pêşimitî, dev vekirî, meriv firotî. Paşê tu mîr, tu jin wê malêra hevaltiyê nake. Tu kurek ji wê malê qîzika (keçik) nastîne. Mirtibên dinê hêdî-hêdî, kere-ker wê malê yeko-yeko xirt dike. (Endamê wê malbetê yeko-yeko dukije).

Her ku ewî ev bûyer qal dikir, te hew dizanibû, destekî bi hêz dirêjî dilê min bûye, wî digivişe, daxa min derdixe. Min xwest biqîrim û pirskim:

-Lê gelo ew sur xweyîkirin di nava me hemûyada heye, yanê na?

Ahmedê Hepo -----

Vê qasê Aso li min nihêrî û pirsî:

-Rengê te çima fîriye?

Min xwe serhevda anî û got:

-Qet, keremke, bidomîne.

Ew dîsa rabû ser pîyan û stekana ber xwe da destê xwe:

-Destê xwe dirêjî sifirê (destexan) bikin, serê nanê me jêkin. Ez evê saxlîya we veduxum!

Ewî araq vexwer, pirtî kibab hilda û dûmayîn da axavtina xwe:

-Rehet nan buxun! Ezê mesela dinê jî soylemîşkim (qal kim).

Me nan xwer, destexan hate hildanê, dîsa çay anîn, Aso bi beşerek xweş dûmayîn da bûyerê, qewmandinê:

-Birayê Ahmed, belê tu rast dibêjî, me ew oyna (ew leystik) anî serê mîlîsyayê. Meribên me erîze birin li Moskvayê, avîtine poçta Krêmlê.

Cend rojan ji Krêmlê dûr neketin. Rojekê dibêjine mirovên me, herine cîyê xwe, hevalê me, bavê me Stalînê komîsyayê bişîne, ka binê hûn rast dibêjin, yanê na?

Merivên me hatin. Mezina orta (nava) hevda meslehet (şêwir) kirin, çawa bikin. Ne axir mirovê me bi kêrê hatibû kuştinê.

Meslehet bû ew, wekî şevekê meytê merivê me ji tirbê derxin, bibin li nehîya Qazaxê çelkin. Çawa hûn zanin wira jî merivên me dijîn.

Vira min çavêن Nerîman nihêrî, ewî çavên min.

Ahmedê Hepo -

-Welleh hûn yûrîstê xasin. Yêvlax-Qazax 130-150 km dûrî hevin.

Ev gilîyên Nerîman xweşa wî hat, kenîya, avek vexwer, dîsa dor da qewmandinê:

-Şevekê me çû tirb kola, meyt derxist. Sê erebe gembendî şeş hespan kir. Me meyt kire nava gîyayê hişk. Serda jî cetîlî reşand, tırşo beravkire ser. Me pezek, dudu serjêkir, goşt avîte ser. Nişkêva rêda erekbêne me binihêrin, wê hewbizanibin bîna goşte.

Erebê dinê jî me hinek patik-pûtik, palaz-malaz, biroş-tas kîrinê, zar jî sîyar kîrin û me berê xwe da nehîya Qazaxê.

-Mirovên weye wira,-min jê pirsî,-haji vê pirsê hebûn?

-Erê, erê! Me şevekê xwe gihande merzelê meyî li Qazaxê. Me ew merivê xwe wira çel kir.

Komîsiyayê hat nihêri meytê merivê me tune. Me şer avîte wana, wekî organên cî zanibûye ji Moskvayê komîsiyayê bê, meyt derxe, binihêre, wê binihêre tu derb li meyt tunenin, lema wana meytê mirîyê me derxistine veşartine. Ser vê gotina me, mîrê girtî berdan, paşê jî oyîneke mezin anîne sere xebatçiyê (karkarê) mîlîsayê...

Vira ewî xwe ker kir, rabû derkete derva, zû jî vegerî û hema şipê berbirî me bû:

-Birano! Ahmedo, Nerîmano! Rind bizanibin em sura xwe, yekîtîya xwe nafiroşine vê dunya xap-xapok. Em ewê xwera dibine dunya cinnetê! Ew dunyake usane destê merivên şîrê xammêtî lênamekeve.

Min bê hemdî xwe kire qîrînî û weşek derbaz bû,  
bi dengekî lerizî, kewrek got:

-O! Ez qurbana wê Yekîtiyê bim! O! Ez heyrana  
wê surê bim! Ya ku bona kérhatina netewîyê ji salên  
jîyanê, hetanî tîrbê nayê teribandinê, ser nayê  
vekirinê! Lema gotine: «Kurmê darê ji darê nîbe, dar  
narize».

Ya Rebbî! Em timê bûne hewcîyê yekîtiyê, sur  
xayîkirinê!

Dawîya vê bûyera weke minakekê me têra dît  
nêteke dîrokî derxine holê.

Zanîyar, lêkolîvanê erf-edet, nivîskar, ziman-zanê  
kurd yê sed salîya XVII-Melle Mehmûd Bayazî-dî di  
pirtûka xweye bi navê «Erf û edetên kurdan»-da  
dinîvisê, ku li bal her qebîleke kurdan çend malbetên  
mirtiban, him jî yên ku têne navkirinê begzade, dijîn.  
Ev mirtiban gellekî belengazin. Ewana saz û dihol  
lêexistinêva mijûlin, ewana sazbendiyê dikan. Dewat û  
cejina bi sazbendiyeva didine derbazkirinê. Lê jinê  
wan parsektiyê dikan. Bi vî awayî dijîn. Zimanê wanî  
taybetî heye, xênî ji mirtiban kesek wî nizane. Di  
malên xweda bi wî zimanî diaxivin. Lê bi kurdanra bi  
kurdî diaxivin.

Ji kurdan tu kesek keça xwe nade mirtiban û ji wan  
nazewicin.

(Binihêr: Mela Maxmûd Bayazîdî, «Nravi î abiçai  
kûrdov» Moskva, 1963. Rûpêlê 64-a.

Werger: M.B. Rûdêenko).

Erê! Sed car erê! Ezê derbarê sazbendekîda jî, çênd gilîyên xwîna dilê minva mewicî jî ronkim.

Ew Egîtê Cimo bû. Dîsa sala 1960. Bajarê Êrevanê, radioya beşa kurdî. Rojeke baharê bû. Xwîn kelbû. Gava ez-xwendevanê Înstîtûtê hatime bal serwêrê beşa kurdî-Xelîl Mûradov ewî gote min:

-Tu nivîsar-gotara xwe bide min, paşê ezê lêbinihêrim. Naha were em dakevine stûdîyayê, Egîtê Cimo meyê, zurnê lêdide, dinivîsine ser qeytanê.

Em hatine stûdîyayê. Dengê zurnê û diholê ez ricaftim. Xortê bi bêjin-bal-tîtal bi qeydê «Bêrîvan»-êva ez birim derxistime zozanên me. Xule-xul, lema-lema kanîyan, wîte-wîta çivîkan, kale-kala berxan, mike-mika karan, dengê şivan-berxvanan, şinge-şinga elbêñ destê bêrîvana hiş-sewdayê minra derbaz bû. Bîna qevzên kulîlkên reng bi rengî hate min, ez mest kirim. Mîna berfa belekîya, ya ku tav dide-dihele, xweda helîyam, kişiyam. Ruhê min hêdî-hêdî minra germayî anî, şinginî kire jûnîyên min. Min xwest rabim bireqisim.

... Sal derbaz bûn. Ez û Egîtê Cimo hevra bûne dost, bira, ew cîyê xweda. Kurt bêjim. Roj bi roj, meh bi meh, sal bi sal dengê sazbendîya Egîtê Cimo ji her maleke kurdên Pişkafkazê hate bihîstinê. Paşê em bi wê yekê jî hesîyan, wekî sazbendî, awaza Egîtê Cimo, kilam, stranên, ku bi awazkirina wîva hatine xuliqandinê, şoreşen li Bakûr û Başûra Kurdistanêra gav dane, bi hezaran mirov ruhdar kirîye. Naha ji min pirskin;-Gelo, Egîtê Cimo, Xelîlê Evdile, yanê

Ahmedê Hepo

Evdilê Mirtib rind lêdide? Qe nizanim çi bêjim? Ev  
pirs himberî wê yekêye, ji mirovan pirskin:

-Tav rinde, hîv? Roj rinde, yanê şev?

Mirov çi bersîvê bidin, bersîva min ji derbarê  
hersêk awazkaranda ewe!

Me rîya xweye nava gund domand. Em hatin  
derketine pêşberî golekê.

Dihate xanê avtoajo rîyê rind nasdike û kevîya  
golêra hêdî-hêdî dajo.

Tavê tîrêjên xwe avîtibûne ser ava golê. Te hew  
dizanibû şeqq-şemala wê û birqini-zelalîya avê hevra  
ketine dilanê. Ew xeleq-xeleqî bibûn, fitil-fitil diçûn-  
dihatîn.

Min dîsa hîvî kir hinekî bisekinin. Em gişk ji  
maşînê peya bûn. Ez çend gava ji машînê dûr ketim,  
ber bi golê çûm. Kevîya golê kûr bû, pêda-pêda bi  
devîyên şêmîyan, lêlavkanvan hatibû dor girtinê.  
Ewana sixte-sixte bûn.

Cî-cîya darên bîyên qûfikan dihatine kivşê. Dûrva  
te tirê ewana qevzê gulanin. Çiqilên wan daliqîbûne  
ser devîyên şêmîyan û rewş bi rewş, xêlîya bûkan  
dihanîne ber çavan.

Bîna ava golê, şêmîyan, lêlavkan, gulên hewşen  
malan, fêkîyan tevhev bibûn û mirov ruh xweş dibû.

-Çi goleke paqişe, -min gote Ûsivê bira, -ava wê  
zelale.

-Raste, wêra gol dibêjin, lê ava wê dikişe. Ava ku  
dikişe, timê zelale.

-Belê, usane.

Ahmedê Hepo -----

Ûsivê Evas mîna dersdarekî dunêzanebûnê destpêkir nasîya gund kir, ew nitirand:

-Eva kuçe gellekî dirêje, diçe-diçe, pirê asê dibe. Tu ku pirê asê bûyî, lazime ser milê rastê bizvirî. Dirêjaya pirê weke 10-15 mêttraye, pirê ku derbaz bûyî, bixwezî-nexwezî tuyê vejerî alîyê rastê. Binihêre avayêñ wî alî, vî alî himberî hev hatine avakirinê.

Nizam Ûsivê bira dîsa çi dixwest bêje, nebêje ez ketime nava axavtina wî:

-Çavê xwedanê gund ronbe !

Keremê Ûsiv ji min pirsî:

-Apo, çîma kîye xwedanê gund? Tu wî nas dikî?

Min dora xwe nihêrî, çend mêttra ji me dûr, li hewşa avayîkî du zarêñ rûsan hol dilîstin, destê xwe dirêjî wan kir û got:

-A, ew zarêñ rûsaye, ku hevra holê dilîzin, ewin xwedanê vî gundî. Gund, gundê wane.

Me hersêka hevra rûyê hev mîze kir.

Me rind hev fem kir û te tirê yekî berê xwe da me û pirsî:

-Gund şêne, xirabe çi wera?

Weşekê cîyê xweda qerisîn. Lê dengê sazben-dîyê em ber bi xwe kişandin. Em hinekî kevîya golêra peya çûn. Dûrva govend dihate kivşê, dengê saz-bendîyê jî ber guhê me bû. Çend deqîqa şûnda em gihîştine himberî govendê. Min rind dît, wekî sazbend di nava dorgirtina govend girtiyadanin. Gava zur-nevan Sîyabendê Xelîl dît em wêda têñ, ewî govend

Ahmedê Hepo -----

qelişand, zurne ser lêvan hêdî-hêdî berbi me hat. Dihol lêdayî jî gav-gav pey wî dihat. Em gîhîştine himberî hev, ewî zurne betal kir û çepilên xwe bilind kir û ez hemêz kirim:

-Apê Ahmed,-bi dengekî qalim got,-tu ser sera, ser çavan hatî! Ez bi dilekî mezin xêrhatina te dikim!

Me bi dilgermî kîf-halê hev pirsî, min razîbûna xwe da wî û berbi mala xudanê dewatê çûn. Nava çend deqîqa da bi dehan mirov dora me beştar bûn. Épêcekî hevra ketine dilxweşîyê. Siyabendê Xelîl jî nikî min sekinîbû. Ewî zurne da destê xweyî rastê, ew bilind kir, karnîyarî beştarbûya bû:

-Bi aqilê min gişk nivîskarê me Ahmedê Hepo rind nas dikan! Lê ez dixwezim bêjim ew û bavê min rehme lêbûyî Xelîlê Evdile hevalê hev bûn. Hevra hevaltîke şirîn dikirin. Eva cîyê xwe da.

Gava em ji Ermenîstanê dane derxistinê, em hatine Azerbaycanê. Apê Ahmed gellek pirsada mera rûsîpîti kir.

Mamoste rind jî govendê diçe. Ezê qamê «Sêpêkê» lêdim, kek Ahmed, hîvî dikim têkeve ser govendê.

Govend him şen bû, him rêz bû. Min teqil, cî bi cî sergovendî kir. Sazbendan çend cara miqam guhastin, me jî weke miqamê lêdayî govend gerand.

Hate zanînê, wekî sîyarê bûkê amadene herine pey bûkê. Me govend da xayîkirinê. Çend maşîne xemilandibûn. Desta sazbenda ya pêşiyê sîyarbûn, wekî dinê jî çare-çar, pênce-pênc keç-bûk, xort-ahil

Ahmedê Hepo -----

tijî wana bûn û bi dengê zurnê, bi heyte-hol rêketin.  
Pey wana av reşandin, xêr-dûa, oxira qenc xwestin.

Em pêhesîyan, ku mala bavê bûkê li gundekî dinê,  
ji vir 150-160 km wêdatir dijî.

Ew demek bû sîyarê bûkê rêketibûn. Xortekî bejin  
nivçê wêda hat û karnîyarî mîvanan bû:

-Keremkin, ser pîya nesekinin, derbazî çadirê bin.

Ew kete pêşîya mîvanan, ber xanîyê du tayêra  
derbaz kir, li ber ximêyê sekinî û gote beştarbûya:

-Mîvanên hêja, hîvî dikim derbazbin rûnên, em  
xizmeta weda sekinîne. Ji xwerin-vexwerinê venekşin.

Du, sê xime-çadirên lêşkeriyê hevva bend kiribûn,  
çawa dibêن, bibû konekî danzdeh stûn.

Vexwendî jî hey dihatin. Xwerin-vexwerin jî zêde-  
zêde bû.

Min çend sala berê bedewnîsarek-nivîsarreşek ya  
bi navê «Xerîbo» nivîsiye, ew pirtûka bi navê «Hêsirê  
xwînê»-da hatîye weşandinê. Wê cî bi cîbe, wekî ji  
wê çend hevoka bîr bînim:

«... Bobeltekê jî bêjim. Kurd ku beravî cîkî dibin,  
kurdêن vira-vira dipesine, yê wira-wira, yên dera  
hanê-dera hanê. Tu qey dibêjî hetabî li welate, yên  
mayîn li ber tendûra hinekanin». Çima ev kete bîra  
min?. Ji ber ku, îro, li vê dewatê, gundekî Rûsî-  
yayêda, dîsa bûme bihîstinguh-guhdarê van pesina:  
Yekî yê mayînra digot:

-Gundê me gundekî rinde. Em sed malêن kurdan  
têda dijîn. Bajona gund fireye. Gellek xwera heywîn  
xayî dikin. Hinek alîş-vêrîşê (kirîn-firotan) dikin,

Ahmedê Hepo -----

hinek derê mala xwe bakilacanan direşîmin. Îsal rind hate firotanê». Yê dine bi rik bersiva wî da :

«-Lo, mal avao, tu ci dibêjî, hela were gundê me, ci gundekî mîna bajêre. Hinekê me diçin daça (bax) da dixebeitin, camêrên rûsan helalin, heqê rind didin». Yekî jî...

Qe yekî ne anî ser zara, wekî em mêvanê wan gundanîn? Qe yekî bîr ne anî, heta naha çend gundê awa pesinandine.

Ez jî ketime kirê wan:

-Na, welleh, hûn rast nabêjin, gundê meyi li Azerbaycanê, usa rinde, salê danzdeh meha pincar, zerzewat lê tê reşandinê, kêf-kêfa meye!

Lê min xwe zeft ne kir bi tinaz, qerf kenîyam. Ji wan camêra yekî destxweda nêta min fem kir. Ewî berê xwe da min:

-Kek Ahmed, ew berêda pêşê me hinekane, malê xelqê dipesinin. Min têderxist tu tiranê xwe bi me dikî.

-Bavo, birao,-min berê xwe da wana,- wekî hûn li welatê xwe bûyana û we gundên xwe bipesinanda, minê rabûya destê her yekê we maçkira.

-Ez, tera razîme Ahmedê bira,-yekî 65-70 salî got,- dema em Ermenîstanê bûn, Azerbaycanê bûn me ew der dipesinî, em girtin nefîkirin me gundên qirqizan, üzbîkan, qazaxan pesinand, naha jî em rûniştine gundên rûsan didine rêzê.

-Na, çîma usa dibêjin, -yekî dinê pêşta hat,-em şev-roj derheqa welat da jî mitale dikin. Dilê me bona

Ahmedê Hepo -----  
erdê Kurdistanê ba dibe. Rojekê Xwedê mera rêkê  
veke.

-Xwedê gotîye, ji te hereket, ji min bereket!

-Naha him hereketê me heye, him bereket.

De, hetanî wedekî dirêj gilî pey giliyan, nêt li  
nêtan hev hate zêdekirinê. Çawa dibên, nişkêva bû  
hewar-gazî, dengê zurnê bala me ber bi xwe kişand.  
Em gişk ji ximê derketin. Zaran deng dabûne dengê  
hev:

-Bûk anîn! Bûk anîn!

Bûk-zava ji maşînê peya kiribûn. Em çend gava  
ber bi wan çûn. Xêlî ji ser çavêن bûkê hilbiribûn.  
Bûk-zava ketibûne milê hev. Bejinêda bûk-zava weke  
hevbûn. Te qey digot bejin-bala wan weke hev meqes  
kirine. Bûke tarihan, zava bejintepisandî bû. Keçike  
dêmsor-sipî, çavzirî, buru-bijang qetran bû. Xort  
dêmqemer, pozberanî, çavtasinî, navmilpen, kirane  
bû.

Dora bûk-zavê çarnikal govend girtibûn. Xortekî  
destê zavê, keçikekê destê bûkê girtibû û hêdî-hêdî  
govendêra fitil-fitil dibûn.

Êpêcekî şûnda rûsipîyê malê da zanînê bêne ximê.

Dilan zivir-zivir zivirî, requesvan xingir-xingir  
xingirîn, bûk-zava anîn dexistine ser bilindcîyê  
miraza.

Bavê xort bûk-zavêra êpêce giliyan şirîn nijand û  
ew yek anî ser zara, wekî filankesê bibe serdewatî.  
Gişka dest hev xistin, eşqa wî bade bilind kirin,

Ahmedê Hepo -----

-Sala, 1966-a! Yanê ku ew sala 1966-a hatîye nivîsarê.

Nişkêva bû hewêrze. Bû qîre-qîr, hewar-qazîya beştarbûya:

-Tu her bijî! Xwedê qelema te tujke!

Nava van xwestina da min dengê girî jî bihîst. Bona mirovên li şayîyê ji vê rewşê derxin, min got:

-Sîyabendê birazîya, bihêle ez vê pirtûka xweye nûh bidime herdu mirazhiza, paşê miqamekî giran-«Kofî»-yê, wê şûnda miqamê «Laçinê» lêde, em dilaneke şen bigirin, bixingirin.

Ez dîsa hatime rûyê herdu kevotka-bûk û zavê û min pirtûka xwe da wana û bere xwe da dewatîyan:

-Min ser pirtûkê ev gilî-gotin nivîsîne: «Bûk-zavê hêja! Îroda cêhêzê bûkê wê tevî kelmelê malbeta zavêbe! Hûn wî cihêzî ne ku, li vira kewinkin, biri-zînin, bişkînin, lê welatê xwe-Kurdistanê. Mêbêlê, ku bûkê ji mala bavê xwe anîye bavêjine vê gola rex mala we û herin mîbêla bi duruşma «Kurdistanê» bistînin, dubare şabin. Wekî usabe, ew derd-kul, xwestina pirtûkêda nivîsî wê bêne dermankirinê, birîna minê bê melhem kirinê».

Pey vê yekê min da zanînê, wekî Sîyabendo, birao, lêde, guje-gujê bide zurnê.

Sîyabendê Xelîl xwest zurnê bide ser lêvên xwe lêde, wêda mirovekî 40-45 salî, bi berçavk, serxwe, cindî hat rex min sekînî û got:

-Mamoste, biborîne mîkrafonê bide min.

Ahmedê Hepo -----

Ez bawerim hûnê gellek pirsada rîya kal-bavêñ xweda herin, him jî hûnê ji wana hetabbin.

Min nihêrî mirovêñ beştarbûyî bi hewaskarîke mezin guh didine min, ez hinekî bi dil bûm û axavtina xwe domand:

-Çiye ew hetabî? Bona vê pirsê zelalkim ezê sê qewmandina, ser sê heytîya bisekinim. Yêñ ku, eva çendî-çend sedsalin nahêlin em carêkêva ji holê bêne rakirinê, bêne guhastinê. Zanîyarî wêra dibêjin:

-Asîmilasîyon, pişaftinî.

Ya yekê: Şerkarîya meye netewîyê-azadarîyê bûye. Ew jî ne yek bûye, ne dudu bûye... Dujmin, neyarêñ me yek temirandinê, yek fetisandinê, yeke dinê serê xwe bilind kirîye , hatîye vêxistinê, hatîye gurkirinê, xurtkirinê. Serhildan, şerkarî, şoreşen heqe pey hev domandî.

Ya duda: Her teyr xweşe refê xwera.

Vê weşê ji nava dewatîyan dengek hate min:

-Mamoste, çima usa gotine?

Min qe nizanibû kê ew pirs da min. Ci fîrqî, kî dibe bila bibe, min dûmayîn da nêta xwe:

-Bi bawerîya min her yekê we refê qulingan dîtîye. Qe reşêlek dikarin tevî qulingan bifirin. Wekî em evê nêta sal-zemana şirovekin, bînin pirs-warê gel, netewîyaran bidine derbazkirinê, her gel, her netewî bi erf-edet, rabûn-rûniştandin, çand, dîrok, wêjeya xwera xweşe, serbilinde, serfiniyaze, hetabe.

Ahmedê Hepo -----

Timê keç-xortên me ji hev hizkirine, hevra qayîlbûne, hevra zewicîne, mîr kirine. Bi wê yekêva zimanê xwe, erf-edetê xwe domandine, dane parastinê.

Ya sisîya: zargonina meye dewlemend bûye. Ezê dilokekê, duda bêjim, paşê bême ser nêta xwe.

Vê gavê çepik lêdan, xortan kirine fîte-fît, deng dane dengê hev :

-Canê-can! Heylo-heylo! Ez heyran!

Tevgel, dewatîyên dewatê seqirîn, xwe ker kirin, min des pê kir:

Kerî pezê li wê piştê,  
Min jimirîye nav-niviştê,  
Gede-lawikê min tê ji Kurdistanê,  
Qeme-qirme wê li piştê.

X        X        X

Pezê gede-lawikê min gişkî hogeçe,  
Li zozanê Kelbecerê, Laçinê diçe.  
Minê koma bav-biran şerm nekira,  
Bida gede-lawikê xwe deste kincê buxçe.

Dewatîya navê Kurdistanê, Kelbecer û Laçinê bihîstînê biçûk-mezin rabûne şipîya, çepik ser çepikan lêdan, piyêñ xwe erdê xistin. Jineke navsere qîriya:

-Ez heyrana nav-dengê teme! Yekê-duda jî bêje!  
Hemû cîyêñ xwe da rûniştin.

Gişkan çavêñ xwe kutabûne min. Min berê xwe da zava:

-Xorto, ezê ser xatirê dayîka ku kanîyarî min bûye,  
ji dilê te, çawa dibên, bi zarave te dilokekê jî bêjim:

-Keçikê qurban, çiyayê Agirîyê bi şaxe,  
Lê diçêre mîya mala bavê mine kale-yaxe,  
Par vî çaxî qelendê keleş-kawa min tune bû,  
Îsal pêra min daye sed kavirê poz bi daxe.

Pey van dilokanra dîsa çepik ser minda barandin.  
Ez bi dengekî bilind berbirî wan bûm:

-Xwedê bê hewarîya we û we biparêze! Bihêlin ez  
nêta xwe bi dawî bikim.

Dengê cuda-cuda hatebihîstinê:

-Keko, keremkin! Ez benî bêjin! Mamoste, qalkin!  
Welleh, her gotineke te ji dilê me xeber dide!

-Min nedine şermê! Ez xulamê gelê xweme!  
Xwedê tu mirovekî bê gel meke, bê pişt meke!

Min ew jî nijand, wekî çiqil-beşekî zargotina me  
ew kilam-stran, miqam-awaz, qam, bi tomerî  
sazbendîya meye! İro, vê şayîyê da Sîyabendê Xelîl  
miqamekî pey yê dinê lêdide, yek-yekekî nawekilîne.  
Ew ne dehin, ne sedin...

Bi dehan mirov destêñ hev digirin, dikevine  
govend-dilanê, direqisin, dêmxwêş dibil, bi xwînkel  
dibil! Lê gava dengbêj-stranbêj, kilaman, strana  
dibêje, distirê rewşa rojêñ buhurî tê ber çavêñ  
mirovanra derbaz dibe. Ji ber ku ewana derbarê hub-  
hizkirinêda, derbarê erf-edetda, derbarê mîrxasîyê,  
serhildanê, derbarê zulma neyarê medanîn! Van  
gişkara dibên dîrok. Dîroka me jî bi sîyanete!

Ahmedê Hepo -----

Min avek xwest. Av vexwer. Min tê derxist, ku  
gişk bê sebir hîviya giliyên dawîyêne.

-Mirovên birêz,-min dûmayîn da axavtina xwe, -ev  
her sê nêtên min-şerkarî, bi hevra mîrkirin-zewaca  
keç-xortêñ me, yek jî zargotîna me, taybetî, kilam-  
stran-sazbendîya me her dem, her gav, dewir bi dewir  
ruh daye ber ruhêñ me, bawerîya siba ges tijî hiş-  
sewdayê me kirîyê û nehiştîye em ber bindestîyê,  
zordestîyê, koletîyê, bê heqîyê bimelisin.

Na! Çiqası neyar êrişî ser me kirîye, me dala zêde  
serê xwe bilind kirîye, me dala zêde dîlana xwe  
girtîye, bûye şinge-şinga dayîk-keç-bûkêñ me, bûye  
hole-hola bav-biran-cîwan-xortêñ me, daha jî bi  
şidiyayî reqisîne, bi dehan, bi sedan kilam hevanîne,  
bûyer efrandine. Lema jî iro berxwedan, serketin,  
serbindayî bûye para me!

Germaya hewayê, bîn-buxsa 200-250 mirovî tev  
hev bibû. Mirovan nikaribû bîna xwe bikişîne, te tirê  
tîrêjêñ tavê xime qul-qulî kirîye, xwe avîtine hundur.  
Min dîsa avek xwest. Xortekî bejin bilind dewê sar da  
min. Dew ruh da ruhê min, bîn hate ber bîna min û hê  
bi dengekî zelal qal kir:

-Xanim û maqûlno, min biborînin. Germê li min  
zorkirîye. Dawîyêda hîvî dikim bila zava û bûk  
destê hev bigirin bêne bal min. Xeleteke biçûk heye  
ezê wêya bidime wana.

Vê gotina minra bûk û zava mîna çiyakî ji cîyêñ  
xwe rabûn, dest dane destê hev û mîna du kevotka  
ber bi min hatin. Ez jî pêş wanava çûm. Em gîhîstîne

Ahmedê Hepo -----  
himberî hev sekinîn. Min rûyê zavê maçkir, hatime  
enîya bûkê. Berê xwe da beştarbûya:

-Xwedê sîya xwe bavêje ser van cîwana, wana bi  
per-baske. Bila ewana bifirine ser çiyayên welatê  
xwe, ji wir dakebine ser kanî-çeman, li merg-çîmena  
bigerin, herine ser tirbêñ şehîdan! Li wira, çawa min,  
helbesta xweye vekirî-rastsereda, ya bi navê «Rabe  
delala min»-da gotîye: «Hevala min rabe! Rabe, ez û  
tu bi hoşerîyêva ji pênc tilîya yekê jêkin û bila xwîna  
me tevî hevbe û mînanî xwîna qurbanê enîya hevdin».

Naha destûrê bidin pirtûka xweye nûh, ya bi navê  
«Hêsirê xwînê» çawa xelat bidime we herdu  
maşoqan, herdu kulîlkan.

Vê gavê ji alîyê rastê dengê zerfîkê li min tesele bû:

-Mamoste, gelî cimaetê, min bibaxşînin, ezê  
tiştekî bêjim.

Min jî, hineke mayîn jî hevra-hevra got:

-Keremkin!

Ewa yeke bejin bilinde qemer bû. Bi kofî-kitan bû.

-Ahmedê bira, min hetanî dersxana 8-a xwendîyc.  
Sala 1988-a gava ermenîya bere me da, em hatine  
Azerbaycanê. 1995-a jî me barkire Krasnodarê.

Min carekê li Bakûyê, bi radioya kurdî ew şêîra te  
bihîstîye, ez û xwesîya xwe tevayî girîyane. Eger ew  
şêîr wê kitêba destê teda heye, tu bi xwe ewê bixûne.  
Çawa xûşkek, çawa wêlîk ji te hîvî dikim.

Seqirtîyê usa xime hingavtibû, her tenê dengê  
zarokêñ derva dihatine bihîstinê.

Ahmedê Hepo -----

-Xûşkê, -ez berbirî wê bûm, -pirr şame, wekî we usa got. Lê ew ne şêîr- helbeste, ewa helbesta rastsereye. Belê, ewa vê pirtûkêda jî hatîye weşandinê. Lê bi zanebûna min, ne cîye ez ewê sarensen bixûnim, wede...

Du-sê xortan hevra-hevra deng dane dengê hev!

-Wede heye, tiştek nabe, bixûne!

Serdewatî hat nikî min sekinî û bi dengekî hukumdar gote min:

-Mamoste, em tu dereda lez nakebin, wede heye!  
Kitêbê veke wê serpêhatîya xwe bixûne.

Hineka destêن xwe hev xistin, hineka kirine fîte-fit.

Min bi ken berê xwe da hemûya:

-Biborînin, min tiştek fem nekir. Hineka çepik lêdan, hineka fitik. Ewanê fîtik lêdayî dixwezin bêjin:-Na, ne pêwîste, nexûne!

Xortek ji cîyê xwe rabû û berbi min hat, xwest bê destê min, min nehîst, ewî got:

-Kek Ahmed, nivîskarê delal, ez timê hewcî xwendina serpêhatîye te bûme. Yê fît lêdayî yek jî ez bûm. Ew fita şabûnê, ya hîvîkirinê bû.

Dîsa seqirîyê xime hingavat. Min pirtûka «Hêşirên xwînê» da destêن xwe û rûpêlê 23-a vekir.

-Rabe delala min, -min dest bi xwendina wê kir,-berbange, delala min rabe! Rabe, destê xwe bide destê min, em herine serê çiyayêن meye here bilind, ji wir kulîlkêن reng bi reng, qiravîya sibê hê li sere, deste bikin û vê berbangê bibin daynîne ser tirbêن mîrxasên

Kurdistanê. Ne dibên, ewana hema rojeke ha mînanî refen qulingan li hev ketin, mil kutane milê hev, piş kutane pişta hev kal-pîr, dê-bav, xûşk-bira, keç-kur, hizkirî hîştine û çek hildane, ketine rîya here dijwar, wekî zarêن biçûke hêleçanêra ken bînin û li hebûn, bedewîya Kurdistana xwe bibine xudan. Ewana çûn, wekî nehêlin welat têkebe bin bandora xêrnexaza. Ewana çûn, wekî dujmin nebe xudanê keça kezî.

Hizkirîya min, rabe! Rabe, gelo tu zanî, wekî carana bedewî li serêن keçan dibe bela? Tu zanî, wekî bedewîya Welatê me çi bi çîye? Were tera yeko-yeko bêjim, pêda-pêda qalkim. Çiyayêن wêye usa hene, bilind-bilindin, serê wan digihîje erşê esmana, salê danzdeh meha bi berf û qeşaye. Çiyayêن wêye usa hene, bi neft, komire, bi zêr-zîve, xasîme, hwdin. Çemêن wêye usa hene, wekî ji vî welatî dest pêdibe heylo dikişe, digihîje wenatekî mayîn.

Daristanêن wêye usa hene pêda-pêda xalî-xaliçene. Daristanêن wêye usa hene rewşa wana terewil, heywanêن kûvîyê nav bi navin.

Deşt, zozanêن wêye usa hene merî li ser heyr-hejmekar dimîne. Li deşta pembû, ceh, genim, birinc, birince kilûr-klûrîye. Li zozanan kerîyê pêz, garana dêwêr, revoyê hespan sed bi sed, hezar bi hezarin.

Rindika min, rabe! Rabe, çi ku min go ew hindik-hindike. Ay, ev rindayî, ev bedewî û ev dewlemendî bûye bela serê Welatê me. Kî bi çavneberî Welatê me dînihêre kelem çavanra here, dest, pê lê qopbe.

Gulizera min, rabe! Bahare, bahare! Her dera berf heliyaye, avê çeman gur bûye, quling ji Berîyê hatine. Rabe, em ji qulingan bipirsin, ka binê kulfîkên bi bîn çawa serê xwe ji ser tîrbêñ şêrêñ kurdan hildidin.

Horîya min, rabe! Bahare, xwes bahare. Rabe, em vê baharê agirê dilê xwe, hizkirina xwe mîrxasê kurdanra bişînin, ku mînanî pilingan ketine şêr, ketine dew-dozê, dewa rastgelekê dikin, wekî destûra xort û keçen Kurdistanê jî hebe bi zimanê dê nama hevra bişînin, dilê xwe ber hevdu vekin, sura evîntîya xwe li hev bihesînin. Destûr hebe li dewata govend bê girtînê, kilam bi kurdî yek pey yekê bê stirandinê. Destûr hebe li şîna kilamên şînê bi kurdî bê gotinê. Destûr hebe kurd xwe bibe xudanê hebûna Welate li ser erdê û bin erdê. Destûr hebe li meclîsên dun-yayêye bilinda dengê kurdan jî bê bihîstinê.

Hevala min, rabe! Rabe, ez û tu bi hoşerîyêva ji pênc tilîya yekê jêkin û bila xwîna me tevî hevbe û mînanî xwîna qurbanê enîya hevdin. Bi vê xwînê sond buxun, bi sedan, bi hezaran lawêñ me amade bikin û heta dilopê xwîn dilê meda hebe, boy axa Welat şerkin û nehêlin dujmin ji lana xwe derê. Nehêlin dayîk hêsisran birêjin.

Rabe, min gorî ! Îdî sibeye...

S. 1966.

Dawîyêda min serê xwe bilind kir û ser xwendina xwe da zêde kir:

Ahmedê Hepo -----

-Sala, 1966-a! Yanê ku ew sala 1966-a hatîye nivîsarê.

Nişkêva bû hewêrze. Bû qîre-qîr, hewar-qazîya beştarbûya:

-Tu her bijî! Xwedê qelema te tujke!

Nava van xwestina da min dengê girî jî bihîst. Bona mirovên li şayîyê ji vê rewşê derxin, min got:

-Siyabendê birazîya,bihêle ez vê pirtûka xweye nûh bidime herdu mirazhiza, paşê miqamekî giran-«Kofi»-yê, wê şûnda miqamê «Laçinê» lêde, em dilaneke şen bigirin, bixingirin.

Ez dîsa hatime rûyê herdu kevotka-bûk û zavê û min pirtûka xwe da wana û bere xwe da dewatîyan:

-Min ser pirtûkê ev gilî-gotin nivîsîne: «Bûk-zavê hêja! Îroda cêhêzê bûkê wê tevî kelmelê malbeta zavêbe! Hûn wî cihêzî ne ku, li vira kewinkin, biri-zînin, bişkînin, lê welatê xwe-Kurdistanê. Mêbêlê, ku bûkê ji mala bavê xwe anîye bavêjine vê gola rex mala we û herin mîbêla bi duruşma «Kurdistanê» bistînin, dubare şabin. Wekî usabe, ew derd-kul, xwestina pirtûkêda nivîsî wê bêne dermankirinê, birîna minê bê melhem kirinê».

Pey vê yekê min da zanînê, wekî Siyabendo, birao, lêde, guje-gujê bide zurnê.

Siyabendê Xellîl xwest zurnê bide ser lêvên xwe lêde, wêda mirovekî 40-45 salî, bi berçavk, serxwe, cindî hat rex min sekînî û got:

-Mamoste, biborîne mîkrafonê bide min.

Ahmedê Hepo -----

Ewî mîkrafon ji destê min girt û bi dengekî xweşik berê xwe da min:

-Mamoste, bona vê axavtinê pir spas. Biborîne, sed car biborîne, ezê pirsekê bidime te.

-Bidin.

-Bona we ziman çîye? Hîvî dikim, ci ku ulumdaran, zimanzana derbarê zimanda gotine, ez jî kêm-zêde zanim. Ez dixwezim bizanibim bona we, çawa kurd, çawa nivîskar ziman çîye?

Ewî careke mayîn mîkrafon da min û çû ciyê xweda rûnîst. Ez êmekê-duda ketime ramana, çawa dibêñ, min hemû kes, yeko-yeko mêze kir. Seqirtîke usa der-dor hingavtibû, te qey digot ne dewate, lê çivîneke girane, wê li vira pirseke usa bê enenekirinê, te tirê ewa çarenûsa her kesîra girêdaye.

Min qe nizanibû ji ci destpêkim, çawa bêjim. Min xwe serhevda çivand û weşekî şûnda karnîyarî dewatîyan bûm:

-Melhema dilê mirovan yek jî zimanê. Bona me kurdan ew dubare, sêbare dermane. Eva çendî-çend salin dilê me birîndare, ruhê me hey tê êşandinê, guvaştinê. Lê melhema dilê me, hêmînbûn-hêsabûna dilê me ew zimanê dê bûye. Mirov çiqasî zimanê dinê bizanibe, bi axive, bi gorîya, min ew nikare hesta xwe cî bîne. Bila ulmê bijîjkê min biborîne, xwîna mirovan ji nava zimanê wîra, gilî-gotinê, ku tîne ser zaranra derbaz dibe, ten-bedena wî dide ber hêzan, dide jîyanê.

Mirovê ber mirinê pêşîyê zimanê wî tê girtinê, nikare biaxive, xwîn reh-deremada dicemide, dibe telte-telte, hê ruh dêvra dertê, yê usara dibêñ mirî. Yê ku zimanê dayîka xwe nizane ew ne zindîye, lê mirîye. Me kurdanra, çawa şerkarîya bona azaya Kurdistanê pêwîste, usa jî dew-doza bona zimîn, parastin, yekîtiya zimîn pirr ferze.

Gofî helbestvan, nivîskar, ulmdar, rewşenbîr, karkarêñ çapamenîyê bibine kanê dewlemendîya zimîn, parêzgehê zimîn.

Vira min hinekî navbirî da axavtina xwe û awa nêta xwe xilazkir;

-Cuda, bona min ziman şîrê dêye. Çima gotine şîrê dê, zimanê dê! Ji ber ku ew herdu ji xwîn-xinava mirovan têñ, ji ber ku ew herdu jî, ji her tiştî zelalin, paqîşin, şêlibûnê, qelptîyê hilnadine ser xwe.

Min elbêra çavkire Sîyabendê Xelîl, wekî destpêke. Guje-guja zurna Sîyabendê Xelîl, ringerringa dihol lêdayî bi carekêva rewşa heyî guhast, Ez ketime sergovendê û bi dehan mirovan destêñ hev girtin û nava çend deqîqada govend fire bû û fitil-fitil, govek-govek çû, hat. Ez zû westîyam û desmala destê xwe da mirovê tilîya min girtî û ji govendê derketim.

Min xwe da ber ximeyê, hinekî hewake xweş hate min. Xwîdana enîya xwe paqîşkir û xast vegerime govendê, axavtina bi rûsî hate guhê min. Ez berbî alîyê, ku deng dihat, çûm. Min nihêri 10-15 xortêñ 15-17 salî şirîn-şirîn rûsî diaxivin.

Min bi rengê wana tê derxist, wekî ewana zarêñ kurdanîn û lema pirsî:

-Lawno, lê çîma hûn hevra rûsî diaxivin?

Yekî jarikî dirêj qure-qure qulapek-dudu papîrosa ser lêvên xwe xist, paşê ew wêda avît, got:

-Nava meda yekî rûs heye !

Vê weşê nuqutî dilê min, wekî «wedekî usa wê bê, 10-15 cîwanêñ ne tewîyêñ dinê beravî cîkîbin, nava wanada wê tenê ewledekî kurdan hebe, ewana gişkê bi kurdî biaxivin»

Lê vira ez pirr qeliyam. Min ew yek tê derxist, ku ji van xortan hinekan neşe, narkotîk kişandine. Rengê wanra jî ew yek dihate kivşê.

Heylo, gerdûna gewrikê! Te çi ne anî serê vî gelê mîrxas, merd, nandar, yê ku xwedanê erf-edetê paqişe. Ev gel ewqasî ji hev qetîyaye, bela-bela bûye, ji her gelê cî tiştekî qenc-pûç hildaye. Dibêñ, yê ku dixweze rêçûna yekî dinê rê here, rêçûna xwe jî şas dike.

Dewatê hetanî şev ji şevê derbaz bûnê kişand.

x x x

No, drûg moy,  
Têrnîst naş pût!  
Şêkspîr.

Êvarda ez û Farizê kurê helbestvan Ûsivê Feqî Evdile pevketibûn sibê zehmet bikişîne û min bi maşîna xweva bibe «Mala kurdan», mala birazîyê min Torinê Pervan, mala dost-hogirê minî cîwantîyê Sûrgûnê Bala, yek jî bibe «Merzelê kurdan,» wekî tirba qewm-lêziman, dost-hevalan, nasan zîyaret kim.

Digotin ev her çar cîyên, ku min dixwest serîkî lêdim, 120-150 km dûrî bajarê Krasnodarêne.

Gotî em zû ji mal derketina, wekî hetanî êvarê li wan ciyan biqesîdîyam, meremê xwe cî banîya.

Sibe zûva ron bibû, me taştê jî kiribû, lê Fariz hê nehatibû. Her weş, her hûrdem ez ber xwe diketim.

Wedê karşandînoka (komandîrovka) min jî rojekê şûnda xitim dibû. Lê pirsa sereke ne ew bû. Pirs di wê yekêda bû bernama radîoyê, ya bi zimanê kurdî, hîviya hevalekî ji Laçinê Fexreddînê Muzeffeर mabû. Ew hevtêkê zêde bû ez ji mal, Bakûyê derketibûm.

Ez nava bera mitala da bûm. Tûte-tûta maşina ku derê malê sekinî ez ji wan dûrxistim.

Ew Fariz bû. Pey sibe xêriyêra bi besereke xweş got:

-Mamoste, biborîne, hinekî derengî ketime. Sedem jî ew bû, wekî min zar biye mektebê.

-Tişt nabe,-min gotê, -her bila roj bi xêr-xaşî bê ser mera derbazbe!

Ahmedê Hepo -----

-Keko, keremkin, maşînê siyarbin, emê rîwîyê bikin, ya sereke ewe em ji mal derên, wê wêda dayîna xwedê mezine.

-Belê, birao, usane, lê gotineke dramatûrg-helbestvanê Îngîlîsayî dunêeyan, ya Şêkspîr Ûîlyam kete bîra min. Ewî gotîye:

-No, drûg moy,  
Têrnîst naş pût.

Bi kurdî ew nêt ahaye:

De, hogirê min,  
Rîya me bi keleme.

Erê, lawo, te tirê ew herdu rêz bona me hatîye hevanînê. Rîya me, rîya her kurdekî, timê giran, dijwar, bi êş, bi zêrandin, bi kelem-dirî bûye! Delalo, maşînê bajo, ka binê rîya me li kêderê asê dibe, ro li kêderê li me diçe ava.

Em çend mêttran ji malê dûrkentinê Fariz berbirî min bû:

-Mamoste, pêşiyê em herin zindîya zîyaretkin, yanê yên dunya xwe guhastî?

Vê qasê bûyerek hate hişê min. Dibêن ji Behlûl Danende dipirsin:

-Vê dunyayêda zindî gellekin, yanê mirî?  
Ew dibê:

Ahmedê Hepo -----

-Mirî. Ji ber ku, yên zindî jî wê zû, yanê dereng bimirin.

Lema were em pêşiyê herin mala axiretê serdan kin.

-Daha baş. Mala Sûrgûnê dostê te û «Merzelê kurdan» ser rêkêye. Qe nerehet nebe, ezê îro xwestina te bînime sérî. Rîya van dera zef pakin, mîna kefa destêni mirovanin.

-De birao, bajo mera oxirbe!

-Xweş dibêjî, bila em bibine hevalê oxira qenc.

Êmê çend deqîqa şûnda Fariz berê xwe da min û pirsî:

-Apê Ahmed, biborîne ezê pirsekê ji te bikim?

-Pirske!

-Min dixwest bizanbûya tû ku, Sûrgûn ku? Zanebûna ez zanim ewî tev we nexwendîye, qe mekteba navîn jî xilaz nekirîye.

-Na, Sûrgûn tevî min nexwendîye. Wan salan, xêni ji min gellek ewledên Kurdan-Hesenê Rizgo, Barîyê Bala, Tosinê Reşîd, Mecîdê Elî, Tîtalê Teyfûr, Egîtê Çerkez, Filîtê Rizgo, Wezîrê Xano, Barîyê Mehîmûd, Teyfûrê Hesen, Egîtê Ahmed û yên mayîn înstîtûtêda dixwendin. Paşê, jîyanêda her yek wan bûne bilindaya gelê xwe. Lêbelê, ewê bêjim, lawo, her tişt bi xwendinê nayê pîvandinê. Sûrgûn zanîgeha jîyanê, ya here bilindra derbaz bûye. Eva yek. Ya duda salênu min înstîtûtêda dixwend malekêda kirê dimam. Sûrgûn jî ewledê wê malêra hevaltî dikir. Minra jî bû nas. Dostîya me hev girt.

Rêva ezê qewmandineke ku, hatîye serê min û Sûrgûn tera qalkim. Naha, ew bibhîze ez hatime vira, wî nebînim wê ji min bixeyde. Gotî mirov nan-xoya xwerî bîrmeke.

Yek jî eva çend sale hey hatî-çûyara dibê, bila ew bê Krasnodarê û bi destê xwe romana xwe «Birînê» bide min. Min jêra ew pirtûk anîye û dixwezim, bi destê xwe bidime wî.

Hêdî-hêdî bajarê Krasnodarê parava dima. Em ketibûne rêke bere raste-rast. Car-caran maşînan rex mera, pêşberî mera dikirine vizeviz diçûn, ji me derbaz dibûn. Tavê dizeriqand, tirêjên wê ser şûşen pêşberî maşînê direqisîn, me hey çavêن xwe diqirpand.

-Farizo, delalo, -min gote wî, -ya pak ewe ez pirekê têkime rê.

-Wê xweşbe! Lê ez hîvî dikim, do li mala me we derbarê herfê meye latinîda axivî. Lê mêvana, têlêfona destâ nehîştin ez rind guh bidime we. Kerema xwe derbarê Bedirxanda ci zanîn qalkin?

-Keko, te berê min da çiyakî dunyayêyî herî bilind. Ezê bicedînim hetanî berojê cîyayê destnegihîştî herim, ci zanim, ci derheqa wîda xwendîye kurt bêjim.

Tu dibêjî ez pêşberî deste ulumdarên naveyan sekinîme û ewana ji min pirs-hewala dikan. Xwe serhevda civand û berê xwe da xort-zilamê delal:

-Xorto, rind bizanibe malbeta Bedirxanîya bûne kuling lêdayê dîrok, wêje û ziman zanîya gelê kurd.

Ahmedê Hepo -----

Lê wekî bi tomerî bêjim ew bûne xemildarêñ çanda me.

Silsileta Berdirxanîyaji Cizîra Botanin. Serpêhatîya vê malê-malbetê dirêj, kûr û bi sîyanete.

Celadet Bedirxan li Îstanbulê tê dunê. Tiştekî ecêb dest dide. Roja bûyîna wî mîzginîyê didine bavê wî:

-Çavêñ te ron, tera kurek bû!

Bav şadibe. Lê şabûna wî gellekî nakişîne, qasek derbaz dibe tên bavê wîra dibêjin, kure te mir. Ew posîde dibe û dibê:

-Zarokê bibine ser bîra hewşa malê bişon û bibin merzel binaxkin.

Gava zarokê tînîne ser bîra avê û şelbike av lêdikin, ew dike îske-îsk, digirî. Şayî tevî şayîyê dibe.

Celadet Bedirxan li Îstanbulê xwendina navîn xitim dike. Ezê ji jîyana Celadet Bedirxan çend benda, çend rêza bînime ser zara. Rehma Xwedê li wîbe, cîyê wî cinetîbe! Koraya wî, ewî pêncî yek salan jîyan derbaz kirîye.

Dibêñ, pey mekteba navînra diçe eskerîyê. Ew tevî leşkerê tirka tê dertê Bakûyê. Hinek jî dinivîsîn ew bona xwendina bilînd tê Azerbaycanê. Lê qewmandin usa li hev dialin, neheqîyên usa têne serê vê malbetê, wekî herek alîkîda diçe. Celadet Bedirxan û birê wî Kamran diçine Almanîyayê. Wira ewana dixûnin, xwendina bilind distînin.

Sala 1930 Celadet Bedirxan tê bajarê Şamê, du sala şûnda destpê dike kovara «Hewar»-ê dide we-

Ahmedê Hepo -----

şandinê. «Hewar»-ê cara yeken bi tîpêñ latinî ya bona Kurdan, dide berdanê.

Ew salêñ dirêj ser Elîsbaya kurdî, ya tipêñ latinî karê dike. Ew herfê ûro, ku em kurd pê dînivîsin, kara behrê Celadet Bedirxane, ûro gellekî hêsaye mirov dibê Celadet Badirxan elîfba amade kirîye. Ewî xêñî ji zimanê dê, Fransî, Îngîlîsî, Almanî, Tirkî, Erebî, Farsî û Yûnanî zanibûye.

Dawîya jîyana Celadet Bedirxan daha bi zelûlî, belengazî, hejarî tê derbaz kiranê.

Rojekê ew diçe bal begekî kurd û hîvî dike, wekî ew hine erd bide wî, ew pembû bireşîne.

Axa nana nake û êpêce erd-ax dide wî. Bona erdê avde ew bîreke avê dide lêdanê, kolandinê. Av dertê, ew şadibe. Êvar bûye, çêkerê çerxêneka bîkolandinê dibê:

-Keko, idî derenge, were em herine mal.

Celadet Bedirxan dibê:

-Na, tu here, ezê hinekî rûnêm, guh bidime xwuşa-xwuşa avê.

Çêker diçe, sibê têñ dinihêrin Celadet Bedirxan ketîye bîrê û çûye ser heqîyan xwe, kes nizane çawa bûye, lê dinihêrin kincê wî çerxênekê alîyaye.

Vê weşê min nihêrî Farizê Ûsiv maşîn ajote kevîya rê û da xayîkirînê. Em ji maşînê peya bûn, çavêñ xortê delal tijî hêşir bibûn û got:

-Kul têkeve mala me, ka em xwe nas dikin?

Pey wan giliyaran ew mîna zara sêwîye ber dîwêr quncılı ser hev, lê paşê mîna şerekî birîndar rabû ser

Ahmedê Hepo -

xwe, der-dorê xwe mêze kir, kevir-berdekî mezinî giran ji maşînê wêdatir hebû, xar bû, dest avîtê ew ji cî leqand, hilbirî ser serê xwera avît:

-Bila neyarê me bizandibin, ewana çiqasî giran bin, emê rojekê wana awa mîna vî tetî ser xwera bavêjin.

Ez ber dilê wîda hatim. Bîna wî hatê ber wî, min dîsa dûmayîn da axavtina xwe:

-Fariz lawo, bizanibe derbarê vî çiravêxistîyê gelê meda gellek gotarên ulmî hatine nivîsarê, lêkolîn hatine kîrinê, lê nivîskarê meyî hêja Mehmed Ûzûn derheqa rîya jîyana Celadet Bedirxanda romana bi navê «Bîra qederê» nivîsiye.

Ew pirtûk têkebe destê te bixûne. Nivîskar dînîvîse, wekî Celadet li ser bîrê hate dunê, bîrêda jî dunya xwe guhast.

Fariz bi desmala destava xwîdana enîya xwe paqîş kir û kesereke giranva got:

-Apê Ahmed, zef spas, ber nivîskar Mehmed Ûzûn temene dibim, bila cîyê Celadet Bedirxan jî cinetîbe. Ew ne mirîye, yê mirî ewe boy gelê xwe tiştekî nake. De, rîwîyo, di rêda.

Ew derbaz bû, maşînê sîyar bû, girgirik da wê û em dîsa rîketin. Me ker û lal rîya xwe didomand. Bona me ne deng hebû, ne hes. Me hewdizanibû, em li qir-qodekîne, li der-doran tiştek tune. Kîlo mîtr ser kîlômêtreda qat dibû, dihat. Fariz seqirtî teriband:

-Mamoste, te meseleke usa minra got, hetanî zindîbim bîra min naçe. Lê min tiştek dixwast

Ahmedê Hepo

bizanbûya, qe kovara «Hewar»-ê ketîye destê we? We ew xwendîye?

-Xorto, ne ku ew kover ketîye destê min, ne ku min ew xwendîye, lê «Hewar» mîna pirtûkeke bi pîroz, çawa tiberik timê ser pêşxwîna mine. Xwedê alîkarê alîkarabe xênî ji çend hejmarêن wê, hemû hejmarêن dinê destanîne, mîna pirtûkekê sala 1976-a li Bêrlînê dane weşandin.

-Şukur, -Fariz bi beşereke xweş got, -em ne bê xweyînin.

Paşê ser axavtina xweda zêde kir:

-Hê épêce rîya me heye, keremke qewmandinekê jî bêje.

-Farizo lawo, qewmandinê vê dunya gewrik bê jîmarin. Bûyerê derbarê gelê meda jî ne hindikin. Yekê jî bêjim.

-Bêje, keko! Ez zûva hewcî zarê şirîn, birçiyê tiştên hewaskarim.

-Go, şevekê, şev nîvî bibû, derê malekê hate kutanê. Xwedenê malê rabû derî vekir. Nihêrî mirovekî bejin nîvce ber dêrî sekiniye.

Ewî got:

-Dayîka pîrê, ez rîwîyê rîya dûrim. Min hey mîze kir vî gundiда her tenê çira mala te dişuxulî. Min xwe-xwera got:

-Ya qenc ewe berê xwe bidime ronahîyê. Dikarî îşev min mîvan xayîkî?

-Belê, , mîvan mîvanê Xwedêye.

Mêvan derbazî hundur bû. Ji sérî hetanî pîya pîrê mîze kir. Porê sipî, qerçimekên destan, dêman, bejina ser hevda qat bûyî şedetîya wê yekê dida, ku temenan wê yanê dirêje, yanê jî jîyana wê nava zelûlîyê, tengasîyêda derbaz bûye. Çavên xwe navmalê gerandinê, ne çav stêr ket, ne kelmelê mayîn. Her tenê palazeke qul-qulîyê erdê raxistî, kuncê malêda elbek, beroşeke biçük bala wî kişande ser xwe.

Pîrê dît mêvan zûrbûye maye gote wî:

-Mêvano, derbazbe rûnê! Ez jî Xwedê ci daye hazirkim.

Qe kirtinî ber mîvîn neket, çû ser palazê, pîyên xwe ber hevra kir rûnişt.

Pîrê çû agirê bixêriyê vêxist, pişta xwe da mîvîn, ci kir, ne kir, beroş danî ser bistê. Demek derbaz bû, anî destexaneke kevin ber mîvîn raxist, nanekî ceh anî, danî ser destexanê û çû devê beroşê vekir lê nihêrî, paşê beroş danî erdê. Şerbik beroşêda kir, anî danî ber mîvîn. Şerbikekî dinê jî beroşêda kir, anî danî ser destexanê. Wê lezê derkete derva tawtawek jî anî danî kîleka xwe, ber destê rastê û kîlimî:

-Mêvano, tu ser sera, ser çavan hatî. Bisimillahke, serê nîn jêke, nîn buxwe!

Mîvîn nihêrî şerbikda ava kelandîye. Ewî qe tiştek ne got, şûrê xwe kişand danî kîla xweye rastê, bisimillah kir, nan hilda nîvî kir, nîvî da ber pîrê, nîvî da ber xwe. Wana şîrîn-şîrîn nan xwerin, ava germ serda vexwerin, elhemdullah kirin. Pîrê rabû

Ahmedê Hepo -  
destexan berav kir, balgîyê ber serê xwe da mîvan û  
got:

-Keremke, razê!

Mêvîn qe tiştek ne anî ser zara û balgî danî ber serê  
xwe velezîya.

Destê berbangê pîrê rabû bixêrî vêxist, beroş da  
ser. Mîvan rabû derkete derva, serçavêن xwe şûşt, hat  
nihêrî pîrê mîna şeva derbaz bûyî destexan raxistîye,  
tawtaw jî danîye rex xwe.

Mêvîn jî kirina şevê wekiland. Nan xwerin, av  
vexwerin, mîvîn rabû qayîlbûna xwe da pîrê:

-Dayîka pîrê, malî ava, me kêm kir, Xwedê  
zêdeke. Lê ezê pirsekê bidime te.

Go:

-Keremke!

-Bêje min binê ew ci tawtaw bû te him şev, him vê  
sibê anî danî rex xwe.

Go:

-Lê te çima şûrê xwe derxist danî kêleka xwe.

-Dayîka pîrê, mala teda ci hebû, ci Xwedê dabû te  
anî danî ser destexanê. Nişkêva te bigota mîvano,  
biborîne, ji vê zêdetir tiştekî min tune, minê bi şûr  
serê te lêda.

Pîrê jî go:

-Wekî te nan nexwera û bigota ev çîye, minê bi  
tawtawê serê te bişkênanda!

Mîvan xar bû û hate enîya pîrê û xwest dêrî veke  
derê derva, dengê hîre-hîra hespekî hat.

## Ahmedê Hepo

Pîrê jî mîvînra derketa derva, nihêrî kihêlekî hêşînîboz, bi zînkirî, bi heyte-hol, hinekî şêmîkê wêda sekinîye. Ewî sîyarê xwe dîtinê herdu guhêñ xwe bel kirin, herdu pîyêñ pêşiyêva erd kola. Mêvan nêzîkî wî bû, gema wî girt û pîyê xwe kire zengûyê û şêrewazî quloz bû, sîyar bû.

Pîrê dora xwe nihêrî, dît welleh-billeh ewqas sîyar rex hev, rex hev sekinîne, tu derziyê bavêjî ser serê wan, erdê nakeve.

Mêvanê pîrê kihêl sîyar bû, gema wî kişand. Kihêl rabû ser herdu pîyêñ xweye paşin, usa kire hîre-hîr, te tirê erd-esman hejîya û pîrê jî hew zanibû sîyar fîrî ersê esmin.

Mêvanê pîrê gavekê-duda hesp berbî pîrê ajot û bi dengekî zîz got:

-Dayîka pîrê, dîsa dibêjim malî ava, him jî bizanibe ez Selaheddîn Eyyûbîme.

Pîrê jî hewal da:

-Here tera oxirbe! Lê bîrneke, te mera hê tiştek nekirîye!

Selaheddîn Eyyûbî vê gavê dest avîte berîya xwe, kîse zêr avîte ber pîyê pîrê û hêşînboz zengû kir.

Toz-xubara ber pîye hespê koxtikê pîrê hingavt. Hetanî dû-dûman kişiya pîrê mîrxasê mîrxasa mêze kir. Hê vejerî jorda hey kîsikê zêr têda nihêrî, ew ji erdê hilneda, devê xwe alîyê rîya sîyarê hespê hêşîn bozda kir û got:

-Te ez fem nekirim! Ewledo, Xwedê te şaş neke!

Ü hêdîka derî vekir, çû kete koxtikê xwe û ser palaza xweye kewin rûnişt, berê xwe da qulbê, destên xwe ber bi Xwedê kir, ber xweda kire piçe-piç, paşê bi dengekî bawerî got:

-Rîya kurdan, roja kurdan wê dûrbe, dirêjbe, lê wê bi serfinîyazbe!

Min vira xwe ker kir. Fariz dîsa berê xwe da min:

-Apê Ahmed, Xwedê zane emê careke mayîn rastî hev bêñ, yanê na? Ji pirsê min zivir nebe.

-Na! Çi dilê tera derbaz dibe pirske?

Fariz bi hewaskarîke mezin, bi rûken pirsî:

-Qe we jî mîna Mehmed Ûzûn derheqa zanîyar, mîrxasekî me da tiştek nivîsiye?

Min tê derxist ew çi dixweze bêje, vebîşîrîm û bersîva wî da:

-Belê, Fariz, lawo!

-Keko, heyrana teme, îro ez hetabê dunême, wekî yekî mîna tera bûme hevalê rîwîyê rê. We çi nivîsiye, derheqa kêda nivîsiye ewê bêje? Çawa we got, bila ew jî bibe pira rîya me.

-Farizo, delalo, min him romana « Birîn»- ê, him serhatik derbarê Mustafa Barzanîyê zindîda nivîsiye.

-Min, «Birîn» xwendîye, lê haj ya dinê tunenim.

-Ew serhatîke. Navê wê « Bijî, bijî Barzan»-î ye. De guh bidê kurt tera derbarê wê da qalkim.

Xwendevanêن hêja! Wira, rêda mîn ew serhatî Farizra qal kir, vê pirtûkêda jî, ewê radestî we dikim:

## BİJÎ, BİJÎ BARZANÎ

Gund li quntara çiyê cî-war bibû. Hinek avayêن malan usa hatibûne ava kîrinê te hewdizanibû ewana di nava zer, zinaran da necirandine. Zivistanê berfê danînê ser banêن xanîya, wekî dûyê tendûr, kuçik û bixêriyan qube-qube nekişîya erşê esmîn, mirovan têdernedixist li vira şenî henin.

Rê, dirbêن gund hişk-hola, bi kevir-kuçik bûn. Jêrva rêke xaro-maro hetanî pêşa gund dihat. Wê wêda bi dehan dirb,rêç ser hevra, ber hevra derbaz dibûn, diçûn digihîstne fêza gund. Xêni ji binelîyan tu kesî serederî ji wan der-doran derness. Ji derê her malekê şiverêk fitil-fitilî bibû, ber bi çiyayê fêza gund diçû. Tu hinekî diçûyî, berê te dikete bilindaya çiyê, idî tu bêgav dimayî, pêsta çûyîn ne dibû.

Alîyê çepê gelîyê kûrî mezin bû. Wî gelîra digotin gelîyê «Hêşîn», çawa lûtkên çiyayêن wan navberan salê danzdeh meha ji berfê sipî dikir, gelîyê «Hêşîn» ji çêre, pincar, belgên daran hey hêşîn, zer dikir. Dibêن,ji hemû quncikê dunê mirovên zanîyar, ulumdar hatine, çûne, lê ser sura vê ecêba xwezayê venekirine. Ew dera bajona heywanê gund bû. Nişkêva nenasek, nerêberek têketa wan şiverêyan hetanî quntara çiyê biçûya, careke mayîn dijwar bû, ew paşa vegere. Ew dixalifi.

Kal-pîrêن vî gundiye 80-100 salî qal dikirin, wekî pêşiyê wan gotine, ku rojekê sê mirov ji welatê

Avropayê hatine vira hînî ecêbê van derabin. Dibên, ewana ulumdarên Îngilîs bûne. Neh-deh rojan vira dimînin û hero rênasekîra çûne gelîyê «Hêşîn». Vira wana pincarê cuda-cuda, kevir-xişrê biçûk berav-kirine, ji çêm, kanîyan av hildane. Ulumdaran gotine, wekî kevirên viraye cuda-cuda li tu quncikê dunê tunene, ewana ji zêr hêjane, pincarê van newala dermanê hezar nexweşîyanin, avêhî timê mirovan cîwan dike...

Rojekê ulumdar dibên ku, idî em van dera nas dikin mera rînas ne pêwîste.

Payîz bûye. Ewana sibê ji mal derketinê hewa xweş bûye. Danê nivro ewir hev dikebin, dûmaneke sixte hevdigire, çav-çavan nabîne. Ewana dixwezin vegerine gund rê şâş dikin. Hey virda, wêda direvin, hey têr li zer, zinara asê dibin. Çend seheta şûnda dûman vedike, îcar jî tarî ketibûye erdê. Dîsa ewana nikarin rêkê bibînin ji wir derêن.

Gêlîda çend çêlek çêrîyabûne. Nişkêva dikebe hişê yekî wana û hevalê xwera dibêje:

-Warêñ em herine bal wan çêlekan. Ewanayê wedê xweda herine gund, emê jî wanra herin.

Ulumdar têne çem çêlekan. Lê çêlek xwera diçêrin, tarî jî qas-qas erdê hildiçîne dîsa ji wan ulumdar yek dibê:

-Warêñ herek me hêdîka boçika çêlekekê bigirin, ewê devê xwe çêre derxin û wê ber bi gund herin.

Ulumdar usa jî dikin. Pêşiyê çêlek ser-guhêñ xwe ba dikin, paşê dikebine pey hev, wana tînin derdixine

Ahmedê Hepo -----

gund. Sibetirê ulumdar binelîyê gund diçivînin û dlibejin:

-Em ji mîvanhizîya we, erf-edetê we pirr-pirr razîne. Yek jî heywanê vira ji hinek mirovên jorê rûniştî zêntirin. Ger zêna wana hebûya, li van çiya xwîn nedidane rêtinê, wê li hebûna vira bibûyana xayî, li mirovan jî bibûyana sitar!

Em vedigerine welatê xwe û emê derbarê we kurdan da tiştên baş, rastîyê binivîsin.

Şev nîvê şevê bû. Gund ketibû xewa şirîn. Ne deng bû, ne hes. Derê mala Şîho hate kutanê. Camerê Şîho wê weşê dest avîte kincêñ xwe zû-zû xukir û xwe-xwera got: «Xwedê xérke, vê şevê ew kîye? Qe ro, nava royê mirovê nenas, xerîb nikare rîya ji rîya bibijêre. Diqewime ew Rostoye? Na, naqewime ew usa zû venagere? Ewê çend rojan şûnda bê!» Rostemê kurê wî, ew sê roj bû, tevî pêşmergan çûbûn çend çekan bistînin.

Şîho ji bin stêr çeka xwe hilda hate ber dêrî û pirsî:

-Men hewe? (Ew kîye?).

Ewî bersîv bi kurdî bihîst

-Xalo, emin dêrî veke.

Şîho bê şik tê derxist, wekî hebe-tunebe, ewana pêşmergene û lema jî bi dilekî şa derî vekir. Sê kes hevra derbazî hundur bûn û şevxweşî dane xwedanê malê û pêşmergê bi navê Xoşnav got:

-Xalo, mîvana naxwezin?

-Ciyê mîvanenê mîna we ser sera, ser çavan heye, derbazî oda hanê bibin.

Ahmedê Hepo -----

Şîho awa bersiv da, kete pêşîya pêşmergan û ew birine oda jorîn.

Cî nîşanî wan da, ewana rûniştin, vê gavê jin jî, zarên malê jî hişîyar bûn. Bûkê- Rûkenê dest avîte misîn çay da ser, jinê tividîra destexanê kir.

Pêşmergan ev yek têderxistin û Xoşnav kîlimî:

-Tiştek ne pêwîste, çay hebe, emê çaykê vexwin.

Hema vê gavê kevanîya malê sê kas dew anî danî ber mîvana û xêr hatina wan kir.

-Ev dew ji her tiştî zêdetire, -pêşmergeyê bejinêda bilind xwe mukur hat, -emê dew vexwin, rabin hinekî çavê xwe bidine ser hev, rîya me dûre, emê berbangê herin.

Vê qasê kurikekî 7-8 salî ji ber derê odê pirsî:

-Kaliko, bavo jî tevî pêşmergan hatîye?

-Na, ewana dibêن, bavoyê sibê bê.

Pey vê gotina kalikra, kurik hat ber pêşmergan sekînî, herdu pîyên xwe da rex hev, destê xweyî rastê bilind kir, mîna eskerê fêr bûyî bi şidîyayî sekînî û berbirî wan bû:

-Bijî, bijî Barzanî!

Gişk rabûne ser pîya û hevra gotin:

-Bijî, bijî Barzanî!

Paşe kurik bi herdu tilîyên destê rastêva nîşana «Azayê» da kivşê. Pêşmerge kêfxwes bûn û hatine rûyê wî.

Bûkê wanra cî-nîvîn danî. Neferêن malê jî ker-lal çûne ciyê razanê. Di nava wedekî kinda xêni ji bûkê û kurikê wê-Roder gişk ketine xewa şirîn.

Ahmedê Hepo -----

Bi hatina pêşmergan qey bêjî, yekê anîbû telte qeşa kiribû ber dilê Rûkenê, çawa dibên, cîyê wêyî germ, sar kiribû, xew nedikete çavan. Raste, mîrê wêne pêşmerge bû, lê wanra têkilîyê wî hebû, bi ruh-sewdayê xweva her dem alîkarî dida wana. Eva du-sê roj bûn ew bi wanra çûbû bajêr, ewê qe nizanibû bona ci?

Alîyê dinêda kurik ser hev, ser hev pirs dida dayîkê. Ewê jî bi hemdê xwe bersiva wî dida.

-Dayê, -Roder gote dê, -ez mezin bûnê, ezê jî bibime pêşmerge.

-Lawo, xêr-xweşî hetanî tu mezinbî, tuyê bibî pêşmergê Kurdistana aza. De dayîk qurbana tebe, tu têkebe xewê.

-Lê tu çîma nakebî xewê?

-Ez ditirsim razêm xewêda bimînim. Ne pêşmergan gotin, wê berbangê rabin herin. Ez naxwezim ewana bê çay, bê nan herin. Tu razê ezê hinekî jî hişîyar bimînim, rabim herime kanîya «Sipî» avê bînim, çayê dayînim.

Kanîya «Sipî» bintara gund bû. Ava wê bi nav-deng bû.

Rûkenê weşekî çavêن xwe dida ser hev, careke mayîn vediciniqî, hişîyar dibû, ditirsîya xewêda bimîne Awa, ewê berbang bi «çavêن xwe vekir». Gava dayîkê rabû kincêن xwe xwekir, Roder gote dayîkê:

-Ezê jî tera bêm! Ezê misîn hildim, avê bînim!

Dayîkê çiqasî kir, ne kir, nebû tiştekî; ewê elb, wî jî misin hilda û ji mal derketin.

Kew ketibû sibê. Dayîk û kurik gihîstine ser kanîyê, ewê xwest xarbe serçavê xwe û kurik bişo, dengê maşînan li wan tesele bû. Dayîkê nihêrî wêda du maşînê bi nîşana jandarman tê. Qurfeke giran kete dilê Rûkenê. Ewa gellekî nerehet bû.

Ewê elb tijî av kir, xwest misîn jî tijîke, maşîne ji kanîyê çend mêttra derbaz bûn, sekinîn. Ji maşîna pêşiyê mirovek peya bû û ji Rûkenê pirsî:

-Mala Şîho, navê kurê wî Rosteme, kîjane?

Rûkenê rind tê derxist, ewana pêhesiyane, îşev pêşmerge hatine mala wan. Rûken kete mitala: «Gelo van kelbana ji ku bihîstine? Ê, kurmê darê ji darê nîbe, dar narize». Lê naha ne wedê wê yekê bû, ewê gote kur:

-Lawo, xwezila min çek jî xwera bihanîya, şîrê diya min, keda bavê min li min heram bûya, min nedîhişt yek wana sax bifilitîya. Tiştê buhuri buhuriye. Tu bireve mal, pêşmergan bi hatina vana bide hesandînê, ka binê ez porkurê ci dikim?

Dayîkê awa gotinê, Roder da penîya, lê jandarmekî elbêra pey kurik ket, ew girt. Dihate zanînê ewî kurdî zanibû.

Rûkenê xwe da feza kanîyê, ji erdê usa kevir tijî pêşa xwe kir, usa ser jandarmenada barand, te hew dizanibû ewana ji jorda dibarîn.

Jandarmekî got:

-Tu mera ya rast bêje, emê kurê te berdin!

Rûkenê kevirê destê xwe nava kefa destê xweda xayîkar û bi hêrs pirsî:

-Hûn çi dixwezin?

-Em Mustafa Barzanî digerin. Dibên îşev ew hatîye vî gundî. Ew kuye?

Rûkenê qerfê xwe bi wî kir, devê xwe li wî xar kir, bi hêrs got:

-Barzanî her şev li gundê meye, li hemû gundêne Kurdistaneye. Hûnê tu dema nikaribin wî bigirin. Barzanî rojan dilê medaye, şevan xewna medaye. Ew jîyan, ruhê meye! Qe hizkirina dila, xewna çavan, ruhê mirovan têne girtinê.

Ewê ev gilîyana bi hêwirze got û kevirê destê xwe rast avîte enîya jandarme. Bû ofe, ofa wî.

Rûkenê him jî hewarî daxwiste gund. Janderme hev ketin. Gund hisîyar bû, hinek bi çek, hinek bi mer, şene, şivava êrişî jandarman kirin.

Mezinê wan ev rewş ber çavêن xwe dîtinê emir kir:

-Gede hildin,zû maşîna sîyar bin, em ji vir birevin, yanî na kurdêne me qirkin!

Wana Roder kirine maşînê û péberjêr bûn. Qirce-qirca gulê gundîyan, hewar-gazîya wana berga tiştekî ne girt.

Maşîne daketinê newala bintara gund, nişkêva maşîneke wana ji çerxê ket. Wura êpêcekî sekinîn. Avtoajo peya bû, bi destê ricaf vîrda, wêda ew mêze kir, careke dinê ketine hevraz, rêketin. Wana hevraz qevzkinê, nihêrîn ser rê kevir, kuçik mîna cemedanî

Ahmedê Hepo -----

hatine dayînê, ew hatiye birînê. Ricaf kete laşê jandarman. Herdu avtoajo peya bûn, wekî rê paqîşkin, vê weşê dengêñ mîna gulla ewana hingavtin:

-Zaroyê berdin! Yanê na, yek we sax namîne!

-Wekî em gede beridn,-ji hundurê maşînê dengek hate bihîstinê,-hûnê dest nedine me?

-Em gîlîyêñ pêşmergan didin zarokê berdin, emê destê xwe nedine we.

Çend deqîqa ji jandarman deng dermeket, ewana hundurda hevra ketibûne şêwirê, him jî çawa dibêñ, mirinê ser wan birî bû... Yê sereke ber xweda gote hevalêñ xwe:

-Çi kula me, em vandera ci digerin?

-Naha ne ew deme, em gede berdin, yanê na?

Jandarmekî bi dengekî ricaf got:

-Nêtek hatîye hişê min.

-Ew çiye?

Ewî nîta xwe anî ser zara.

Ev nêt xweşa hevalêñ wî hat, lema jî jandarmeyê sereke hinekî serê xwe ji maşînê derxist, bi dengekî ricav got:

-Hevalno, bi serê Barzanî sond buxun, wekî hûnê destê xwe nedine me em gede berdin.

Pêşmerge him kêfxweş bûn, him jî bi hev şêwirîn. Ewana hevra qayîl bûn û pêşmergekî got:

-Em serê Mustafa Barzanî sond duxun, hûn kurik berdin û ji van dera bitewsin!

Jandarme bêgav man û Roder berdan. Ew çend gava ji maşînê dûr ketibû, mîna xortekî kire qirînî:

Ahmedê Hepo -----

-Pêşmergeno, hûn wana bernedin! Bila ewana giş  
peyabin, hevra bêjin:

-Bijî, bijî Barzanî! Paşê wana berdin!

Pêşmergen ser vê gotina Roder daha jî dêmgeş  
bûn, hev kenîyan û emir kirin:

-Jandarmeno! Gişk ji maşînê peyabin, pey hev  
fereqet bisekinin, bi destêن xwe nîşana azayê bidine  
kivşê û bêjin:

-Bijî, bijî Barzanî!

Pêşmerga ew sê gilî bi wan çend cara dane  
wekilandinê. Wê şûnda gullek, dudu ser wanra avîtin  
û li wan qirîyan:

-De herin, we li van çîya ci dît usa qalkin, ev  
çîyana evranin, neyên van dera neherimînin!

Pey gullaran jandarme revîn maşînê sîyar bûn, rê  
ketin, pêşmerge û Roder hatin hev hemêz kirin.  
Kurik dît ev pêşmergên êvarê mala wan bûn.

\* \* \*

Mehek, dudu ji wê qewmandinê derbaz bibûn.  
Malbeta apê Şîho him nava şînê, him nava şayîyêda  
bû. Şîn bû, wekî Roder ketibû destê jandarman, kuda  
diçûn kesî tiştek ne digot, şayî bû, ku her êvar  
binelîyên gund besdar dibûn, hey derbarê kurikê  
êginda mîna mîrxasekî çirokan bîr dihanîn.

Ji gişkan gelletir Rûken ber xwe diket, xweda  
dikewgirî, dikizîya, hêsir dibarand, lê carna xwe-  
xwera digot: «Çima xwîna Roderê min sore, xwîna  
Şehîdên me reşe? Çima dê-bavêن wan tune? Çima

Ahmedê Hepo -----  
dayîkan ew ne anîne? Kurê minê jî navê Şehîdîyê  
bistîne!»

Lê îşev dayîk daha pirr nerehet bû. Mîna rojên ewlîn qe xewa wê nedihat. Seweke giran nuqtîbû dilê wê. Ewê xwe-xwera digot: «Xwedê xérke, diqewime Roderê min»...

Ew veciniqî, gilîyê «kuştinê», «mirinê» ne anî ser zarê xwe.

Kew ketibû sibê. Malda sebira Rûkenê nehat, ewê gavek-dudu ber bi dêrî avît, xwest derê ber hewa paqîş, hinekî li çîya mëzeke. Vê gavê derê wan hate kutandî. Ewa ber dêrî bû, te tirê wê bîna derî kutayî kişandibû nava ruhê xwe û lema jî qe nepirsî:

-Ew kîye? Wê weşê derî vekir. Xortekî bi bejin-bal, ber şêmîkê sekinî bû, xwîna wî usa ser wêda kelîya, wê hew zanibû, ew birê wêye, xwest bê rûyê wî. Lê lipitandin bi wê ne bû. Xort bi beşereke xweş, bi rûken got:

-Xûşkê, tu Rûkenî?

Ji vê pirsê gewrî li Rûkenê xitimî, dêmên hinarî reşevehatin, hej li wê ket, dest avîte desteka dêrî û dilê xwera ev gîlî dane rêze: «Lêlê, mormorkê, tu çi zanî ev xortê xwînşirîn kîye, ser hişê xweda warê?»

Rûken ber xwe da kêlimî:

-Erê.

Xort ji berîya xwe wênek derxist da Rûkenê û wê demê jî, ji ber çavan minê bû.

Rûkenê wêne da deste xwe, xwest pirske:

-Tu kîyî? Ev çîye? Lê dereng bû. Ewê bi destê ricaf wêne mîze kir. Barzanîyê navdar destê Roderî rastê girtibû, lê kurik bi herdu tilîyên destê çepêva nîşana azayê dida kivşê. Bin wênedâ jî hatibû neqîş kirinê:

-Bijî, bijî Barzanî!

Rûkenê ji şabûna kire qîrînî:

-Weyla, ez qurbana webim! Şukur Roderê min bal azadarê meye! Ewê rojekê mîzginîya azayê bîne!

x

x

x

...Me dîsa rîya xwe domand. Çawa çîrokada dibêjin, em pirr çûbûn, kurt çûbûn wedekî nihêrî Fariz ji rîya papûrê- şosê dagerî û maşîne da xayîkirinê, derbazî pêşîya maşînê bû, çarmêrkî rûnişt, sîgarêtek derxist û bi şermokî karnîyarî min bû:

-Keko, biborîn cixarekê bikişînim. We bi axavtina xwe ez helandim, ez kelandim, him jî derbarê sê ewladêن meye mezinda çawa rind qal kir.

Yekî mera heta-hetayî ronahî anîye, yê dinê bi şûrê xwe dunya muselmanîyê mîna dara merxê xemiland, lê em bê par hîştin, yê sisîya himê azayê mera danîye. Bijî, bijî Barzanî!

Ewî nîta xwe serhevda ne anî, navbirî da axavtina xwe, dereng-dereng got:

-Bila rehma Xwedê li wanbe! Reş jî ya meye, sipî jî.

-Em bi hersêkava jî firanax dibin.

-Bila gotina webe.

Ahmedê Hepo

Em dîsa rêketin. Qasek ser mera derbaz bibû, dengê Fariz ez ji mitala dûrxistim:

-Îdî em gihîstine merzel, peyabe emê hinekî peya herin.

Me giran-giran berbi merzel da gava. Rêke qiral bû. Gîhayên dora rê davítine navîka mîriv.

Her yek me ketibû nava bera mitalên xwe. Min nizanibû Fariz çi xema dike, lê ya min bibû barekî giran:

-Mirîbî, mirîyê axa welatê xwe, merzelê kal- bavêñ xwebî. Gel rind gotîye:

-Miran heye edete,  
Miran heye eybete.

Mirina li perê merzelê xelqê, mirina bi eybete.

Me herduya jî giran-giran gav davît. Êmê çend deqîqan em rex hev da çûn. Paşê Fariz hinekî gavê xwe gir kir, kete pêşîya min. Min gav bi gav da pey wî. Demek ser mera derbaz bû, Fariz ser milê çepê vegerî û sekînî.

Em ber dergê merzel bûn. Me hevra selam da mirîyên merzel û fatihe xwend.

-Keko, -Fariz berbirî min bû,-eva merzelê kurdâyî nûhe.

Ewî teqileke giran danî ser gilîyê «Nûh», kesereke kûr rihaşt. Min nêta wî derz kir. Dibê, her tiştê nûh rinde. Lê merzelê nûh ji bona kurdan bûye derdekî giran. Evê nêtê mêmûyê min sot: «Tirba kalikê kalikê min li Kurdistana Mezine, ya kalikê min li Ermenîstanêye, ya bavê min li Azerbaycanêye, lê gelo tirba minê li kube ? Ji vê pirsê veciniqîm! Bila usa neyê fem krinê ez ji mirinê tirsîyam. Na! Sed cara na! Tirsa min wê tirsê bû, gelo tirba minê jî xerîb bikeve?»

Farizê tifal mîna rênîşandarekî ketibû pêşîya min û ber her tirkbekê disekinî digot:

-Eva tirba filan kesêye, eva tirba bêvan kesêye.

Me ber her tirkbekê bejîne xwe ditewand. Tirb tirba mîra bûnê em ber pîya disekinîn, ya jina bûnê,

Ahmedê Hepo -----  
derbazî ber sêrî dibûn, bi kevrekî biçûkva sê cara serkêlkêda lêdida.

Belê, ez benî, ez heyran, dîroka vî merzelî ya ji sala 1988-a bû, rastî jî nûh bû. Merzel «cîwan» bû, zulm, sîtema ser kurdan hêne-hên bû. Ji merzelê kurdan hinekî wêdatir merzelekî Rûsan bû. Min hetabîya xwe, xwezulbûna xwe wan anî. Kalikê kalikên wan pal kutabûne palê hev.

Fariz ez anîm derxistime ber tirba bavê xwe. Peykelekî bilindî ji kevirê mermere reş ser tirba wî hatibû danînê. Wênenê wî usa bi ruh-can hatibû nitrandinê, te hew dizanibû, ew dixweze tera bipeyîve, lê zar-ziman tune.

Min desmala destê xweva wêneyê wî paqîş kir, ew maç kir, derbazî ber pîya bûm, xarbûm sê cara «derê mala» wî ya qîyametê kuta, wekî ez hatime «mala» te. Û ber xweda kire pite-pit:

-Ê Üsivê bira, helbestvanê bextreş, roj xweş! Te çend salan pirtûka xwe ya bi navê «Zimanê kurdî» nivîsî, lê tera hevnehat wêya biweşînî. Min ew daye weşandinê û iro «terâ anîye». Bila rehma Xwedê li tebe, cîyê te cinetîbe! Bila ruhê te heşîyarbe!

Helbestvano! Xwedê şehedeye min bona «Zimanê kurdî» çıqasî cefa kişand. Ewa mîna mirovekî hincîrî bû. Min ewa monik-monik da ser hev, ew cebirand, xuliqand, ew beş-beş, war-war kir, pêşnivîsar nivîsî, bi alîkarîya jina teye êgin, ewledên teye şîrhelal pirsa aborîyê safikirin û ewa da weşan-dinê. Min bona şabûna ruhê te ewa tera xelat anîye!

Ahmedê Hepo -----

Min pirtûkeke «Zimanê kurdî» ji çenteyê xwe derxist danî ser serkêlka wî.

Fariz çend gava dûrî min sekinî bû, kere-ker hêsis dibarand.

Pey axavtina minra ew nêzîk bû, pirtûk hilda bire ser lêvên xwe, hilda danî «ber serê» helbestvan.

Çawa dibêن, pey serdana tirbanra, me «xatirê xwe ji helbestvan», «ji binelîyêن» merzel xwest û paşta vegerîn. Li ber dergê merzel xofeke giran kete ser min. Pîyêن min minra nehatin, li wî dergê merzel cîyê rûniştinê hebû. Ez wir rûniştim. Vê waşê dengek hundurê minra derbaz bû. Go «Naha çi ku wê binuqute dilê te, ronke ser kaxazê sipî». Min elbêra dest avîte portfêlê xwe, pêñûs û çend belg kaxaz derxist, danî ser jûnîyêن xwe û dest bi nivîsarê kir:

-Kî ku tê vira, kî dibe bila bibe, mirin dikebe bîrê. Jîyana wî, kirinêن kirî, qencî-xerabî, zulm-neheqî têن ber çavanra derbaz dîbin.

Xwezila rojekê sazمان, parlamentêن dunyayêye mezin, bilindcivîn, qurulta mirovayê beştarbe, ne ku ji rastîyê, heqîyê, dêmokrata heyî, tuneyî biaxîvin, lê beştarbin, birîyar bikin: «Salê carekê serkar-rêvebirê hukumet-dewletan, gire-gir, dewlemendêن dunyayê, sîyasetzan biçivine merzelekî mîna merzelê «Helebçe»-yê, ber her tirbekêra derbaz bin û şev wira razêن-paldin. Wê şevê ew yekê têkebe xewna wan, welî ey melkemotêن vê dunya gewrik, îdî bese mal-milkê heram beravî ser hev dikin, bese gelan bere hevdin, bese erd-esmîn hevxin, we ne erd-ax, ne

çem-kanî, ne dar-daristan, ne ber-okêyan, we qe mûristanek jî ne xuluqandîye, lê çîma ser van gişkada neheqîya, nerastîya, qetilkarîya, xwînê didine rêtinê? Bawerî heye, wekî usa bê kirinê wê pêşîya gellek tiştê xîrab bê girtinê.» Nizam çiqas wede derbaz bibû, gava min serê xwe bilind kir, erşê esmîn nihêrî, dît ro hêdî-hêdî dadigere. Dora xwe mîzekir dît Farizê Ûsiv hinekî dûrî min, pişta xwe kutayê maşînê, ser pê sekîniye û sîgarêtê dikişîne.

Ewî dît min dest ji nivîsarê kişandîye gav-gav ber bi min hat.

-Apê Ahmed, -got, -min xwe ker kir, qe ji cîyê xwe nelivîm, min go, bila binivîse, ka binê ci dinivîse?

Ez ber xweda vebîşirîm. Ewî dest ji min venekişand, min ci nivîsibû wîra xwend. Fariz sîgarêta destê xwe wêda avît, ez hemêz kirim, bi dengekî mîna dengê ava leme-lem kire piçe-piç:

-Apo, kela min tijî bûye, bihêle, hinekî hêmîn bim.

Fariz bi desmala destava şilaya ber çavêن xwe, xwîdana enîya xwe paqîş kir, pişta xwe rast kir û berê xwe da min:

-Nêtênen te nivîsî nêtê usanîn, wekî ewana bona hemû mirovayê yêñ kîrhatîne. Xwezila hemû mirovayê ev gotinênen te bibîsta! Ew yek jîyanêda mîyaser kirana!

Êmekî me ker-lal rûyê hev nihêrî. Îcar jî min berê xwe da wî:

-Lawo, were em ji merzel derêñ! Sewa wî girane.

Ahmedê Hepo

Ewî qe tiştek ne got, da pêşîya min, pê-pê ji merzel dûrketin. Em maşînêda rûniştinê dunya me hate guhastinê.. Ez karnîyarî Fariz bûm:

-Bavo, bajo, bajo em herine «Mala Kurdan».

-Apê Ahmed, mala dostê te ser rîya meye. Em berê herine mala Sûrgûnê Bala.

-Tu çawa zanî usa bike, bajo.

Em derketine rîya codê. Çend km rê çûn, xortê delal berê maşinê da nava gund û êmê 15-20 deqîqa ber dervezekî sekinî.

-Eva mala Sûrgûnê hevalê teye.

Paşe ew ji maşînê peya bû, derî kuta. Jina malê derî vekir û Fariz pirsa Sûrgûn kir. Ewê şerma navê mîrê xwe ne kişand û bi şermoke kîlimî:

-Ewî li bajarê Krasnodarêye.

Ez jî maşînê peya bûm û me kîf-halê hev pirsi. Ewê bi merdane got:

-Birayê Ahmed, ewî ne male, mal male. Warêna wera karekê bidime serjêkrinê. İşev ewê li bazarê bimîne.

Me spasiya xwe da wê û em paşda vegeŕîn. Me berê xwe da «Mala Kurdan» ya li rîspûblîka Adîgêy.

Em ji avayî dûr ketinê Fariz ji min pirsi:

-Mamoste, biborîne, vê sibê em ji mal derketinê we rîda got, wekî hûnê qewmandina ku, hatîye sere we û Sûrgûn qalkin. Dîsa rîya me kurt kin.

-Belê, min vê sibê got, wekî Sûrgûn dostê minî cîwantîyêye, raste ewî nexwendîye, lê xwe-xwera mijûl bûye. Ji hinek xwendîya daha gellekî dixûne.

Ahmedê Hepo -----

Çawa ew bi xwe dibêje, Sûrgûnê Bala haj bayê dunyayê heye. Tu hêmîn maşînê bajo, ez jî, ji dostîya me tera bijenim.

-Pirr pak.

-Ewê yekê tera bêjim, wekî Sûrgûn sala 1937-a vagona sûrgûnêda hatîye dunê. Wê salê malbeta wan jî, ji Ermênistanê tê nefîkirinê. Lema jî navê wî danîne Sûrgûn.

Sûrgûn li gund dima. Paşê ew her hatinê wê malê minra jî par dihanî, carna jî çend manat dida min. Digot, esse ji te kurekî Kurdayî çê derê...

Sal hatin ser mera derbaz bûn. Min îdî ïnstîtût xilaz karibû û rôdaksîya rojnameya «Rya teze»-da dixebeitîm. Pêwîste ser qewmandinekê bisekinim.

Sala 1967-a bû. Rojeke havînê ew hate bal min. Gellek pirsara tevayî me derbarê hevalê wîda, yê ku bajêrda dima, axivîn. Ew hevalê wî hatibû girtinê, kelêda bû, pênc sal dabûne wî. Sûrgûn ji min hîvîkir, wekî çend roja şûnda ez bi wîra herime kelê, bona rastî hevalê wî bêñ. Belê, em pevketin.

Maşîna- Sûrgûn «Vîlis» bû. Roja kivşkirî hat ez ji mal hildam û me berê xwe da kelê. Kela weke 70-80 km dûrî bajarê Êrêvanê bû.

Kîne-kîna germa havînê bû. Mirovan ji germê - dijwarî dikişand. Kela nava qirekî xikî-xalîda hatibû ava kirinê. Jêra digotin kela «Koşê», cîyê mer-mišk-dibûşkan bû. Gava îdî qije-qija tavê bû, em gihîstine ber kelê.

Çawa rojnamevan serokê kelê ez pejirandim. Ü ewî her tenê destûr da min, wekî ez rastî girtî bêm. Ez birime odeke cuda û hinekî şûnda girtî jî anîn. Pey kîf-halara, ci ku Sûrgûn girtî-hevalê xwera anîbû min çû anî odê. Min ew jî gîhande Sûrgûnê bira, wekî tenê destûr dane min, rastî girtî bêm. Min têderxist ew xweda werimîye, reng qemilîye, lê ewî xwe wan erda danenî û tu tiştek ne got.

Rasthatina min û girtî 4-5 seheta kişand. Me tevayî nan jî xwer, çend cara çay, ava sar vexwer, te hew dizanibû me bîrkiribû, wekî Sûrgûn derva tî û birçîye. Weke heqîya Xwedê min çend cara navê wî anî ser zara, lê girtî hûrik-hûrik, yeko-yeko, monik-monik pîrsa her kesî kir, derbarê her tiştîda dipirsî, pîrsê wî ne dihatine dawîyê.

Gava ez ji kelê derketim bawar bikî ro dagerîya bû. Min Sûrgûn da hewaldanê, lê deng ji wî derneket. Ew reşqemilî bû. Te tirê lêvên wî tîda qelişîne, bizmar girtine. Ewî her tenê derê maşînê vekir, şanî kir, wekî ez maşînê sîyarbim.

Em ji kelê rîketin. Min rîva ci got, ne got deng ji Sûrgûn derneket. Pey çend kîlomêtranra em pêberjêr daketine newalê, çemekî gur dikişîya. Sûrgûn ne ajote alîyê pirê, lê raste-rast maşîn ajote nava çêm û xayî kir. Derê maşînê vekir û bi sol-gorava xwe avîte avê. Devê xwe kire ava çêm têr vexwer. Ser çavêن xwe şûşt, ji avê derket, êpêcekî ser kîvirekî rûnişt. Demeke xurd derbaz bû, ji ser kîvir rabû û berbi

Ahmedê Hepo -----  
maşînê hat, derê alîyê min vekir û bi hukum, bi rik  
got:

-Kino, (car-caran ewî minra Kino digot. Bejina wî  
bilind, ya min kin bû), ji машînê peyabe, ya min û te  
heta vêderêye.

-Çima min ci kirîye?

-Ji vê yekê jî xirabtir tuyê ci bikî! Ez tera dibêm bi  
xweşîya xwe ji машînê peyabe!

Ewî nihêrî ez peyanabim, derbazî alîyê xwe bû,  
dest avît rûniştoka xwe bilind kir, çeka xwe derxist.  
Dîsa nava ava çêmra hate alîyê min, qirme kişande ser  
min:

-Ahmedê Hepo, îcar tu bi xweşîya xwe peyanebî,  
sol-gorava mîna min nekebî avê, ezê du fişeka hevra  
bere tedim!

-Lo kurdê bê hiş, tê kivşê vê sibê zû te dewê tîrs  
vexwerîye, hişe te çeliqîye! Ca bêje, min ci kirîye?

-Çawa te ci kirîye! Hela bejina xwe binihêre, li  
min jî binihêre. Bejinêda ducarî teme. Çawa seba  
kinşkeke sore biçük (kinşke palpişa rojnamevanêra  
digot) tu berdane hundurê kelê, lê ez Sûrgûnê Bala  
derva mame. Xwera hundurda rûniştî dixweyî, vedux-  
weyî, lê tu nabêjî kurê kerekî derva meye? Ji tîbûna  
lêvê min qelişîne!

-Sûrgûn, bira, heşa te, usa xwera nebêje, eva yek.  
Ya duda, min jî serokê kelê gellekî hîvîkir, go na, ezê  
tenê destûrê bidime te. Ya sisîya, hey min dixwest  
rabim, dostê te ne dihîst. Min digote wî naha Sûrgûn  
tîda biecî, digot tişt nabe, ew kurê kurde.

-Belê, belê tenê ez kurê kurdim!

Wê şûnda ewî qirma destê xwe avîte berê çêm, herdu destava ez hemêz kirim, hilda gavekê-duda ji maşînê dûrket, go, binê ezê te bavêjime nava çêm, roda herî!

Min qe dengê xwe nekir. Ewî ez anîm ber çêm danîm û qayîm-qayîm hemêz kirim û bi teqil ser minda war hat:

-Lo, min henekê xwe te dikir. Lo, ez qurbana bejina te, wê xwendîna te! Yê mîna min li serê çiya, xwedê giravî mîrin. Bi şivekêva deh hewê mîna te bide ber şivê! Xwedê , naha min femkir xwendin, dîsa xwendin, ya ku qelem dike, şûr nake!

Ew hate rûyê min û dîsa kîlimî:

-Min bibaxşîne, de xeberde, çîye min tu tirsandî?

-Na bira, ezê tera tiştekî bêjim, nêta te makkim.

Neyarekî kurdâyî xwînmêt karnîyarî gelê xwe dibe:

-Ey gelê min, kurdan çek hildanê, şoreş, şer, dew-doz kîrinê metîrsin! Kurdan him çek, him qelem hildanê bitîrsin!

Sûrgûn careke mayîn ez hemêz kirim, hate rûyê min û got:

-Ew rojê jî bê!

-Mamoste, -Fariz berê xwe da min û pîrsî, -ew roj hatîye, yanê na?

-Şukur, hezar cara şukur ew roj hatîye. Îro Kurd payê pirr bi sîyasetê şer dike, bi rîya aşîtiyê dewa mafêن xwe dike. Bi gîlîkî şûr û qelem gîhîştîye hev!

Îdî êvar bû, em ketine nava gundekî, qe gellekî neçûn, Fariz maşîne ber avayîkî du tayê xayîkir û berbirî min bû:

-Mamoste, keremke peyabe, ev jî «Mala Kurdan».

Xortekî bejin kin derî ser meda vekir. Me roj başî da hev. Fariz ez wîra kirime nas:

-Heval Mûsa, eva mamoste Ahmedê Hepoye, ji Azerbaycanê hatîye.

-Belê, min navê wî bihîstîye, romana wî, ya bi navê «Birîn»-ê xwendîye. Ew pirtûk hevalekî-Torinê Pervan daye min.

-Ew hevalê tu dibêjî, -min bersîva wî da, -birazîyê mine.

Hevalê Mûsa daha jî şâ bû.

«Mala Kurda» maleke şüştî-mûştî bû. Bi bedew, bi nûh demî hatibû ava kirinê.

Em û Mûsa pêşberî hev rûniştin. Ew şêrda hatibû birîndar kirinê. Dilê minra ew yek derbaz bû, wekî ya Rebbî, binhêre bi hezarava yê mîna vî xortê êgîn ketine nava şer, dew-doza azayê. Azaya bona min, bona me hemûya.

Nişkêva Mûsa bi pirsan xweva berê min da çiyakî mezin. Ji min pirsî:

-Mamoste, tu Apoçiyî?

Me hevra rûyê hev mêze kir. Min tê derxist hevalê Mûsa ji pirsa xwe poşmane. Ewî xwest tiştekî jî bêje, min nehîst û karnîyarî wî bûm:

-Mûsayê bira, heloyê serê çîyan, bihêle bersîva te bi risteke helbestvan, ulumdar Şamîlê Selîm bidm:

War bi kerî-kerîye,  
Her kerîyek perîye.  
Kî derdê wê dikişîne.  
Tenê ew kes merîye.

Ewa yek. Ya duda ez paşpirtika «Çi» namehînim, na pejirînim. Ew paşpirtika ya zimanê giramêra tirkane. Min, Ahmedê Hepo, ji Kawayî Hesinger girtî, hatanî roja meye îroyîn, kê bi heq, rast bona rizgarîya gelê xwe şerkarî kirîye, şoreş doman-dîye ji bîboka çavêن xwe zêdetir hizkiriye. Min navê gellek nefskarêن, ku rîya Kurd û Kurdistanêda dew-doz, şerkirine nekişand, ji ber ku, ewana ne dehin, ne sedin, lêbelê, ez bi ruh, hişê xweva paşpirtikê wanîm.

Mûsa bi zendegirtî ez mîze kirim û pirsî:

-Tu bawer dikî Kurdistanê azabe?

-Belê! Lê her çar parêن wê, wê carekêva neyê azakirinê.

Hevalê Mûsa hinekî bi hukum got:

-Na! Xwestin-daxweza me ewe, wekî Kudistan seran-ser bê aza kirinê.

-Keko, birao, xwestina me hemû kurdan ewe. Lê dîsa diwekilînim, ew yek wê carekêva neyê çare-serkirinê. A, waye li beşkê, li Kurdistanâ başûr derge-kî xêrê tê vekirinê. Pêwîste hemû kurdên dunyayê alîkarîyê bidine wê. Usa bizanibe em çar birane. Malavayê me herçar bira jî tune. Em dixwezin hevra avayîkî avakin, çêkin, ew jî pirseke dijware. Lê birakî mera usa hevhatîye, hêza wî digihîjê xwera avayîkî

avake. Gotî ew birayên mayîn şabin û destê alîkarîyê dirêjî wî kin. Wekî birak xwera avayîkî avake, ewê bibe sitara birêن mayîn, hetanî yê mayîn jî bûne xwe-dan mal-milk.

Min tirê hevalê Mûsa bi dudilî minra qayîl bû.

Wê wêda em hatine ser rewşa kurdêن ku, komelêن Sovêtêye berêda jîne. Vira jî pirs, gilî-gotin mîna gewlaz hev zêde bû, dirêj bû.

Êvarê erd hilçiland bû, em ji «Mala Kurdan» derketin. Germa havînê kişiya bû, cîyê xwe dabû hênikayê, nemkêşiyê.

Rêda Farizê Üsiv gote min, wekî çend deqîqa şûnda emê bigihîjine mala kurê birê te û ji min pirsî:

-Tuyê işev wira bimînî?

-Na, lawo, min bona sibê bilêta avtobûsê stendîye, ez nikarim bimînim.

Gava em ji mala birazîyê min derketin tarîyê erd hingavt bû. Fariz hey dixwest ez tiştekî bêjîm, qalkim, lê kêfa min, ne ew kêf bû. Qe jîyana malbeta birazîyê min xweşa min nehat. Lê bi gotina gotiya şukur vê rewşêra, ew ji daha çêtire. Alîyê dinêda birazîyê min ne li mal bû. Him jî xerîbîyê ya xwe kiribû. Qewm-lêzim,-pismamên me gişk li Azerbaycanê bû. Ber çavêن min tiştek nedihate kivşê. Gohê min jî hatibûne xitmandinê, min qe rind ne dibihîst. Ez dîsa ketibûme rev-beza mitala. Derd-kulê heyî, rewşa kurdêن vê derê, dera hanê dîtî, ez kiribûme tendûreke bi kozî, devê wê girtibûn, kulfika wê xitmandibûn, him nava êgirda dişewitîm, him nava dû, bîn-buxu-

Ahmedê Hepo -----  
sêda difetisîm. Nizam ji ci bû, vira qewmandinek  
kete bîra min û agirê dilê min gur kir:

-Rojekê li Bakûyê civîna sazmanên ne huku-metî  
derbaz dibû. Ez jî tevgelî wê civînê bibûm. Wê  
civînêda wekilê gellek sazمان û navendêن çanda  
axivîn.

Jineke alman jî bi rûsî axivî. Hinek mesele bona  
min tarî ma, lema jî wedê navberê ez nêzîkî wê sîtê  
bûm û ji wê pirsî:

-Biborînin sîta birêz, çawa ez zanim, naha alman li  
Azerbaycanê najîn, lê hûn çîva mijûlin?

Ewa ber xweda vebîşirî û gote min:

-Raste naha alman li Bakûyê najîn, lê sedsalîya  
berê jîne. Ew him li Bakûyê, him nehîyên Azerbay-  
canê, payê pirr li Xanlarê, Şamxorê jîne. Naha  
sazmanâ me wê karê dike, ka binê çiqas alman li  
Azerbaycanê jîne, ewana kî bûne, yên dunya xwe  
guhastî tirba wan li kune?

Heylo, dunya bi xêr-şêن, dunya bi şer-dew, em qe  
nizanin zindîyêن me kune, xelq tîrbêن mirîyê xwe  
digere...

Hema wê weşê Fariz maşîne usa da xweyîkirinê,  
ez ji cîyê xwe leqîyam û min pirsî:

-Lawo, Xwedê xérke ci bû?

Ewî qe bersîva min neda ji maşînê peya bû û çû  
nava rêda tiştekî mîna gonce hilda danî kevîya rê.

-Apê Ahmed,-ewî berê xwe da min, -van dera  
êvar-êvar, şev maşin ajotin dijware, hinek müjikên

rûs, yên serxweş vedixwin û dertêne ser rîyan. Mirovê ne nas hew dizanin ew kotîkin.

-Erê, welleh min jî hew zanibû ew gonceye te ji ser rê hilda.

-Mamoste gonce çîye?

-Lawo, eva cil salî zêdetire, wekî ez du nexwe-şîya ketime. Yek nexweşîya Welathizîyêye. Yek jî nexweşîya zimanê dê. Ez dicedînim paqîş, bi zimanê dayîka xwe binivîsim. Ez nabêjim kemasîyên min di alîyê zimînda tune. Heye... Kotîk ji zimanê tirkî derbazî zimanê me bûye, bi kurdî dibêjin gonce.

-Mamostê, lê em ci bikin?

-Qe, ber xwe nekebe! Welat ku aza bû, dewlet hate sazkirinê, wê demê ferhenga rastnivîsarê wê bi birîyar, bi fermî bê weşandinê, gişkê bi rizmekî binivîsin.

-Xwedê bike?

-Xwedê dengê te bibihîze!

Me idî deve-devî bajarê Krasnodarê kiribû. Bajar nava ronaya êlektrîkêda hatibû wer girtinê. Şev nîvî bibû, maşîne kêm bibûn. Fariz kete kolaneke teng û gote min:

-Mamoste, ev kuçeyê me rast bibe bazarê.

-Naha li sûkê mirov hene.

-Belê, ew kesên ji gundê dûr hatî, yê ku mal-kelmelê wan nehatîye firotanê, şevê li wir derbaz dikin.

Ahmedê Hepo -----

Êmê çend deqîqan jî ser mera derbaz bûn. Fariz fitil da dora avayîkî, dirêjîyêra derbaz bû û hat kevîya rêkê sekinî.

-Mamoste, ev jî bazar.

Wî careke mayîn zû-zû got:

-Ev jî sûk!

Em ji maşînê peya bûn.

Alîyê çepê avayê bilind-bilind bûn, alîyê rastê cîkî fîre bû. Ji vî alî rê min tê derxist ew sûke.

-Farizê delal, -min gote wî, -tu vir bisekine, ezê nişkêva rex Sûrgûnra derêm.

-De baş, herin, ezê hinekî xwe paşa bidim.

Ez ji vî alî rê derbazî wî alî bûm. Bi kurdî dengê du-sê mirovan li min tesele bû. Min çend gav jî avîtin, dît, bihîst wekî sê kes hevra bilind-bilind diaxivin, şer dikan. Hêwirzeya wana der-dor hildabû serê xwe. Ewana bi nav-nûçikên xirab,, bi gili-gotinê kotî, pûc, pintî dihatine serê hev. Carna jî pesin didane xwe.

Dengê yekî aha dihate min:

-Ez li Ermenîstanê xwedanê kerî pezê qerqaş bûm, şivanê min hebû.

Yê dine:

-Em ku hatine Azerbaycanê min xanîkî ermenîyê 5 çavî zeft kir. Min ew ermenî şande koxtikê xweyî Ermenîstanê. Paşê min ew firot, hatime vira.

-Lo xulîser, -yekî pirsî, -lê kanê ew diravê xêni?

-Kula wê yekê nedane te!

Yê sisîya:

Ahmedê Hepo

-Eva neh, deh sale ez hatime vê Krasnodarê, rojorjda min ev bazar xwera kirîye war. Kî dikare ber min xeberde. Wekî tu pincara xweye genî ji erdê min wêda hilnedî, ezê xwîna te hilşînime erdê.

-Wekî sibê ji erdê min wêda neçî ezê kerekê zikê terakim!

-Nişkêva hûn herdu jî, sibê ji vê bazarê derneyên, de hûn zanin ezê kêra bêjim!

Ew herduyên mayîn hevra-hevra êrişî wî kirin:

-Erê, erê, em rind zanin mala we berêda meriv firote. Ermenîstanê we xwe qurbana ermenîya dikirin, diçûn em difrotane ermenîya, naha jî xwe qurbana rûsan dikan, me difroşine mîlîsên rûsan, rêkêt-rêbirên wana. Ceştiyê dikan.

Par na, pêrар çeleka rûsê cîranê me hat kete zevîya me. Berbang bû. Min kestekê avîte çelekê ji zevîyê derxistinê, seyê me êrişî wê kir û parava hêta wê gez kir. Te ev yek dît, wê sehetê te xwe gîhande mala rûs, ez firotim. Hinekî derbaz bû rûsan êrişî mala me kirin. Mîlîs hatine hewşa me. Gazî bijîjkê heywîn kirin, wekî aktê, binivîsin.

Xwedê giravî seyê me avîye, hare-derdeseye, welleh hezar naxweşî danîne ser sê. Gotin çelekê zûtirekê mirarbe. Lê qe kulê çelekê nexist. Hata eyan kirinê tenê du qîlê sê hinekî cermê çelekê herişandîye.

Em 10-15 malin, rûs 300-400 malin. Em qe na, mehê carekê hevra dikine şer, hev difroşin mîlîs tê nava wan malên meye gurî. Lê salê carekê mîlîs nayêne malên rûsan.

Ahmedê Hepo -----

-Hûn çi dibêjin bêjin, ev erd lap ji kalikên min, minra maye.

Îdî sebira min nehat, ez nêzîkî wan bûm. Wana dest xweda dengê xwe birîn, êmekî xurt li min nihêrîn. Ez kêlimîm:

-Şev baş, birano! Şeva we xweş!

-Pî, pî,-yekî bi simêl got, -ev kurde!

-Belê, ez kurdim. Eva weşike xurte ez sekînîme guh didime we. Hûn vê şevê, vî welatê xerîb şerê erdê, axê dikin. Çima hûn nizanîn, hûn li vira mîvanîn. Erd, axa we li Kurdistanêye. Hûne usa êginîn herin bona wê axê şer kin.

Çawa dibêñ, ji kêvir deng derket, ji wana deng derneket. Wana şerma serê xwe berjêr kirin.

Yekî wana bi hemdê xwe, bi dengekî şerm kêlimî:

-Min tu nas kirî. Tu Ahmedê Hepo nînî?

-Belê!

Ewî destê xwe dirêjî min kir, lê min zenda wî girt û berbirî hersêka bûm:

-Hûn pêşiyê dest bidine hev, paşê kêf-halê min bipirsin!

Em, ku ji hev dûr dikevin hevra şîrîn dibin, hê rûmeta hev digirin.

Wana wê deqîqê dest dane hev û hê me serhevda lorand. Hevra bûne nas: Cewo, Miraz, Arîf.

Dema min alîyê milê rastê nihêrî dît, wekî Sûrgûnê bira ser pê pişta xwe kutaye maşina barbir, destêñ xwe dane ser hev, te hew dizanibû ewana qeyd

kirine. Kûr-dûr dihênijî. Min êpêcekî li wî nihêrî û hiş-sewdayê minra ev gilî-gotin derbaz bûn: «Lo, Sûrgûnê bira, ji roja, ku tu ser pêçke- tekerên vagona barbir hatî vê dunyayê,jîyanê hey tu hejandî, birîye, anîye, rojekê te ne anî ser zara: Ax,of îro ez dilrehetim. Hêleçana dayîkê nebû para te. Jîyanê rast-cep, hevraz-berjêr tu dor hev birî-anî. Bona zike nan tu geh derê mala Qirqizan,geh derê mala Azerbaycanîya, geh derê mala Ermîyan, naha jî derê mala Rûsa dayî xebatê, destêne te pifik dan, qelişin, tîş-tîş bûn. Yek jî ez rind zanim tu hey bona welat, Kurdistanê dinalî, dikewgirî. Birao, welleh,billeh, hindik maye em herine welatê xwe. Hinekî jî bihêniye, paşê here welatê xwe hêmîn-hêmîn palde, razê».

Ji wan hersê camêra yekî nicande min:

-Bavo, tu çi ketî mitalan? Yek jî vê şevê, tu vê bazarê çi digerî?

Min çavêن xwe ji Sûrgûn û maşîna barbir kişand, ji mitalan qetîyam û xwest bersivê bidim Fariz kêlimî:

-Apê Ahmed hatîye Sûrgûn bivîne.

Wana bi ecêb hev nihêrîn, lê romana «Birîn»-ê destê minda, ber bi Sûrgûn gav da, ji dengê me ewî hinekî çavê xwe vekir, careke mayîn girt. Em lap nê-zîkî wî bûnê, ewî pizavek-dudu da xwe û alîyê me nihêrî. Em pêşberî hev sekinî bûn. Nişkêva usa kire qîrînî, hemû mirovên sûkê heşîyar bûn, hinek berbi dengê wî hatin.

Sûrgûn dest ustuyê minra bir û ez bernedidam. Bi dengekî kelogirî, xeriqî kire îske-îsk:

Ahmedê Hepo -----

-Birao, min tu dîtî, kela dilê min rabû, ew hat bisekine! Şukur vê rojêra dîsa me hev dît!

Em ber dilê wîda hatin. Sûrgûn bi hemû meselan, hatina min, bi çûyîna mine sibê hesîyanê got:

-De, ez te awa bernadim. Em herin vira rêsroranek heye heta sibê dixebite, parî nan buxun, wê wêda Xwedê kerîme.

Em, şes kes, li rêstoranê dora pêşxwînekê rûniştin. Sûrgûn pirtûk ji destê min girt û virda, wêda li wê nihêrî û got:

-Ka binêm te bona min ser çi nivîsiye?

Ewî destnivîsara min rind dixwend û min çi nivîsibû anî ser zara: «Birayê delal, Sûrgûnê Bala, min «Birîn» bi kul-derd, êş-jana bê welatîyêva nivîsiye. Bila birîna meye here mezin bicebire? Bila, azaya Kurdistanê bê caresekirinê!

Torîvan-Ahmedê Hepo»

Ewî pirtûk bire ser lêvên xwe, paşê danî ser dilê xwe û herdu destava ewa givaşt.

-Birao,-ewî destê xwe bilind kir,-got, -bila Xwedê dengê té bibihîze!

-Sûrgûno, -Cewo got, -kitêbê bide ez jî binihê-rim. Him jî dixwezim tiştekî bêjim, lê bila kesek ne-seyîde. Birayê Ahmed eva sehetekê hey me rûreş dike, dibê hûn çîma hevra rê naçin. Welleh, hema berêda serokên me, mezinên me hevra rê biçûyana, naha zûva dewleta me hebû.

Ahmedê Hepo -----

Hinekî navbirîn da nava axavtina xwe û dumayîn anî ser zara:

-A, waye, Celal Telebanî û Mesûd Barzanî hevra rê naçin.

Min mîna teyrekî bi penxirûk ser wî birî:

-Na tu rast nabêjî! Kî wan pirsa dibêje, ew ne kurdhize, ew naxweze beşeke Kurdistanê sazbe. Ew uestbende destê sar dike nava Kurdan. Ew kesena hinekêن mayînra karê dîkin.

Ez wê yekê rind zanim, ew herdu nefisdarêن kurdan hevra mîna biranîn! Ewana tu dema wê yekêra qayîl nabin, wekî xwîna, ku bi salava hatîye rêtinê badilhewa here. Ez bawerim Kurdistanê azabe! Nişkêva hetanî ez zindîbim welatê me aza nebe, min wesîyetê xwe kirîye, bila ser serkêlka min neqîşkin-biniyîsin:

-Ev dunê li min gellekî teng bû, ji ber ku welatê min bindest bû.

Ê, dîsa hundurê min da birûskê birûskê xist.. Min dumayîn da nêta xwe:

-Lê gelî bira, dîsa dibêjim zûtirekê pareke Kurdistanê azabe, nişkêva ez ewê nebînim bila xêrxazek bê ser tirba min û bêje:

-Rehme li tebe, welat aza bûye, bila ruhê te li vê dunê cî-warbe.

Pey van nêtê minra rind dihate kivşê him Cewo, him yêن dinê poşman bûne.

Ahmedê Hepo -----

Wê şevê me hetanî berbanga sibê hevra derbazî kir. Dema xatir xwestina me gellekî bi pirçûk bû. Nava kelogirîya me da Cewo got :

-Mamoste, te derseke rind da me. Xwedê bike em li Kurdistanê, ser kanîkê rastî hev bêñ. Ji ava wê vexwin û bêjin:

-Of,ax dilê me rehet bû.

Me xerîbê xerîba bi kulzikî xatirê xwe ji hev xwest.

X      X      X

Êvarda amede bibûm, wekî sibê rêkevim, vegeime Azerbaycanê.

Sibe ron bibû, rîya dûr-dirêj, dêmên polîsên li tixüb-dihatîn ber çavêñ minra derbaz dibûn, hema vê weşê du xort derda hatine hundur.

Ew xortan biraziyê Úçivê Evas bûn. Menîya hatina wan ew bû, wekî min bibine malêñ xwe, mîvandarîyê.

Me ser wê pirsê gellekî ber hev da, dawîyêda birayê Úsiv yê mezin, yêñ ku min rûmeta wî digirt Têymûrê Evas bi têlê axivî:

-Ahmed, nivîskarê êlê, were îro meçe, nanê me ser sêlê, goştê berx, kara serjêkirî nehermîne, mirovêñ ku, boy xatirê te beştar bûyî poşman meke. Bilêta stendî biqelşje, ezê lawika bişînim bona sibê tera bilêtê bistînin.

Ahmedê Hepo

Pey ewqasîra ez qayîl bûm, wê rojê jî mam.

Meclîseke giran bû. Weke 30-40 mirovî civî bibûn. Me ji hatin-çûyîna dewrê axivî, rewşa kurdên dunyayê anî ser zara. Lê xortekî berê xwe da min:

-Kek Ahmed, tu serê vê komê (ewî bi destê xwe hemû mirovên li wir da kivşê) ezê pirsekê bidime te, lê bi gilîkîva – «Erê», «Na» nebêje. Yeke îro em beravî serê te bûne, hatine dîtina te. Careke dinê Xwedê zane, em kîngê hev bivînin.

-Fermo, xorto!

Min awa bersîva wî da û serda zêde kir:

-Xorto, diqewime tu tiştekî usa bipirsî ez nizanim?

-Na, hûn rind zanin. Kerema xwe bêjin, dîya şâir Nîzamî Gencevî Kurde, yanê na?

Pey vê pirsêra ez hespê mitalan sîyar bûm çûm derketime salên, ku min mekteba navînda dixwend û çend qewmandinên ne bîrkirî ketine pêşîya min, wekî wana qal kim. Min devko derbarê pirsêda qemandinê bûyî, dîrokî şirove kir. Bila xwendevan min biborînin, wekî wekilandinbe jî hebe ezê wera bi nivîsar ronkim:

-Min Soxvoxa ser navê «28 Aprêl»-da (wê rojê, sala 1920-a li Azerbaycanê qeydê Sovêtê hatibû sazkirinê ) dixwend. Ew dibistan di wê navberîyêda yeke bi nav-deng bû. Him jî du mektebên navîn bûn. Ders him bi rûsî, him bi azerbaycanî derbaz dibûn. Wê sovxozêda azerbaycanîyara tevayî épêce rûs, usa jî hinek malên kurdên ji nefikirinê vegevê dijîn.

Min dersxana 4-da xwendinê rojekê dersdara me gote me zaran:

-Ez çûme pirtûkxana sovxoze, min navê hemû pirtûkên bona zaran nivîsiye. Ewana êpêcekin. Ezê bi we herekê navê pirtûkekê bidime nivîsarê.

Herine pirtûkxanê ser navê xwe wê pirtûkê bidine nivîsarê, hildin bînine mal, pey dersara bixûnin û hevtêkê şûnda ezê ji her yekê we binetara wê pirskim.

Sovxoze ña pirtûkxaneke mezin hebû. Têda pirtûkên sîyasî, bedewî, ulmî û yên mayîn hebûn. Min ser tema dersdarê pê avîte pirtûkxanê. Ji wê rojêda min ji pirtûkên bedewnivîsarê hizkir.

Dersdarê dît ez pirr dixûnim, şêwir da min:

-Pêşiyê serhatîyan, carna helbestan, paşê povêstan, wê şûnda romanen bixûne. Derbarê wanda şîrîn-şîrîn qal dikir.

Sala 1958-a bû. Min dersxana 9-da dixwend. Rind tê bîra min meha gulane bû. Rojekê sivdera mektebêra derbaz bûnê, min dît ber diwarê ku, timê elemeti-bangewazî tê lêdanê êpêce şagirt berav bûne, deng dane dengê hev, ci dixûnin, ci naxûnin nizanin. Ez jî hatime cem şagirtên hevalên xwe. Bangewazî-yêda hatibû nivîsarê, wekî filan rojê wê barîgeha klûba sovxoze ña pirtûkxaneyê tevî mekteba navîn rasthatinê bide derbaz kirinê.

Mijara wê jî ev bû: «Pirtûk rênîşa mirovane». Nav û paşnavê berdevokan ji hatibû nivîsarê. Ew dersdara meye wêjedar û serwêra pirtûkxanê bû.

Te qey digot mekteb hevketîye. Dersdaran, şagirtan-gışkan derbarê wê yekêda nêtên xwe, raman-xwestinê xwe dihanîne ser zar.

Rojekê-duda şûnda şarr-wareke usa kete mektebê, dersada jî derbarê rasthatinêda gilî-gotin diha-tine kirinê, şagirtan bi deha pirs didane dersdaran. Hinekan digotin ji gundên cîran jî mirovê bêne rasthatinê, hinekan jî digotin ji nehîyê, diqewime ji serbajarê rîspûblîkê- Bakûyê jî bêñ.

Rojekê jî mektebêda civîneke mezin hate der-baz kirinê. Dîrêktorê mektebê derbarê rasthatina ku, wê bê derbaz kirinê axivî. Ewî got, wekî pêwîste em rind, amedeyî wê rasthatinê bibin, ku bi rûsipî, bi serbilind bin. Ew rasthatinê mînacejinekê bê derbaz kirinê. Ewî teme da çend desdarênen serwêren dersxana, wekî şagirt wê rasthatinêda helbesta bêjin, kilaman bistirên. Dîrêktor ew jî bîr anî, ku rasthatinêda wê xelat-pêşkêşan bidine wan şagirt û mirovan yên ku gellek pirtûk xwendine.

Ew roja bê sebir hat gihîst. Klûb şûştî-mûştî bû, hatibû xemilandinê. Mirov pirr-pirr bûn. Dengê zurnê-diholê, lêdana sazan, strana aşiqan tev-hev bibû. Hinek direqisîn. Min heta naha heyte-holeke awa nedîtibû.

Werhesil... Wê êvarîyê, wê rasthatinêda hate zanînê, wekî min jî gellek pirtûkên bedewnivîsarê xwendine.

Ahmedê Hepo -----

Navê min kişandin û mîna hemûya ez jî derketime bilindcî. Xwîdanê ser minra avîtibû. Ser-wêra pirtûkxanê destê min girt û got:

-Gelî hevalno, vî şagirtê dersxana 9-a ji hemû şagirtên mektebê gellektir pirtûk xwendine. Ewê ji bêjin ewî bi rûsî daha gellek pirtûk xwendine. Em wîra dibêñ eferim û çawa xelet wêneyê Lênînê mezin û romana nivîskarê Azerbaycanêyî navdar Sûlêyman Rehîmov, ya bi navê «Şamo», didine wî.

Çepik hatine lêdanê.

Min dixwest ji bilindcîyê dakevim jineke rûs rabû got:

-Lawo, biborîne te pirtûka «Sîyarê bê serî» xwendîye? Dikarî bêjî kê ew nivîsiye?

-Min dest xweda bersîva wê da :

-Belê, min ew pirtîk xwendîye. Mayîn Rîd ew nivîsiye. Mayîn Rîd (1818-1883) nivîskarê Îngîse.

Min dîsa gav avît, wekî herim, mirovekî qemerî, por gustîl-gustîl, 35-40 salî karnîyarî min bû:

-Xorto, hela bisekine! Bêje, te pirtûka «Şûr û qelem»-ê xwendîye? Kê nivîsiye? Yek. Ya duda, wekî te xwendîye gava hakimê bajarê Gencê gazî Nîzamî dike, nava wanda ci axavtin derbaz dibe.

Weke rastîya Xwedê bêjîm, ku mehek hebû min ew pirtûk xwendibû. Ew pirtûk ewqasî xweşa min hatibû, min ew dubare xwendibû.

Min dest xweda got:

Ahmedê Hepo -----

-Pirtûka «Şûr û qelem»-ê Memmed Seîd Ordûbadî nivîsiye. Paşê min cedand wê axavtina nava hakimdar û helbestvan Nîzamîda çawa heye usa qalkim.

Ew kesê pirs da bû min rabû destên xwe hevxist, yên klûbêda rûniştî ev yek wekilandin.

Bona xwendevan bizanibe gilî-gotin derbarê çidaye, emê çend hevokan ji jîyana torîvanê romana navkişandîda binivîsin û wê axavtina dîrokî ji pirtûkê berbigirin, welgerîne Kurdî û radestî we bikin .

Memmed Seîd Ordûbadî (1872-1950) nivîskarê Azerbaycaneyî navdare. Ew xwedanê gellek efrandarîyan-romanaye. Ji karpêkên wîye here hewaskar yek jî romana dîrokî ya bi navê «Şûr û qelem»-e. Nivîskar gellek pirsara tevayî derbarê emir-jîyan, efrandarîya helbestvanê dunê eyan Nîzamî Gencevî da (1141-1209) bi zimanekî bedewnivîsarêyî şirînî dewlemendva şirovedike,qal dike.

Hakimê bajarê Gencê Emîr Înanc fermanê dide helbestvan Nîzamî Gencevî bigirin û zorê bînine huzûra wî, ji ber ku, Xwedê giravî helbestvan dijî Xelîfe, dijî memleketê derewa dide danezanê.

Nîzamî Gencevî tînîne huzûra Emir Înanc. Ew ji Nîzamî Gencevî dipirse:

- «Tu kurê kêtî?
- Kalikê min-Memmed, lê bavê min Yûsîfe.
- Bavê te çi karî dike?
- EZ zar bûme, bavê min mirîye?
- Wekî usane te tore jî dîya xwe hildaye?
- Dîya min jî gava ez zar bûme mirîye.

Ahmedê Hepo -----

- Naha stara kêda dijîyî?
- Xalên min hene. Lê ez bi stara xwe dijîm.
- Heta naha stara kêda jîyayî?
- Stara xalên xwe da.
- Ewana kîne, navêwan çinin?

-Ewana ji giregirê Kurdistanê-Kafar axa, Abdûlla axa û Sêyfeddin axanin.

- Naha ewana ci karî dikin?
- Ewana ne li virin. Li Bexdadê dijîn.
- Ci karî dikin?
- Serokên destêna parastina taybetî yê Xelîfenin.

-Gava xalên te qûlê Xelîfene here aminin, lê tu çima dijî Xelîfe diaxivî?

-Xalên min ne qûlêna Xelîfenin. Ne dundana dîya min, ne dundana bavê minda qûl tunebûye. Ne ku xalên min stara Xelîfeda, lê Xelîfe bi xwe stara şûrêna xalên minda dijî» .

... Vira, wê mîvandarîyêda ser, qewmandinekê jî vekir!

Rojekê bikar çûme înstîtûta malhebûna gundîtiyê, ya Bakûyê

Em kafêrekêda tevî çend dersdar û zanîyarra diaxivîn. Zanîyarekî 50-55 salî hey bala min dikisande ser xwe, lê min tê dernexist ew kîye?

Min kîngê û kêderê ew dîtiye? Gava ez rabûm ji kafêdrayê dîrkebim ew û dersdarekî dinê jî derketine sivdera înstîtûte. Me çend gava hevra gav da, lê idî min zefta xwe ne anî û berbirî wî bûm:

Ahmedê Hepo -----

-Biborînin profêsor,min tirê ez we rind nas dikim.  
Min hûn dîtine, lê nizanim kêderê em rastî hev  
hatine?

Ew dersdarê nikî me sekinî qe mecal neda got:

-Vê rêsپublikêda qe mirovê usa heye Hebîb  
Şirînovê kurd nas neke!

-Welleh, ez jî kurdim, -min gote wana.

Hebîb Şirînov herdu destêxwe danîne ser girikên  
pîlê min, ez hejandim û bi ecêb pirsî:

-Tu kurdê kêderêyî ez te nasnakim?

-Mamoste Hebîb, serpêhatî-jîyana min bi  
hevokekêva nayê serê xwe. Wekî ez bêjim ez kurdê  
Tirkîyayême, qe nizanim wê rastbe, bêjim ji Ermenîs-  
tanême wê derewbe, bêjim ji Qırqistanême wê qelpbe,  
bêjim ji Azerbaycanême wê çewtbe.

Çavên vî kiranemêrî yêngir daha jî gir bûn, ew  
kete milê min em tevayî pêpelûkên îstîtûtêra daketine  
jêrê û derketine derva.

-Kek Ahmed,-mamoste Hebîb berbirî min bû, -  
hetanî ez her alî tera nebim nas, ez te bernadim. Baxê  
ser navê Sabîr da çayxane heye, em herin rûnêhim  
çayê vexwin, him hevra rind bibine nas! (Mirze  
Elekber Sabîr(1862-1911) helbestvanê Azerbaycanêyi  
satirîke).

Em hatine çayxanê, pêşberî hev rûniştin, mera çay  
anîn.

Ewî stekana bi zirîya ber min hilda tijî çay kir û  
mîna mirovekî bê sebir kîlimî:

-Birao, de bêje, bêje min binihêrim, tu ji ku hatî?

Min bixasta û nexasta pêwîstbû vî camêrîra ji jîyana xwe çend hevokan bêjim:

-Kek Hebîb, dê-bavê min sala 1926-a ji Kurdistanâ Tirkî yayê hatine Ermenistanê. Sala 1937-a malbeta me tevî bi hezaran malbetên kurdan ji Ermenistanê hatine nefîkirinê.

Em weke 10 sala li rêspûblîka Qirqistanê nefîkirnêda mane, sala 1947-a vegerîne, ku herine Ermenîmtanê, lê em gîhîştinê Azerbaycanê, hukumetê nehîst em herine wira. Em Azerbaycanêda man.

Em kurdêji nefîkirinê vegerî nava çend nehîya da-nava nehîya Yêvlaxê, Kasim-Îsmaîlovê, Xanlarê, Samûxê û yên mayînda cî war kirin.

Min li nehîya Yêvlaxê, savxoza ser navê «28 Aprêlê» dersxana 10 xilaz kir û çûm Êrêvanê însîtûtêda hatime pejirandinê. Wira hetanî destpêbûna sala 1970-a rojnama «Rya teze»-da xebitîm. Eva nêzîkî salekêye min bar kirîye Bakûyê. Naha hûn bi xwe bêjin ez ji kume?

Ew ji ser rûniştonokê rabû, bi desmala destê xweva xûdana enîya xwe paqîş kir û derbazî alîyê min bû, dest avîte min, ez cîyê rûnişti rakirim û mîna xerî-bê çend salan, ez qayîm-qayîm hemêz kirim û bi dengekî bilind got:

-Tu kurdî! Tu ji Kurdistanêyi! Kurdistanâ heyî, ez mirî, tu sax, ewê esse bê dasekinandinê!

Em derbaz bûn, her yek me cîyê xweda rûnişt.

Ahmedê Hepo -

Hebîb Şîrînov ketibû ramanên kûr. Ewî bi destê xwe enîya xwe fire mizdida û nişkêva bi şabûn berê xwe da min:

-Te çendê salê li nehîya Yêvlaxê, sovxozevêda dersxana deha xilaz kirîye?

-Min li wir bahara sala 1959-a dersxana deha kuta kirîye.

-Deh-danzdeh sala berê cara yekem ez çûme wê sovxoze. Li wir pirtûkxanê tevî mektebê rasthatin dida derbaz kirinê.

Min qe nehîst ew nêta xwe bîne sêrî, îcar ez ji cîyê xwe rabûm û min kire qirînî:

-Mamoste Hebîb, min naха tu naskirî, te wê rasthatinêda ji romana «Şûr û qelem» -ê pirs da min.

-Belê, min derbarê helbestvanê navdarda, yê ku dîya wî kurde, Nîzamî Gencevîda pirsî. Me careke mayîn mîna bira hev hemêz kir.

Hebîb Şîrînov ji ku bû û kî bû?

Ew ji nehîya Kûbatlîyê, ulumdarê ulmê aborîyê bû. Di nava civakîya Azerbaycanêda miovekî birêz, qedirbilind bû. Bi dil-can, bi rûhê xweva kurd bû. Wê rojêda me hevra dostî-biratî kir. Wîra girêdayî ezê qewmandinekê jî qalkim, ronkime ser kaxez.

Ji wê rasthatina me sal derbaz bibûn. Hogirekî me dîsêrtasîya parastibû û em beştarî bezm-zîyafetê bibûn. Hebîb Şîrînov tamede bû. Ewî awa dest bi axavtina xwe kir:

-Hevalno, hûn gişk rind zanin ez kurdim. Hemû dewat-şayîyada kêderê min dijbêrin tamede, badenoş-

Ahmedê Hepo

tosteke mine ewlîn heye ewê dibêjim. Naha jî ezê ewê badenoşa xwe bêjim, paşê bême ser xwestin-meremên dinê.

Min daye peyitandinê, wekî Xwedê jî, pêyxem-ber jî timê piştovanê Kurdan bûne. Eva yek. Ya duda: Raveya derbarê kurdanda ya bi kurt awaye: «Gerdûnêra aşitî û çand anîyara gotine Kurd».

Hinek bi wî kenîyan, hinekan serê xew kirine ber xwe.

Rehma xwedê li wî be.

... Du-sê rojan şûnda rojnama nehîyê «Yêvlaxa nûh», ya bi dorê ronahî dît. Du rûpêlê wê derbarê rasthatina pirtûkxanê û mektebêda bû. Gotareke cuda derbarê min da hatibû nivîsarê, wêneyê min jî dabûn, bin wênedâ nivîsbûn: «Şagirtê dersxana 9-a Apîyêv Ehmed Hepo oxlû».

Ji wê rasthatinê du meha zêdetir wede derbaz bibû. Rojekê dîrêktorê mektebê gazî min kir:

-Lawo, jî parwelatê Xabarovskîyê (Rûsîya) namek mera nivîsîne. Derbarê teda, malbeta weda dipirsin, -ewî awa got, -û name da min.

Paşê serda zêde kir:

-Namê bibe, dê-bavê xwera bixûne, diqewime ew mirovên nefikirî qewm-pismamên wenin.

Rastî min qe tiştek derz ne kir û nama sêquncik hilda û ji oda dîrêktor derketim.

Name him bi rûsî, him bi azerbaycanî, him bi herfîn latînîya Kurden Rewanê, him jî bi sê dest-nivîsara hatibû nivîsarê. Bi rûsî yekî, bi azerbaycanî

Ahmedê Hepo -----

yekî, bi kurdî jî yekî nivîsî bû. Ji destnivîsara rûsî min femkir, hejmara rojnama nehîya Yêvlaxêye ku derbare minda gotar nivîsiye, wêne min têda ronahî dîtîye ketîye destê wan. Çawa ? Cîranê wan jî, ji Yêvlaxê hatîne nefikirinê, wana wanra pasîlke (qutîy) şandî bûne. Hinek tişt nava wê rojmameyêda pêcandibûne.

Wê wêda nameyêda navê 10-15 mirovan hatibû kişandinê. Wê rezêda navê Mîrze jî hebû.

Berî her tiştî evê namê dayîka mine hizkirî, dayîka mine, ku qe hêşirê berê çavan ziha ne dibû, anî hişsewdayê min. Dayîka min ji hemû zarên xwe hizdikir, lê minra daha şîrîn û nêzîk bû. Çendekê berê, berî hatina vê namê, ez û ewa malda tenê bûn. Min nihêrî xwerek dipêje, him jî dengê wêyî şîndar kete guhê min. Ez hatime bal wê, ewa hemêz kir. Ewê xwest hêşirê xwe paqîşke, ji min veşêre, lê dereng bû. Min mîna zarokên bistan mêtî, devê xwe kire vî çavî, wî çavî wê mêt, hêşirên wê daqurtand.

Dibên, xwedêgiravî, hêşir şorin, lê bi hemû sondên evra sond duxum, eva pêncî salî zêdetire tem-lemşîrînaya wan hêşiran hê ji devê min neçûye.

Wê gavê min ji wê pirsî:

-Dayê can, dayê, çîma tu hey kere-ker digirî?

-Lawo, -ewê destê min girt got, -were em herine xanîyê dinêda rûnên, ezê derdê xwe yeko-yeko tera bêjim. Tu şukur îdî xortî, hemû tiştî bîra xweda xayîke, tu jî ewledêن xwera qalke.

Çawa ewê got, em derbazî oda dinê bûn. Ser kulavê raxistî rûniştin.

-Lawo, -ewê bi dengekî heyr-hejmekar, -dest bi derdê xwe kir. Tu ji min dipirsî çima digirîm? Bêjim. 15-16 salîya xweda çûme mîr, em li wî alî Erez, li bereka Agirîyê hatine vê kambaxa Sovêtê. Destê min heta-hetayê ji dê-bavê, ji xûşk-birê bû. Keçikeke minê 5 salî kete tendûrê şewitî, mir. Em hatine sûrgûnkirinê... Kurê minî 18 salî Xidirê minî-zerîn, satircemî bû mir. Em ji sûrgûniyê vegevîn. Vira, nehîya Yêvlaxê, gundê Malbinesiyê mala kurapên min, Mîrzeyê weke çiyakî dijîyan. Min bîna hemû qewim-pismam, dilşewitîya ji wî hildida. Eva çend salin em qe nizanin ew kuda sûrgûn kirine.

Dîya minê hê dîsa derdê xwe binijanda derva gazî wê kirin. Ewê hesirê xwe paqîş kir, rabû here, hate rûyê min, dîsa kîlimî:

-Lawo, pey van derdara çima ez kevirim nehelim, negirîm!

Naha, gava name destê min da bû, wê da navê Mîrze jî heye, min xwest xwe zû bighînme mal. Diqewime ev name bibe mizginî, ew Mîrzeyê namêda navkişandî, Mîrzeyê kurapê dîya mine.

Ez sovxozêda hemjîyînxanêda dimam. Malên me weke 5 km dûrî sovxozê, fîrma heywînda dixebeitîn.

Ez hevtê carekê roja ledê diçûme mal. Min name stendinê sêsem bû. Dîrêkorê mektebê destûr da min û min hema wê rojê pey dersara berê xwe da mal, çûm.

Ez gihîstinê fêrmê idî tarî bû. Pez-dewarê fêrmê zûva hatibûne mexel û guharê. Çelek-pez hatibûne dotinê, ne kalîna berxan bû, ne ore-ora golikan bû. Car-cara seyên fêrmê diewitîyan.

Bintara malara çemekî avê dikişîya. Ez gihîştîme ber çêm û min xwest banzdim sera dîerbaz bim, kelban êrişî min kirin. Min navê her yekî kişand, ewana paşa vegeîn. Lê birê minî ji min mezintir-Fetî jî xwe gîhande min. Ew çav min ketinê şas ma. Zû pirsî:

-Birao, te bi xêre?

-Şukur xêre.

-De were, were. Yeqîn tiştek qewmîye tu hatî.

Ewî awa got, nêzîkî min bû hate rûyê min, dîsa pirsî:

-Na, yeqîn tiştek heyen, yanê na,tu iro, nedihatî. Ne tu qe naxwezî ji dersa bimînî.

Min dengê xwe nekir. Ez ketibûme nava hewar-gazîyê! Çawa bêjim name hatîye. Nama çî? Kê şandîye? Ji ku şandine?

-Birao, -min berê xwe da wî,-ez bona pirseke xêrê hatime, em herine mal.

Çi nuquṭî dilê wî nizanim, ew kete pêşîya min û da gava, ez jî paşa nemam. Em herdu hevra ketine hundur. Hemû endamên malbeta me mal bûn. Ji hatina min, ji gişka gelletir dîya min nerehet bû.

Ji her alîda pirs ser min da barandin:

-Te xêre?

-Çi qewimîye?

-Çima rengê te hatîye guhastinê?

Ahmedê Hepo -----

-Diqewime tu ji mektebê derxistine?

Birê minî mezin Pervan rabû hat milê min girt û berê xwe da hemûya:

-Canim bihêlin, bila tifalî bê rûnê, hinekî bîna xwe bistîne. Pêparê Ahmed timê bi xêr bûye.

Ewî ez anîm fêza gişka dame rûnişstandinê û gote jina xwe, bûka malêye mezin:

-Lêlê, Gulperîyê, rabe şerbike dew bide Ahmed, ew rê hatîye, peya hatîye. Gulperîyê wê deqîqê rabû çû şerbike dew anî dirêjî min kir û te qey digot tiştek hatîye sere min, ber dilê minda hat:

-Birao,hilde dew vexwe! Çi bûye, bûye çîma usa xwe feqîr dikî! Ne şukur tu îdî mîrê bi simêlî.

Min dew vexwar. Rastî jî bîn hate ber min, hemdê min fire bû. Min nihêrî hinekî jî awa derbazbe, hezar nêtêن qenc-xirab derkebine holê. Lema jî mîna mezinekî berê xwe da gişka:

-Hinekî sebirkin! Ez hatime mizginîyê bidime dîya xwe!

Paşê rabûme ser xwe. Dayîk hinekî ji min wêdatir rûniştibû, çû ewa anî kêleka xwe, da rûnişstandinê.

Gişk-zûrbûn li min nihêrîn.

-Dayê can, -min destêن xwe ustuyê wêra bir û got, -binê negirî,ezê tiştekî pirr ferz bêjim.

-Bêje, bêje, ez heyran! Çîma şukur ci bûye bigirîm.

Rastî min nizanibû çawa dest axavtinê bikim. Min tê derxist sebira gişkan teng bûye. Awa dereve hatim:

Ahmedê Hepo -----

-Îro, dîrêktorê mektebê gazî min kir û namek da min. Name ji parwelatê Xabarovskê, ji mala Mîrzeyê xalê me, kurapê dîya min hatîye.

Hê gilî devê minda bû dîya min kire qîrînî, girîya, bavê min jûnîyên xwe kuta, yên mayîn deng dane dengê hev. Nişkêva bîna dîya min çikîya, xize-xiz kete gewirîyê, xweva çû. Zû av anîn rûyê wê reşandin, min destêن xwe ber serê wêra bir.

Pey avêra ewê çavêن xwe vekir û bi hewalekî dijwar kêlimî:

-Hepo, gidîyo ,rabe derkebe derva berê xwe bide qulbê, destêن xwe berbi Xwedê qulozke, qurbanekê bêje!

Bavê min mîna xortekî çar û deh salî xwe avîte derva. Êmê çend deqîqa şûnda vegevê, hat ser dîya minra sekinî û bi heyr got:

-Gulustanê, cindîyê, rabe ser xwe! Gava min berê xwe da qulbê,destê xwe dirêjî Xaliqê jorîn kir,qurban got, ji ersê esmîn, qelfe-pêwir derketin û rast hatin ser serê min sekinîn. Zanî wê weşê çi hate ber çavê min. Roja dewata me, tu derê malê peyabûnê, bir-berê kofîya te. Ez serê zarakim destê meyê bigihîje Mîrzeyê zerîn!

-Şukur!

Dîsa gişkan çavêن xwe kuta min. Min derz kir, wekî idî deme namê derxim bixûnin. Min name da destê xwe, dîya, min ji cîyê xwe rabû, name usa ji destê min revand, qe ez haj ji xwe nebûm. Ewê name

Ahmedê Hepo .....  
çend cara paçkir, danî ser çavêن xwe û bi şewata salan  
got:

-Ax, tilî-pêçiyê Mîrze vê namê ketîye!  
Ewê careke dinê name dirêjî min kir:  
-Ahmedo, lawo, xwedê te timê şake, de zû bixûne,  
ka binêñ birîndarê mala bavê min ci nivîsiye?

Min name vekir alîyê bi rûsî xwend û wergerand,  
paşê alîyê bi Azerbaycanî xwend. Min nivîsara bi  
kurdî nikaribû bixwenda. Pervanê birê min berî  
nefikirinê têxnikûma kurdan ya li Rewanêda  
xwendibû, ewî ew çend hevokên bi kurdî xwend.

Hê zarotiyêda min zanibû Êrêvanêra dibêjin-  
Rewan.

Dayê tu dêranbî, bavo tu belengazbî! Wana deng  
dane dengê hev gerandin. Keç-bük jî tevî wan bûn.

Hey-way! Te digot hinekan qest-qerezî hewar-gazî  
li wan çend malêñ qewim-lêzima daxistin, biçük-  
mezinava kişîyane ser me.

Li zozanê, min gellek cara dîtibû, çawa telte ewir ji  
wî alî, teltek ji vî alî dihatin digihîştine hev, dibû  
gure-gur, qırçe-qırça wana, yan baran dibarî, yanê  
zîpik. Lê ev dîdemâ mala me ne baran bû, ne zîpik bû,  
ne erdhej bû!

Dero-derbûn, girtin-nefikirin, tîbûn-birçîbûn,  
hesreta cî-warêñ hizkirî, ya qewm-lêzim-pismaman,  
erê bavo, zulma-salan bû.

Min ew jî dîtibû pey hevetina ewran, lêkirina  
baranê, lêdana zîpikêra xweza dibû heftrengeke xêlîya  
bûkê, keskesorê ji vî serê çiyê, davîte sere çiyayê

dûrî-dûr. A, usa xêlekî şûnda seqirîyê mala me hingavt. Bûka malê rabû av tijî misin kir, keçika malê rabû teyşt anî, pêjgîr avîte ser milê xwe, av destê mezina da kir, wana rûyê xwe jî avreşîn kirin, bi pêjgîrêva paqîs kirin û hinekî hêmîn bûn.

Usa bibû, te qey digot, tu kesî dil nedikir biaxive. Weşeke xurt awa derbaz bû. Bavê min serê xwe bilind kir û her mirovê vira ber çavên xwera derbaz kir, kîlimî:

-Ahmed lawo, ji girî tu tişt hasil nabe. Rabe qelem-defterekê hilde namekê binivîse.

Min wê deqîqê rabû, çawa wî goti, qelem-defter hilda û rex bavê xwe rûniştîm.

-Lawo, -bavê min dîsa axivî,-namê him bi rûsî, him bi azerbaycanî binivîse. Bila Pervan jî bi kurdî binivîse.

Bavo qurban,namê nivîsandinê hetanî nîvê şevê wêdatir kişand. Bavê min nêt, xwestina xwe got min nivîsî, îcar jî dayîka min destpê kir.

-Hela binivîse binê kî saxe,kî mirîye, ji cîwana kî zewicîye, kî ezepe? Çend nevîyê Mîrze hene? Doşanîyê wana hene?...

Pirs, pey pirsan, dihate rêzê, rûpêlê defterê pey rûpêlan dihatine reşevekirinê. Paşê yekî digot awa binivîse, yê dinê digot na, awa binivîse.

Name dirêj-dirêj mîna çîrokekê hate nivîsarê, nîvbelgên deftera 24 rûpêlî zêdetir hate nivîsarê.

Wê şevê kî raza, çawa ketine xewê ewê Xwedê zane, lê hê kew ketibû erd-esmîn, min rabû

Ahmedê Hepo -----

name,nanekî tendûrê kire tevî defter-kitêbên xweye dersan û berê xwe da mektebê. Her tenê dayîk bi çûyîna min hesîya.

-Dayê, ezê herime mektebê, nerehet nebin, ezê namê ji sovxozi bişînim. Rêva ez hatime ser wê birîyarê, pey dersanra, rûnêm namê bi kurt, nûva binivîsim. Min usa jî kir. Û name şand.

Ew mehekê zêdetir bû em gişk bê sebir hîviya bersîva namê bûn. Çawa min jorê wera anîbû ser zara, ez hevtê carekê diçûme mal,her ku çûnê mal dîya min êpêce rê dukuta pêş minva dihat. Me bi çavan hev fem dikir, bi çavan «dixivî», wekî hê bersîva namê tune.

Rastiyê bêjîm pirsên dersan, xwendina wana alîkî bû, name jî alîkî bû. Ewa ji hiş-sewda, bîra min ne diçû. Namebira sovxozi jî idî nerehet bû. Gava ewê ez dûrva didîtim wê weşê destê xwe hewayêda vîrda, -wêda ba dikir, yanê ku name tune.

Dîsa hevtêk, dudu derbaz bûn. Bavê min, birê minî mezin kere-ker digotine min, wekî eva hukumeta Sovêtê kêwrîşkê bi erebê digire. Yeqîn namên ku mirovîn nefikirîra şandînê dibin, vedikin, dixûnin, diben ka binê dijî hukumetê ci hatîye nivîsarê?

Ger tiştekî usa hebe diqewime serêşanê bidine me. Tirsa me ew tirse-Ahmed lawo, Xwedê nekirî te ji mektebê derxin. Wekî nişkêva gazî te bikin, ci dipirsin, bê min fem nekirîye nivîsiye.

Carna jî digotitn diqewieme te adrêş (navnîşan) rind nenivîsiye, name neghîştîye wana. Warêñ em careke maîyn binivîsin, lê rojekê... Xwezila wê rojê...

Navbera dersan bû. Şagirtan çi dikirin nizanim, min xwe dabû ber roderê û derva dinihêrî. Namebir wêda dihat. Min kire qîrînî, revîm derketime derva, namebirê mîna dayîka ewledê xwe undakirî ez hemêz kirim. Ewê bi şabûneke mezin nameke sêqunc da û got:

-Xorto, çavê te ronbe. Eva çend deqîqeye name hatîye poçtê. De çavêñ te jî, çavêñ me jî ronbe ez çûm, karê min gelleke.

Ewa çû. Lê ez cîyê xweda qerimîbûm. Lipitandin bi min ne dibû. Zengilê mektebê ez ji cî leqandim. Min xwest namê vekim, bixûnim. Hema vê gavê parava dengê dîrêkторê mektebê li min tesele bû:

-Ez jî şame te bersîva namê stendîye. De mesekine, here mizginîyê bibe!

Welleh, ba sekinî, ez ne sekinîm. Min rîya malê da ber xwe. Rêda hate hişê min bisekinim namê bixûnim. Min name vekir, lê nesekinîm, him rê diçûm, him dixwend.

Ya sereke namêda nivîsîbûn, wekî sala 1923-a, gava malbetên me ji Ermîstanê koçberî Azerbaycanê kirinê-em 25 kes bûn. Sala 1947-a em sûrgûn-kirinê 20-kes bûn, naha ji me 6 kes mane. Sedemê mirina mirovan birçîbûn û hewa vira li me nehat. Vira lêyî, herireşk, hezek, mês-mozêñ jerdadayî bûne bayîsê her mirovekî me. Filan, filankes ji nezanîya

Ahmedê Hepo -----  
xwe ketine hezekê, noq bûn mirin, mês-mozan hinek  
jerdadayî kirin. Naha em 6 kes mane, destûr dane, kî  
vedigere cîyê xwe, bila vegere.

Lê sitara me tiştekî tune. Dikarin mera hinek dirav  
bişînin, em pê bê... .

Aloşeke usa hate min, hizir kir kezev-pişikên min  
dane ber kêreke ko, ne jêdikin, ne diqetînin, ne duqo-  
sînin. Min rind tê derxist êş, jan, lerizandin di  
hundurê min da hevalîyane, mîna gûzanê tûj hûrik –  
hûrik hûr dîkin.

Nêfîyêñ bê war, ji «nefiwara» alîkarî dixwestin, bê  
sitaran ji «sitarwara» war dixwestin. Nexweşê ber  
mirinê, ji nexweşen salan tendurstî dixwestin.

Name stendin, bi taybetî bona malbeta me, qewm-  
pismaman him bû şîn, him bû şayı. Min li mal name  
xwendinê dîya min girîya, jinê dora wê pêra hêşir  
barandin, bavê min, mîrên mayîn kewgirî bûn, kirine  
ofe-of, axe-ax! Ser namê hey gotin-bilandin, hildan-  
danîn, çendî-çend nêt anîne ser zara, rê ji rîya bijartin,  
dest avîtine tîvdîra...

Dawîyêda hatine ser wê nêtê çend heywanê heyî  
bibin bifroşin, li Qırqistanê jî kurapê Mîrze, wêlîyêñ  
wî hene, wanara jî naman binivîsin, ji wan jî alîkarîyê  
bixwazin, wekî zûtirekê wanra dirav bişînin û ewana  
bikaribin bê...

Vê carê nameke kurt ser navê Mîrze hate nivîsarê,  
yek ser qewm-lêzîmê Qırqistanêra hate şandinê.

Pey van gişkara bavê min, ji pismamê meyi dengbêj hîvîkir kilameke sîyara bêje. Sewta kilama «Îsmayîl Axa» gişk seqirandin.

De li min, de li min, de li min...

De dayê, dêranê, şereke li me qewmîye.

Çarîya kavil wê li berwarê.

Eskerê Elîhêyder paşa giran bû.

Vê şevê bulîk-bulîk, taxbûr-taxbûr,

Kişîya xwe da çiyayê Gulîzerê...

Pey kilamêra bi gotina ahala cîwana, keç-bûkan govend girtin, duda stra, duda li wan vegerand. Şev ji şevê derbaz kirin.

Sal hatin derbaz bûn, min hê tê derxist, wekî çîma ev gel ewqasî hatîye zêrandinê, hatîye nefî-kirinê, dero-der kirinê, kuştinê, lê tu dema ber dujmin serê xwe xarnekirîye û ji holê nehatîye rakirinê. Ruhekî usa nava ruhê vî gelîda heye, ew qe nayê şkestinê, ziman ewqasî şîrîn-dewlemende nayê bîr kirinê, hemû qewmandinên qewimî bûne miqam, kilam, sazbendî. Ev gişk, meh bi meh, sal bi sal, sedsal bi sedsalanva hev alîyane, bûne parezgehê her kurdekkî.

... Nama duda hate şandinê! Dîsa çav li rê-dirba, guh li ser deng-hesa bû. Roj derbaz dibûn, lê xem, xemxurî kêm nedibûn, zêde dibûn. Wan çend malên qewim-lêzimên dora me, herekê pezek-dudu çawa alîkarî dabûne bavê min. Rojeke ledê bavê min bi alîkarîya lawikan neh-deh pez derxiste sûka heywan firotanê. Digotin bi wî diravî ew mirovanan nikarin

Ahmedê Hepo -----

bên derêne Azerbaycanê. Çawa bavê min digot, idî karek jî tune, bibî bifroşî.

Lê rojekê ji Qirqistanê birazîyê apê Mîrze hat derkete mala me. Hatina wî bû şayîke mezin, bû sedemê kêmkirina xemxurîya nefikiran-hêsîrên li Xabarovskê. Diravê wî anî, diravê me qewim-lêziman dane ser hev û ser navê Mîrze şandin.

Me hemûyan roj dijmîrîn. Mezin gişk şev bi ofeof, axe-ax, çawa bavê min digot, bi kulzikî radizan, lê sibê ronbûnê hetanî êvara dereng bi bawerî dijîyan. Yek wêda hatinê çûk-mezin derdiketine derva, hey mîze dikirin, hetanî nêzîkva dinihêrîn têderdixistin ew kîye, hê hinek diketine mal, hinek karêñ xweva mijûl dibûn.

Ev rojêñ hese-hesê, wese-wesê bûn. Çav li rîya dîqerimîn, guh li ser denga dixitimîn, dêm geh vedibûn, geh reş diqemilîn. Vê rewşa mîna heşirmeşirê sê meha zêdetir kişand, bahar derbaz bû, havîn hat û qije-qija rojêñ havînêye germ bûn.

Mêvanê ji Qirqistanê ew çend roj bûn bi şîn-girî, bi rojres vegerî çû, hinek malêñ me jî çûbüne zozanê. Min jî dersxana neha xilazkiribû, derbazî ya deha bibûm. Ez jî li zozanê bûm. Dawîya rojêñ meha tebaxê ez hatime sovxoze. Wan salan mektebê bi xwe kitêbêñ dersa didane hinek şagirtan. Navê min jî nava wan hinek şagirtan da bû. Min hemû kitêbêñ bona dersan stendibû, oda hemjîyînxanêda, ya ku ez têda dimam, beravî ser hev kiri bû, mîna tiştekî bi hêja, wanra şadibûm, vê gavê namebirê usa xwe avîte

Ahmedê Hepo -----  
hundur, te tirê hinek pey wê ketine. Dest ustuyê minra  
bir û bi şabûn got:

-Mizginîya min bide qewmên te, ji sûrgûnê hatine.  
Ewana ber avayê poçtêne!

Min qe tiştek ne got, ji nava destêن namebirê  
derketim û ber bi avayê poçtê revîm. Hindik mabû  
bigihîjm wî avayî min sere xwe bilind kir nihêrî, çend  
mirov ber wî dîwarî sekinîne. Min dîsa ew ber çavêن  
xwera derbaz kirin, nişkêva,qest-qerezî,deremê pîyêن  
min tevizîn, lipitandin bi min nebû. Bavo qurban,min  
hêz da xwe, tiştek dermeket, min xwest biqîrim bêjim:

- Xalê Mîrze, ez Ahmedê Hepoyê Bedome!

Gewrî li min zaha bû, ziman li min lal bibû. Wana  
li min dinihêrîn, min li wana. Yeqîn wan feqîra  
nizanibûn ez kîme, lema ber bi min ne dihatin, min  
zanibû ew kîne, lê vê weşê xiroşekê, tirseke usa ez  
nava xweda pêçan dibû min hew dizanibû, ez pêşa  
gavan bavêjim, ewanayê ji ber çavê min tabin,  
minêbin. Her tişt wêda bisekine, lê dayîka mîne  
dêranê wê ji mîn pirsneke:

-Kanê Mîrzeyê zerîn? Te çima malxalêن xwera  
xayîntî, bêbextî kir? Alîyê dinêda jî germa havînê ji  
ser min çû, sur-sermê ez hingavtim, lerizîm.

Min nizanibû evê rewşê wê çiqasî bikişanda,  
wekî namebirê xwe minra negihanda, destê min  
negirta û bi dengekî qayîm negota:

-Çima sekinîyî? Çima şerm dikî? Ew mirovêن ber  
dîwîr yên ji Xabarovskê hatine!

Kesek tune bû vê dayîkêra bigota:

-Ez çîma şerm bikim! Bila ew kesana şermkin, bila ew kesana erdêda herine xarê, bila reheyê wan li wan biqele, birize yên ku ferman dane, ev mirovên belengaz yê, ku nizanin destê wanî çepê, destê rastê kîjane, şandine rîya hate-nehatê! Çîma? Çawa çîma-dibêن, wekî ev kesana nehatana nefikirinê, wê dewleta Sovêtêye, ya ku beqî xwîna bi mîlyona mirovan zorê hatîye damezirandinê, wê hûr-xweşkirina, wê ew welgerandana, ji wana yekê dewsâ xwînrêt Lênîn bigirta, yekê dewsâ qetikkar Stalîn bigirta, yekê dewsâ rûvî-mal wêran Mîkoyan bigirta. Welleh nizanim wana wê çi bikira, çi nekira? Digotin van kesan wê pilekan çêkirana biçûyana bal Xwedê, wekî ser sazmana Yektîya Sovêtêda agir bibarîne...

Namebirê dît tevgerî bi min nabe, berê xwe da mirovên ku ber dîwêr sekinîbûn:

-Ay басы-姜达什lar, siz дейян Ешмяд bu оъландыр! (Ey xûşk-birano, ew Ahmedê hûn dibêن, ev kurike).

Hê gili ji devê namebirê derket bû, wan mirovan ber bi min gav dan. Paşê deng dane dengê hev, herekê tiştek anî ser zaran:

-Weylâ min dêranê! Pî, ez qurbana xerîbê mala bavê xweme! Heyrana bejina teye kinik, ça were bal xalê xwe! Delalo, were bal min, bîna metê ji te tê!

Ew jinek, keçikek û çar mîr bûn. Wana usa ez hemêz kiribûm, hindik mabû bîna min biçike, hev dev

Ahmedê Hepo -----  
didan, ez virda-wêda dikişandim. Vê rewşê êpêcekî  
kişand.

Nişkêva dengekî bi barê derd-kulan awaz kirî li  
me hemûya tesele bû:

-Xwedê xérke, çîye, hûn ji tifalî çi dixwezin!  
Wêda vekişin, em hev fem kin!

Destxweda gişk gavekê-duda paşa vekişîyan. Min  
xalê Mîrze naskir. Min gellekî wêneyê wî mêze  
kiribû. Ez nêzîkî wî bûm, hatime destâ:

- Xalê Mîrze,-min bi kelogirî got, - xalê Mîrze,  
hûn gişk ser sera, ser çava hatine. Hûn vira bisekinin,  
ez herim, binêm avtokê dikarim peydakim, bêm em  
herine mal.

Pirsa avtoyê zû safî bû. Xalê Mîrze bal avtoajo  
sîyar bû, em jî jorê û berbi malên me rôketin.

Rêva ewqas pirs dane min, ez ketibûme rewşa  
mirovê ji sibê hetanê êvarê bar kişandî. Nevîya xalê  
Mîrze qe çavêن xwe ji min nedikişand. Ewe bedew  
bû. Yêن hara dibêن horî-melek. Lê navê wê bi eceb  
bû-Berdîwar bû. Paşê hate zanînê kalikê wê ev nav li  
wê kirîye û gotîye:

-Ez navê wê datînim Berdîwar, bila Xwedeyê  
mezin usa hevbîne, ewladêن wê bibine xwedan dîwar.

Bintara malên me devê rêda kerîye pêz rahaş-tibû  
diçêriya. Hê dûrva min tê derxist rehmet lêbûyî apê minî  
Elo ber pêze. Dengê maşînê li wî tesele bûnê, te tirê tiştek  
nuquṭûbû dîlê wî û ew hêdî-hêdî wêda hat, xwe da ser rê.  
Hindik mabû maşîn bigihîje nêzîkaya apê min, min destê  
xwe hewayêda bakir kire qîrînî:

Ahmedê Hepo -----

-Apo, mizginîya min bide apê Mîrze wana ji Sîbîrê hatine!

Nizanim dengê min gîhişte wî, yanê jî bi bakirina destênen min her tişt seh kir, şîva destê xwe wêda avît , berê xwe da malên me qirîya:

-Warêن ha, warêن !

Paşê çepilên xwe hilda mîna xortekî 14 salî bi şabûn dor hev zivirî û ber bi maşînê revî. Ji dengê wî 9-10 seyên fêrmê deng dane dengê hev. Em gîhiştine wî, avtoajo maşin xayî kir. Hema wê deqîqê apê min û xalê Mîrze hev hemêz kirin û mirovên dinê- yeko-yeko, dudu-dudu, sisê-sisê ber bi maşîne revîn.

Ewana hev qesidîn. Mirovan nikaribû vê rasthatinê, vê dîdemê, vê nebînîyayê mêzeke. Nefî-warêن salan, derdkêşen zemîn, hesret dîtîyên dilwe-rimî û xerîbêñ xerîban hev hemêz kirin, hevalîyan, usa ser hevda bi keser, bi şewat, bi kizirî girîyan, kirine îske-îsk te hew dizanibû erd-esman gîhiştîye hev, bobelat-şipûk hev piçilkîye, jorda keviran diba-rîne.

Dûrva kê ev nebînîya jîyanê bidîta, dilê telte-telte xwîna reşva tijî bûya.

Ya here sewgirtî ew bû, wekî ev hewar-gazî, ev şîn-şayî ne dihate dawîyê. Kê wê kêra bigota bese negirî, xwe nepertîne, xwe veneçirîne, rûyê xwe neqelêş? Bedena gişkan ji rojêñ reş-heş, ji birîn-kêmê, ji derd-kulan hatibû bejinavîtinê. Belê, bila ewana ser hevda warbêñ, jîyanêda çiqas zelûlî dîtibûn bila bi hêşiran rodakin. Ez bi sondêñ dunyayê evrakim neyar-dujmin, nexwestî-çavnebarîyêñ kurdan ev yek bidîtana wê esse

Ahmedê Hepo -

---

hevra bigotana: «Em dewsa kurdan bûyana, ci ku me anîye serê wan, nîvê, nîvê wan li me biqewimîya, naha ne em hebûn, ne navê me».

Qas-qudretê Xwedêra vê gavê dengê bavê minî zîzî mîna zengîl hate bihîstinê:

-Bese! Neyaran bi me nedine kenandinê. Bi girî tiştek hasil nabe!

Paşê berê xwe da kurapê Bawer.

-Bawer lawo, hespê sîyarbe, -ewî got, -here pey Evdileyê Mirtib, bê apê minî Hepo digot, bila wira serê xwe şilke, bê vira kurke. Bila bê em şaya xwe derbaz kin.

Bawer bi rev ber bi hespê çû, em hemû dagerîne mala me.

Biçûk û mezinê wan çend malên me gişk li dora wan 6 mirovên ji xerîbiyê hatî girtibûn. Gişkan dicedand li wan binihîrin. Dîsa bavê min bi dengekî bilind got:

-Paşa vekişin, bila pismam, ezîzên me derbazî hundur bîn! Ewana rêke dûr hatine, naha tîne-birçîne.

Bavê min kete milê Mîrze, ketine pêşiyê, yên mayîn dane pey hev, wekî bêñ herine hundur. Ber pîyêñ wan qurban hate serjêkirinê.

-Lawno, keç-bûkno, - dîsa dengê bavê min hate bihîstinê, - hetanî Evdileyê Mirtib bê, govendê bigirin, bistirêñ.

Hê mîvan rûniştibûn govend hate girtinê, şen bû, bendêñ kilaman ser heyda hat, duda digot, duda vedigerand. Govend hê du-sê fitila dora hev çibû-

Ahmedê Hepo -----  
hatibû, Bawer beza hespê hat, derê malê peya bû,  
kete hundur gote bavê min:

-Apo, min rêva birê Evdilê Mirtib dît, dibê ew bi  
desta xweva çûye Qazaxê, wira dewat heye, wê sibê  
na, dusiba bê.

-De tişt nabe, here têkeve govendê, dengê te  
xweşe, kilamekê-duda bistirê.

Bawerê pismam 18-19 salîbû, wîra digotin «Gula  
govendê», dengekî xweş lê bû, him jî kilam zanibû.  
Gava ewî stra, apê Mîrze gote bavê min:

-Hepo, kurapo bihêle ez rabim govendê binihêrim,  
bila dengê kilamên kurdî têkebine guhê min.

Ewî rabû destê nevîya xwe Berdîwarê girt derkete  
derva, sergovendî Bawer bû. Xalê Mîrze bi heyr-  
hejme kar berê xwe da wî:

-Bawer lawo, heyrana dengê te bim! Berdîwar jî  
rind direqise.

Diqewime hinek pirskin Sîbîr ku, govend ku? Me  
mezina gellek cara malda kere-ker govend digirt û zar  
hînî reqesa me dikirin.

Bawer hat destê wê girt, kire govendê û qîrande  
kilama «Werdek»-ê:

Werdekî golî sorim lê, lê, lê Werdê,  
Delalî golî sorim, memik şemala şevê.

Ser golêra dimorim lê, lê, lê Werdê,  
Ber golêra dimorim, memik şemala şevê.

Xwestîya lawî pisporim lê, lê, lê Werdê,

Ahmedê Hepo --

Xwestîya lawî pisporim, memik şemala şevê.

Ez dûrva sekinîbûm û govend mîze dikir. Serê govendê dihate kîvşê, binê govendê dûr-dûr bû. Hemû zar jî direqisîn.

Min zarotiyêda govend hiz dikir. Bawer bikî min hetanî naха govendeke awaye şen nedîtibû. Naha duda hevra kilam digot, duda vedigerand, paşê dudê dinê digotin, dîsa duda ew diwekilandin. Timê govendên bê sazbend da, çar mirov distirê, lê naха heyş kilambêja deng dabûne dengê hev. Govend xweş bi xweş, reng bi reng bû. Xortî bejinbilind, namilpen, şidiyayî-şidiyayî bû, bejinêda keçike weke wî bû, enîfire, dêmqemera xwînşirîn, gulireşa şinge bi şing bû.

Govendê hey fitil-fitil dida, kilamekê dewsa yeke maîyn digirt. Evê rewşê hetanî ro çûnê ava kişand, wekî nehata ne gotana:

-De bese, gişk warêne ser destexanê, mîvan birçîne, ewê heybihata domandinê.

X            X            X

Ew çend rojbûn ez bona xatirê dilkeşten me nedîcûme mektebê. Qewm-lêzimên wan çend malamalbetan çawa dibêjin, ji hev têr nedibûn. Rasthatina wana hey bi girî, hey bi şayî derbaz dibû. Bavê min digot: «Em kurd bi çavekî şadibin, bi yekî digirîn. Usa nîbûya naха zûva dujimin em xîlaz kiribûn». Yek jî car-caran ci ku dibû xwe dikir, xwe pirs çareser dikir, digot: «Xelq jî qurbana minbe, ez bi xwe jî qurbana xwe bim».

Ahmedê Hepo -----

Sibeke mîna sibeke rojên buhurî bû. Me, endamên malbeta me û xalê Mîrze wana taştê dikir. Ser destexanê bavê min berê xwe da min:

-Ahmed lawo, -got, -mektebê bîr meke!

Dîya min berî min bersîva wî da:

-Na, kurê min ne ji wan kuraye, ewî kar-barê xwe kirîye sibê here mektebê.

-Erê, Gulistana Ûso, -bavê min got, -bila gotina te be.

Paşê serda zêde kir:

-Min îşev xewnêda dît ez ber çemê Erezim, sekinîme çîyayê Agirîyê dinihêrim.

-Hepoyê kurap, - xalê Mîrze hewal da, -av ronahîye, çîya jî deng-bese.

Hema vê weşê bû quje-quja zaran, ewte-ewta seyê meyî zincîrêda. Ez zû derketime derva, dengê dihol-zurnê gihişte guhdarîya min. Qîre-qîra zaran bû:

-Evdilê Mirtib hat! Evdilê Mirtib hat!

Qasekê şûnda dengê zurna Evdileyê Mirtib der-dor hilda, dîsa govend şen bû. Îcar jî qewm-lêzimên dinê pezek-dudu serjêkirin.

Welleh, wê rojê hetanî êvara dereng qe govend betal ne bû. Her carekê gotin, wekî sazbend çûne nîn buxun, wê zûtirekê bêñ.

Îdî êvar bû. Hemû kar-war jî hatibû kirinê. Bavê min, xalê Mîrze, Evdileyê Mirtib jorê balgî dabûne ber palên xwe rûniştibûn. Her yek wan mîna bilindcîkî dihatine kivşê. Zemîn gellek tişt ji wan stendibû, lê heyîtiya wana qube-qube bû.

Mirov pirr-pirr bûn. Destexanên nîn hatine raxistinê. Hema vê weşê pismam-cîranê me Bedir û jina wî Zozan bi ken-hen derda hatin.

Bala gişka kişande ser destê Zozanê. Destê wêda tiştek nava desmaleke sorda pêçayî bû. Ewê ew bir danî ser stêr û hat kêleka mîr rûnişt.

Bavê min çavê xwe li beştarbûya gerand û karmîyarî hemûya bû:

-Ya navê Xwedê bikin, nîn buxun!

Vê qasê camêrê Bedir kêlimî:

-Gelî birano, Hepo, Mîrze, ez û Zozan seba pirsekê hatine, bêjim paşê.

Gişka çavê hev, rûyê hev mîzekirin. Dîsa dengê bavê min hat:

-Keremke!

Bedir çokeke xwe hilda, ser ya dinê rûnişt û bi beşereke xweş got:

-Du rîdansipî, du rûspî, du rînîşzanên me bal hev rûniştine. Şukur Evdileyê bira jî vire. Min efûkin,, ezê ser pirsekê vekim. Herdu rûsipîya hevra gotin:

-Veke!

Lê bavê min serda zêde kir:

-Kurt bêje, mîvan birçîne.

-Hepoyê Bedo, -Bedir berê xwe da bavê min, -ez pismamê teme, tu rind zanî, ez tu dema rijî xeber-nadim. Kurê min Bawer, nevîya Mîrze-Berdîwar ezepin. Ez kulfeta xweva hatine xwezginîyê. Xort bi qîret, nav nîşane, keçike bedewe, rinde, bi pêşk-toreye. Wekî hûn qayîlbin, emê rabin gustîlê têkine

Ahmedê Hepo -----  
tiliya Berdîwarê. Bila Evdileyê Mirtib nîn buxwe,  
rabe qaydê «Heylo, xazginî» lêde.

Pey vê yekêra gişk ecêb man. Xalê Mîrze li rûyê  
bavê min nihêrî. Seqirtîyê usa hukum kir, te tirê  
qewmandineke ne bixêr dest daye.

Xalê Mîrze kevir avîte seqirtîyê:

-Bedir, çima usa bê tivdir, bi lez şuxul dikî. Paşê  
jî, te nikaribû hema qe na rojekê berê bigota min.  
Minê jî nêta xwe tera bigota.

-Birao, pirs hene ne hewcî şêwirêne. Bawer hema  
roja ewlin ser keçikê bûye bengî.

Xalê Mîrze pirsî:

-Lê keçik? Bihêlin em rind mitalekin!

-Gava dinê min got, Bedir rijî xebernade. Gazî  
dîya keçikêkin binê ewa ci dibêje?

Gazî Sûtê kirin. Ewê sere xwe kire ber xwe û  
kêlimî:

-Apê Mîrze, cîyê tu heyî ez ci kareme. Tu çawa  
zanî usa bike. De keçikek ya xorhekîye.

-Bêje min binê, -xalê Mîrze pirsî-, Berdîwar vê  
pirsêra ci dibêje? Te wêra hewaldaye?

-Erê, apo! Ez çawa dê şame. Şame ku em hatin  
derketine nava qewm-pismaman. Wekî em wura  
bimana keçikê yanê malda bima, yanê bibûya para  
yekî serxwes.

-Hepo, kurapo, -Mîrze dîsa kêlimî, -min ew yek  
femkir wekî gişk haj vê pirsê hene, xêni ji me.

Paşê berê xwe da Bedir:

Ahmedê Hepo -----

-Lo, pismamo, em bêjin, em rabin gotina te bikin.  
Lê erf-edet?

-Mîrzeyê kurap, Xwedê mala wî kavila kulêke, yê  
ku em dero-dero kirine. Emê dîsa edetên xwe cî bînin,  
xênî ji pirsa qeland û cêhêz. Ne hûn qelen  
bixwezin, ne jî em cêhêz.

-Qe bê cêhêz tişt dibe?

-Çima nabe. Keçik jî keçika meye, kur jî kurê  
meye. Cêhêzê bûkê li mala mine. Ji kofî, xêliya wê  
girtî hetanî solên wê, zérê ber kofiyê. bazinê  
destan, guharêñ guha, dest-dest kincêñ wê hazirin.  
Dest-dest lihêv-mitêl, fera-fotik gişk zo-zo hene. Usa  
bisanbe ez keça xwe didime mîr.

Wêli-pismam, qewm-lêzimên ku işev vira civî bûn  
anîne ser zaran, wekî emê jî destê alîkarîyê dirêjî  
cihêzê bûkê bikin, her dimîne rûsipiyêñ me bêjin:

-Xwedê xêrê bide!

Apê Mîrze bi şabûn, bi çavêñ ken xwe mukur hat:

-Ez dibêjim bila Xwedê pîrozke!

-Ez jî dibêjim Xwedê him pîrozke, him wana  
hetabke, -ev gilîyêñ bavê min bû, -nanê xwe buxun.

Pasê vegeŕ ser Evdile:

-Gelî sazbendno, nanê xwe şirîn-şirîn buxun, rabin  
şayîya me tevî mirazê kulîlkakin, bila şayîya me tevî  
dewata mebe!

Pey qasekêra dengê zurna Evdileyê Mirtib hetanî  
wedekî şevê qube-qube hat, gotin, rabin idî derenge  
belgê bûkêda kin.

Vê qasê Zozanê ew kelmelê ser stêr anî, destê Berdiwarê girt gustîl kire tilîya wê, sehet zenda wê girêda, desmala hevtrengî avîte ser serê wê, hate rûya û got:

-Bila gişk hevra-hevra bêjin-pîrozbe belga bûkê!

Ji her alî deng hate bihîstînê:

-Bila pîrozbe! Bila xêlîya bûkê qewînbe!

Paşê Bedir destê jina xwe girt, ketine govendê, pey du-sê fitla , şanî da sazbenda bisekinîn û got:

-Îdî şev ji şevê derbaz bûye, em diçine mala xwe. Hûn jî herin hêsabin. Emê sibê himekî zû bêñ. Dest bi dewatê bikin, ber xêlîya bûkê bireqisin.

Ewana çûn...

Sibê xinamî bi çend buxçava hatin. Wê deqîqê Bedir xwe gihande Evdileyê Mirtib:

-Birao, lêde bila vê sibê dengê zurna te here erşê esmîn, bila mizgîniya xêrê bigihîje cî-warê me! Bila cîwan bireqisin, em jî têkevine odê, bila jin bejina bûkê bixemilînin, bila bûk-zava têkebine ser govendê, apê teyê jî şabaşê bide.

x

x

x

Xûşk-birano wê mîvandarîyê hetanî danê êvarê kişand. Belê, ew mîvandarî bû sedemê servekirina épêce bîranîna. Ew bîranîn ne yê min tenê bûn, ew yê dîrokê bûn. Xwedê xêr xwezarabe, wekî ez dewatî vê mîvandarîyê kirim.

Ahmedê Hepo

Gava me hemû mîvana wê malêra xêr-bereket, hetabî, rojên bi serfiniyaz xwest û derketin herine mal-halê xwe, rîya mine sibê, ya berbi Azerbaycanê, rîya rîwîyê bê mal ber çavêن min dirêj bû, kuda diçû, min tê dernexist?...

x

x

x

Xwendevanêن hêja! Min vê povêst-bîranîna «Rîwîyê bê mal»-da çi dît, çi nedît, çi nivîsî, çi nenivîsî, Xwedê dizane!

Dawîyêda dixwezim bêjim bi tomerî pirtûk kana zanebûnêye, rîya şemale, sebira mezine, toreye, edlayî-aşitîye, erf-edete, zimane, çande-dîroke.

Wekî ji van qenderêن jorgotî xwendevan di vê pirtûkêda rastî yekê, duda bê, zindîbim, yanê jî mirîbim, ezê xwe ruhşa bişefinim.

# RİŞİYÊN ZEMÎN

## XWENDEVANÊN BÎ RÛMET!

Xenî ji efrandarîya bedewnivîsarê (serpêhatî, povêst, roman) min çawa rojnamevan, salê dirêj çapemeniyêda karkirîye, bûme berpirsiyarê rojnameya «Dengê Kurd», serwêrê bernama bi zimanê kurd ya têlê radioya Dewleta Azerbaycanê, çawa tevgelê heqîneheqîya zemanê xwe êpêce gotar, oçerk, bîranîn û qewmandinên bûyî nivîsîne.

Gava wede derbaz dibe, tu ku wana didî ber destêxwe, careke mayîn dixûnî, dinihêrî nava wanda yên usa hatine efrandin-xuliqandinê ewana hêjayî parastina heta-hetayêne. Dinihêrî ewana daxweza rojevêra hatine nivîsarê, derketine holê û bûne rişiyêñ zemîn. Salê bêñ derbazbin ewê bibine rişiyêñ dîrokê.

Lema jî me birîyar kir ji wan rişiyêñ zemîn, yên ku vir, wir hatine weşandinê, bi têlê êfirê hatine dayînê, bela kirinê hinekan ji undabûnê bidine xilazkirin û wana çawa beşeke cuda bidine weşandinê. Me navê wê beşê jî navkir «Rişiyêñ zemîn».

Dawîya pirtûkêda me helbest-rastsereke ulumdar, kurdzan, nivîskar Zumrud xanimê daye cîwar kirinê. Wê ew helbest-rastsera bi navê «Teyrê Eylo” rewayî xatirê Elî Galavêj kiriye. Kî bû Elî Galavêj?

Serpêhatî-serbuhuriya Elî Galavêj, ya ku ewî bi destê xwe nivîsîye ber destê meye. Ji wê çend gotinbêj: «Ez, Elî

Ahmedê Hepo -----

Galavêj sala 1922-a li Mehabadê, Kurdistana û Iranê hatime dunê. Sala 1931-ê li Tebrizê çûme mekteba destpêkê, pey xilazkirina mekteba navînra sala 1941-ê vegeŕime welat. Hema wê salê tevî heja-azadarîya gelê kurd bûme. Sala 1946 derbazî rîza Partiya Demokrat ya Kurdistanê bûm, him jî cêrga leşkerîya welatda cî girt.

Meha nîsanê sala 1946 hukumeta gel ya Kurdistanê bona xwendinê ez şandime Yekîtiya Rêspûblîkên Sovêtîye Sosialîstîye (Bakûyê)».

Pey hilweşandina komela Mehebatê ew nikare ve gere welat. Bakûyê da dimîne, aspirantûrayê xilaz dike, dîsertasîyê diparêze.

Çawa ulumdar ew hetanî sala 1984-a Akadêmîya Ulma ya Bakûyê da karê dike. Bona gelê xwe karê ulmîye kûr û dûr dinivîse.

Usa bû, jîyanêda min û Elî Galavêj çend sala hevra dostî û biratî kir. Ez gellek cara bûme piştovanê ronahî dîtina gotarêñ wî.

Gava li Iranê text-tacê şahfîyê hate hûrxashîrinê, hukumeta nûh xwedêgiravî destûr da, hemû êmîgratêñ siyasî vegeŕine welatê xwe.

Bî tevî gellek kesan Elî Galavêj bî hesreta sala, vegeŕi welat.

Lê şirîtdara, ku bona Elî Galavêj ji sala 1947-a hatibû damizrandinê, danînê sala 1984-a ev ulumdarê naveyan têda hate dardarkirinê. Ew bû şehîd.

Di efranîka navkişandîda bi serî nîgara teyrê qefesê rîya jîyan, rîya şerkarîya azadarîya bi hezaran ewledêñ gelê kurd, bi keser hatîye nitrandinê.

Ahmedê Hepo -----

Lê bawerî nayê undakirinê, lema jî nivîskar dibêje:

-Teyrê Eylo! Qe qefes li te nayê, ji ber ku tu kawî,  
serbilindî! Kawtî tu cara qefesêda cî nabe!

### TASA SİPÎ, AVA ZELAL...

Mirov hene, di jîyana xwe da kirinên qencra tevayî  
rêçen nûh dide vekirinê, bona mirovayê dixuluqîne,  
ser surêن sergirtî vedike. Vî alîda helbestvan, ulumdar  
û werger Şamîlê Selîm (Şamîl Esker Delîdax) hetav  
bû.

Dibêن, zimanê zarokan vebûnê dibêjin «Dayê», lê  
Şamîlê tifal gotiyê «Kurdum!». Dê jî bersiva wî usa  
daye:

Erê, lawo tu kurdî,  
Bê dewletî, bi derdî.  
Rojên dijwar me pirr dît,  
Vê dewranê, vî erdî.

Şamîlê Selîm salêن dirêj dilok-beytên dîya xwe  
Gulgeza Xelîl him bi kurdî, him jî bi zimanê azerîkî  
gotiye, nivîsiye û sala 2001-da pirtûkek daye  
weşandinê. Wêda dinivîse, ku bavê min jî, dîya min  
jî, dê-bavêن wan jî kurd bûne. Hê zarotîyê da dayîka  
şîrhelal, bavê kedkar nava ruhê wîda kurdhizî pêşta  
anî bûn. Lema jîyana xwe da di alîyê kurdzanîyêda  
çerçirî.

Beqî, Şamîlê Selîm Azerbaycanê da him Kurd  
hate naskirinê, him ji kurdzanî hate xemilandinê.

Emê jêrê derbarê jîyana wî da çend hevokan  
binivîsin û ser nêta jorgotî rewestin.

Şamîlê Selîm sala 1929-a li gundê Axcakendê, nehîya Kelbecerê, Rêspûblîka Azerbaycanê da hatibû dunê. Hê zarotîya xwe da hînî kedkîrinê bû. Xwe xwendinê girt, dersxana deha xilaz kir, kete înstîtûta pêdogojîyê, xitimkir, bû dersdar, mamoste. Mekteba Partîyeye bilinda hate pejirandin, ew serhevda anî û diploma sor stend, peyvîrên berpirsiyar û bersîvdarda kar kir. Lê ew nava van karkîrinada hilnehat. Ewî xwe da ser rêke mayîne ronahîdarîyê- bi bedew-nivîsarêva mijûl bû, diefrand. Ewî du alîya da kuling lêdida. Alîkîda bi Azerbaycanî dinivîsî, diefrand, poêzîya wêjeya Azerbaycanê dixemiland, alîyê dinêda gelê xwe Kurd jî bir nedikir, Wî alîda jî karê berbi çav kir. Şamîlê Selîm çawa helbestvan û ulumdar navdere. Behr-barê efrandarîya wî 30-pirtûkî zêdetire. Ji wana hineka bidine rêzê: «Helbestêñ hevdeng», «Ferhenga Kurdi-Azerbaycanî, Azerbaycanî-Kurdi», «Ferhenga mişarêñ zimanê Azerbaycanê», «Helbestêñ nûhdemî», «Ferhenga giliyêñ xuluqî» û yên mayîn.

Xwendevanêñ heja !

Hingî mirov hatîye dunê bihîstîye, gotine «dunya heq, rîya heq». Dibêñ «filankes çû dunya heq», yan «di rîya heq da çû». Çiqasî kûr-dûr mitale dikî, nikarî ji bin van gotina derêyî. Daha rast mirov dudilî dibe: «Dunya heq ev dunyaye, yanê dunya, ku kî çûye venegerîye»? Yek jî, ji ci bawer nekî, wekî bi mîlyona mirovên vê dunyayê, dunya dinêra dibêjin «Dunya heq»!

Ezê ser rastîkê, heqîkê, qewmadinekê biseki-nim, binivîsim, ya ku helbestvan, ulmdar Şamîlê Se-lîmra girêdayîye, bila xwendevan bi xwe bêjin, ew dunya heqe, yanê dunya ku, mirov lê karê dike, diçercire, tirbê bi çaven xwe dibîne, çareke mayîn tê netêya dike. Û em mirovên vê dunyayê nikarin tilîya xwe dirêjî wê tirbê bikin, nikarin ji wî merzelê vê dunê, wê dunê tiştekî hînbin.

Belê, emê vê gotara kurtda ser karê wî, yê kurdzanîyê û ser neheqîyên zorêva yên ser rîya wî sekinî, rawestin.

Şamîlê Selîm bi dijwarîke mezînva mijara karê xwe yê ulmî ji wêjeya gelê kurd hildide û bi fermî dide rastandin. Derbarê efrandariya helbestvan Şêxmûs Cîgerxwîn da karê ulmî dinivîse û sala 1968-a wê dîsêrtasîya xwe diparêze û navê navzendê ulmê filolojîyê distîne. Hema wê salê pirtûka xweye bi navê «Helbestvanê gel» dide weşandinê. Xwendevanê Azerbaycanê ne ku, tenê efrandarekî kurd-Cîgerxwînva dibine nas, lê bi kurt gellek helbestvanê dinêva, him jî, rîya wane şoreşgerîyêra dibine nas.

Pey vê pitûkêra, ya ku bi heq, ya ser heqîye, rastîyê hatibû nivîsarê, hinek çavnebara, netewparesta destpêkirin, derbarê Şamîlê dilsax da derew hevanin, nivîsin; xwedê giravî, «Ew Azerbaycanê da Kurdîtîyê dide belakirinê, ew kesen ku ne kurdin, ew dibêje û dinivise ewana kurdin. Ew cîyên kurd lê najîn, dibê wira kurd hene. Bi vê yekêva ew dîrok û wêjeya Azerbaycanê dike bin şikê...»

Heqî ma alîkî, neheqî derkete holê...

Lê ev ewledê çiya, yê ku ruhê wî mîna hewa çiya paqîş bû, ji tu tiştî netirsîya û daha gavêñ mezin avît. Şamîlê Selîm dest avîte culetîyê û poyêma klasîkê wêjeya gelê kurd Ehmedê Xanî, ya «Mem û Zîn»ê wergerande bi zimanê azerbaycanî. Pirtûk sala 1976-a bi deh hezar tîrajava hate weşandinê. Lê mixe-neta qewmandin usa hevanîn û Mamoste Şamîl girtin.

Bona silsileta paşdemîyê-dahatîyê rastîyê û heqîyê bizanibe emê menîya girtina wî nefsdarê mezin bînîne ser zara.

Mamoste Şamîl wê salê serwêrê-serokê beşa perwerda gel ya nehîya Kelbecerê bû. Dersdarekî ji Kelbecerê mirovek kêr kiribû û hatibû girtinê. Ew ji kelê derketinê, rehmet lêbûyê mamoste Şamîl alîkarîke mezin dide wî.

Paşê ew dersdar tê, ji Şamîl çawa deyîn, dirêv dixweze. Mehekê şunda tîne diravê wî dide. Tu nebê, berêda ev tîvdîr tê kişandinê. Gava dersdar deynê xwe danê wî, mamoste Şamîl bigirin, dersdar jî radibe rû-yê wî, wekî Şamîl ji wî bertil xwestîye. Mamoste Şamîl tê girtin û şuxulê wî didin prokûratûra rês-pûblîkayê.

Rojekê ez jî gazî lêpirsînê kirin, gellek pîrsa ratevayî, ev pîrs jî dane min:

-Ew eyane, tu jî kurdî, hevalê Şamîlî herî nêzîkî. Ewê jî em zanîn, wekî heleqetîyêن Şamîl tevî kurdêñ dereke hene, hinekêñ împêrialistara hatîye girêdanê. Ewana kîne? Ewana ji Îraqêne?

Min bersîva wî awa da:

-Cara ewlin, Şamîl tu kurdekî welatê derekera nehatiye girêdanê. Ya duda, çima, hemû kurdên ku li Îraqê, Sûrîyeyê, Tirkîyayê, Îranê dijîn, gişk împêriyalîstîn? Gellek ulmdar, nivîskar, helbestvanê Azerbaycana Sovêtê heleqetîyê wana tevî Azerbaycanê Îranêra hene. Wekî usane, ewana diji Sovêtêne, wekî usane, ewana dixwezin dewleteke nûh çêkin.

Axavtina min xweşa mustentîg nehat. Du roja şûnda ewî dîsa gazî min kir. Ez ketinê oda wî, qe silava min jî venegirt, min nihêrî pirtûka «Mem û Zîn» ya ku mamoto Şamîl wergerandibû, pêşberî wî bû. Ew rabû, pirtûk da destê xwe û got:

-Lê te digot, Şamîl tevî tu împêriyalîstekî dostîyê nake?

Paşê ewî pirtûka destê xwe dirêjî çavêن min kir, bi dengekî rik axavtina xwe domand:

-Lê torîvanê vê pirtûkê ne kurde? Ew dujminê Sovêtê nîne? Dibêن Şamîl her êvar bi wîra dipeyîve, dixweze li Kelbecerê, Laçinê, Gûbatlîyê, Zengîlanê Kurdistanekê çêke?

Ez jî rabûme ser pîya, min ji wî zêdetir dengê xwe bilind kir û gote wî nebirî:

-Lo, mala te nexwendî, kavila kulê bûyo, hela hilde pêşgotina pirtûkê bixûne, binê, yê pirtûk nivîsî sedsalîya çenda da jîye? Ew helbestvanê sedsalîya XVII-ne! Şamîl çawa dikare wîra dostîyê bike?

Dest li wî hejîya, cîyê xwe da rûnişt û her tenê bi destê xweva şanî da min, wekî rabe here...

Girtina Mamoste Şamîlra gellek pirsên neheq hene, derbarê wana da jî wê bê nivîsarê.

Me jorê got, wekî li Azerbaycanê kurdzanî bi Mamoste Şamîl hate naskirinê. Lê cîye bêjim, beri wergera «Mem û Zîn»-ê Şamîlê Selîm, sala 1975-a pirtûkeke nivîskar, helbestvan ya Elîyê Evdilrehman ya bi navê «Sîyanet» wergerandibû zimanê azerbaycanî û dabû weşandin.

Sala 1999-a Şamîlê Selîm dîsa xelateke mezin da kurdzanîyê. Ew jî «Ferhenga Kurdî-Aherbaycanî, Azerbaycanî-Kurdî» û «Ferhenga mişarên zimanê Kurdi» bû. Şamîlê Selîm ew çend sal bû ser pirtûkeke dîrokî «Kurd li Azerbaycanê» kar dikir. Dikarin bêjin, ew pîrtûka pirr hêja bi tomerî hatîye nivîsarê, tenê dimîne li wê xwedî derên.

Şamîlê Selîm di jîyana xwe da timê li bilindwarê heqîyê bû, ewî bi ruh, hiş-sewdayê xweva ji Azerbaycanê hez dikir. Heyf, heqî destê neheqîyê da zare-zar bû.

Ger em jîyana Şamîlê Selîm, kirinêñ wîra bidi-ne hilatinê û hey bicedînin hêjayeke mezin bidinê, ditirsim emê nikaribin wê hêhana destnegîhîştî bidine mîze kirinê. Raste rast ew birîndarê gelê xwe bû. Lê em ku bêjin, weki mesela gel ya jêrê, bona yên mîna Şamîl hatine efrandin, emê hinekî bigihîjne heqîya Şamîl, bira, gel gotîye:

Tasa sipî, ava zelal,  
Hilde vexwe, li te helal!

Ahmedê Hepo -----

Xwendevanên birêz!

Naha hûn bi xwe bêjin, rastî, heqî, paqîşî, tasa sipî, ava zelal û zulm, qetilkarî, buxdankarî, mixeneti  
vê dunêye, yanî wê dunê?

Kovara «Dostanî»-  
«Drûjba» N27, sala  
2005-a, Moskva.

## ÊSSÊ

Elemdar Cabbarli,  
helbestvan, Endamê Yekîtiya  
Nivîskarê Azerbaycanê.

Tu taqeta jûnîyêن me bûyî, malameye ava bûyî,  
nûra çavêن me, lütka me, çiyayê me, Delîdaxê me-  
Şamîl Delîdaxê me bûyî. Lê naha daxa sîngê meyî. Te  
digot:

- Erdê ketinê mîna dara fitrikê jorda ware, bi çokêن  
lerizî erdê nekebe.

Hey-way tu ne ku mîna dara fitrikê, lê mîna çiyakî-  
mîna Delîdaxê erdê ketî. Te pişta me şikênan,  
jûnîyêن me qatkir, mala me wêran kir. Ne ku tenê  
mirovan şîna te dikirin, lê çiyayê Delîdaxê lerizî,  
Mûrovê hewar-gazî daxist, binavşê porê xwe veçirî,  
sosinê pêşîra xwe qelaşt, çemê Terterê xwîn vereşîya  
... Ez hîn bibûm derbarê teda deng-besa bibihêm.  
Rojekê digotin pirtûka wîye nûh ronahî dîtîye, rojekê  
digotin ewî nûhdemî anîye nava wêjeya me, dîsa bûye

Ahmedê Hepo -

piştovanê êlê. Rojekê jî digotîn filan rojnameyêda nivîskaran, ulumdarên navdar derbarê serfiniyazî, bilindaya teda gotar nivîsîne. Ew jî dihanîne ser zara, wekî filan rojnameyêda derbarê teda nivîsîne, netutiştan kevir avítine bostanê te. Lê deng-besa ku, min vê carê bihîst ne mîna yên mayîn bû. Gotin ewî dunya xwe guhastîye, ew yek qe nehate bawerkirinê. Vagîf Semedoxlu<sup>1</sup> dibêje:

- Min carekê xwîntêla dunyayêye here giran desteka têlêfonê bilindkir gotîn Yûsîf<sup>2</sup> dunya xwe guhastîye.

Gava desteka têlêfona, ku besa mirina te gîhande min bilindkirinê, min ew giranî tê derxist.

Ez bawerim hetanî dawîya jîyana xwe, ezê nikaribim ji bin wî barê giran derêm. Vê dunya xap-xapokda tu jî wan pênc-şes kes bûyî, wekî min miqîm ji te bawer dikir, hiz dikir, bi heyîtiya teva bîn dikişand, tenê te ez fem dikirim, bi mirina teva ez jî mirîme.

Helbestekêda, ya ku te minra nivîsîbû dibêjî: «Ez ser hev, ser hev temê didime te, mîna xalê xwe xizmetî welat bike». Bona ku, mîna te welatra xizmetê bikim, gotî ez bibim yekî mîna te.

Bona ku bibime yekî mîna te, pêwîste bibime yekî mîna Şamîlê- Delîdaxê. Bizanbe kesek nikare bigihîje bilindayî, lûtka-Şamîl Delîdax!

---

1.2-Vagîf, Yûsîf – kurên helbestvanê Azerbaycanêyi navdar Semed Vûrxûnin.

Ahmedê Hepo -----

Arşîva minda nivîsareke teye dawîyê jî heye . Nivîsara ku te bi destêن xwe nivîsîye, nivîsara ku te nexweş-nexweş nava cî-nivînada nivîsîye, ya ku te hinekî berî mirina xwe nivîsîye. Te hevalekî xwera name- hîvîdarîk nivîsî bû, wekî mîn hilde ser kar. Ew

nivîsara ku min dişêwand paşdemîyê di jîyana minda wê bibe rêçekê, naha bûye daxa ber çavêن min.

Emê mezinaya te, xalotîya te paşê tê derxin. Ê, kî zane, diqewime qe paşê jî tê dernexin.

Dunyayê mirovekî herî kîrhatî-xêrxastî unda kir, Azerbaycanê helbestvanê xweyî mezin, ulmdar, nefsdarê civakîyê, Kelbecerê mirovekî xweyî bêhimber, Axcakendê rênîşandar, rîdansipîyê xwe, nesila me serkarê xwe, dîya min birê xwe, xûşkêن min xalê xweyî ezîz, Elemdar Cabbarli helbestvanê dostê xweyî herî nêzîk, hogirê qelema xwe unda kir!

Ez bi Xwedayê mezinkim, ew dunya ku tu têda najî, ber bi wê qe hewasa mine weke bendekî riziyayî nemaye. Ez nabêjim de bi xatirê te, dibêm hetanî ruhê me bigîhîje hev!

Ji zimanê Azerbaycanî  
werger.

## «NA» BÛ BA

100 sal- di bîranînada

Zarok hatinê dunyayê kesek pêşta nizane ewê bibe xwedanê ci pêşeyî. Her ku sal ser Osmanê tifalra derbaz dibûn dê – bavê digotin:

-Ew zarekî jîre.

Lê wana nizanibû ev ewledê wanî jîr, êgin wê rîya jîyanêye xaro-maro, dijwar ya bi kelemra derbazbe û bibe xemildarekî rûpêlê wêjeya gelê kurd. Helbestvanê navdar hevpeyvînekêda dibêje: «Mesela jîna min çirokeke dirêje».

Xwendevanara wê bi hewaskarbe, wekî em bi kurt ser wê çiroka dirêj rawestin, nuqî kûraya wê bibin.

Osman Sebrî sala 1905-a li Kurdistana Bakûr, gundê Naricê hatîye dunê. Dibistana wîye ewlin ew malbeta wane giran û mezin bûye, zanîgeha jîyana wî ew rewşa gelê wîyî pir mîlyon bûye.

Gava sal derbaz dibin, ew dibe zarokekî sivik, dikebe nava pite-pit, nivişt- nivîsarên mellan, şeyxan.

Gava dibe cîwanekî simêl nûh xweydayî hukum, sîtem û bondora axan, began rind dibîne, lê nikare serederîyê ji van kirinêñ pûç, xap-xapok derxe.

Çawa Osman Sebrî bi xwe dibêje: «Piştî ku min sertefika xelas kiribû, mamosteyek şandibûn gundê me. Navê wî Îsmayîl Efendî bû. Ew jî kurd bû». Ewana hevra dibine nas. Mamoste Îsmayîl bi carekêva

Ahmedê Hepo -----  
dunêdîtina wî dide guhastinê. Ji wê rojêda ew dikebe  
xemxurîya gelê xwe û rastî nebînîyan û ecêban tê.

Çi bûn ew?

Kurdan rabûn, gotin:

-Em kurdin, neyar û nexastîyên wan bi wan  
kenîyan û gotin:

-Na!

Bi zimanê dîya xwe biaxivin, gotin:

-Na!

Kilamên xwe bistirên, dirix kirin û gotin:

-Na!

Dayîkan zaro anînê dunê, pêwîste navê kurdan lê  
kin, gotin:

-Na!

Mirovên mirî bi erf-edetê xwe defin kin, bi  
şivêta xwe ser meyt şîn-girîyê xwe bikin, gotin:

-Na!

Lê wekî ne gotana «Na» qe gelanra ewqaş zulum  
ne dihate kirinê.

Alîkîda jî «Pak» bû, «Qenc» bû gotin:

- Na!

Wan – «Na»ya bi dehan, bi sedan, bi hezaran  
Osman Sebrî derxistine meydana wêje, şoreşê,  
şerkarîyê, siyasetzanêن dunêeyan pêsta anîn, rêvebir,  
serok gîhandine bilinçîya! Alîyê dinêda – Na! Bû ba!  
Bû ba – bager, bahoz – lêyî, zîpik- birûska gelê  
pirmîyon. Vana gişka xwera şerkarîya heq, tovê  
azayê, serbestîyê, rizgarîyê anî! Çawa naha, di  
sedsalîya bist û yekêda ulmdar, zanîyarêن gerdûnê

nikarin pêşîya erdhejê bigirin, a usa jî dijmin, neyar û nexwestîyên kurdan nikarin pêşîya azaya gelê kurd bibine hasêgeh. Ew hasêgeh idî leqîyaye, derz pêkete-tye, rizîyaye. Beqî wan «Na»yên wan – Kurdistanê seranser azabe.

Belê, ez benî, ez gorî: Wan – «Na»-ya Osman Sebrî avîte hemêza sîyasetê. Dujmin xwest wî bitirsîne, ruhê wîyî netewî hizîyê bişkêne girt, avîte kela û zindana. Lema jî akadêmîk, doktorê ulmê filologiyê, profêstor Knîyazê İbrahîm di pirtûka xweye bi navê «Kurd: ênsîklopêdiya biçûk.(Oçerkên dîrok û çandê)» da dînivîse, wekî salê ku, girtingehan da derbaz kirinê, tevgelîya wîye tevî şoreşen gel, yên mezin, yên Agrîyê û Zîlanê, careke mayîn kelên Mosûlê û Bexdayê, nefikirina wîye li Emmenê, Palestînê, serbarê serda, ya li Madagaskarê – van gişkan rêça xweye here nebîrkirî ser efrandarîya Osman Sebrî hîştîye.

Pey van zulm, neheqîyaran xortê 24-25 salî bê gav dimîne û bi dilêşî ji welatê kal-bavêن xwe dertê. Osman Sebrî sala 1929-a tê dertê Sûrîyayê. Gel dibê, ku Xwedê dergekî ser mirovada dadide, dergekî dinê vedike. Dergê vekirî ne ku bona Osman Sebrî, lê bona gellek ewledên kurdan, yên ku xwe dabûne ser riya daxweza gelê xwe, bû ew, wekî sala 1930-î Mîr Celadet Bedirxan tê Sûrîyayê, bajarê Şamêda cî-war dibe.

Ew nava 2-3-ê salanda karê karekî mezin, giranhêja dike. Ew keştikê bi barê ziman, wêje, dîrok, çand, erf-edet, bi serdewraneke nûh, bi elîfbayêva bar dike derdikeve nava bereke bi bahoz û bi alîkarîya Qedrî, Ekrem û Mihemed Cesîl Paşa, Hemzeyê Miksî, Kamran Bedirxan, Cîgerxwîn, Nûredîn Zaza, Rewşen Bedirxan, Osman Sebrî û gellek-gellekên mayîn seredana xwe çareser dike, ronahîke ne temirî, çîyakî bilindî ne hedimî, kovara «Hewarê» dide weşandin û heta-hetayê gelê xwera dihêle.

Helbestvanê azayîhez, dilgerm miqîm vê kovarêra tê girêdanê. Helbest û serpêhatîyên Osman Sebrî, bi gilîkî hemû efrandarîya wî ser bîn-buxs, bedewî, dewlemendîya welat hatine efrandinê, nitrandinê, xuliqandinê. Wêra tevayî destanîke here mezin ewe, wekî helbestên helbestvanê nemirî îrora, sed salên dahatîra wê gavdin, ewana tu dema nacilmisin.

Mirov dikare bi dehan helbestên wî çawa minak derxe holê, çawa yên mîna «Dongîya çeqel», «Marşa Felatê», «Rûvîyê ker», «Cejinpîrozî», «Daylan» û yên mayîn, lê ser helbesta «Marşa xortan» rawestin her tiştê zelal bc. Helbestvanê şoreşgevan helbesta nav kişandîda dibûjc:

Kurdin em şêrên çîyanin, de bijîn serbest û gur,  
Doza me tola wenate, bistînin bi qevdê şûr.

Belê îro jî şervan, mîrxas, xortê kurdan li serê çîyanin û bi heqîya Xwedê, bi demokratîya hemû mirovên dil paqîş dewa azaya wenate xwe dikin.

Dawîya helbestêda Osman Sebrî karnîyarî xortan dibe, bona rizgarîya welat hewarîyê, gazîyê wan dadixe:

Xortno, rabin dem nêzîk bû, bo felatê şer kirin.

Felat-rizgarî bûye hevîrtîrşkê efrandarîya helbestvan Osman Sebrîyê kilasîk.

Helbestvanê xwedanê navê bilind di alîyê bedew nivîsara rastsere, serpêhatîya jî dinivîse, diefrîne. Wekî em bejin bingeha wan, çavkanîya wan, ya payê pir, ji zargotîna gel hatîye emê tu şaşîyan, çewtîyan nekin. Cîyê bêjin lêkolîvan daha gellekî ser helbestên wî disekekin, şirovedikin, kêm-zêde wana dihêjînin, lê nivîsarên wîye rastsere ji poyêzîya wî paşa namînin. Rastser, serpêhatî û gotarêن wî xwendevana rewşa gelra, buhust-buhust li çîya-banîyan, kanî-çeman, dîdema xwezaya welatra dike nas. Çawa minak helbestên jêrîn bidine kivşê.

«Agirî», «Nêçîra hirçan», «Gotinêن şopewer», «Warê min ne î kore», «Jîna Jinekê», «Beraz û Berazî» û yên mayîn.

Bona nêtêن xweye jorgotî makkin em berê xwe bidine «Agirî»ya Osman Sebrî. Helbestvan dibêje, ew ne mîna hemû çiyaye. Wî çiyayî bêjimar xizanîya mirovan dîtîye, hey bûye şehedê xwînrêtina neheq, «Zeman-zeman lavelavêن pir mirovêن wekî min ên derdimend bihîstine».

Serpêhatîya «Nêçîra hirçan» da xwendevan dibîne çawa hirçê bi hêz nêçîrvan dibe ber dergê mirinê. Nêçîrvan xwe mirî davêje, hirç jêra tîrbê

dikole, wî binax dike, wekî laşê nêçîrvan genîbe, paşê bê buxwe. Hirç çûnê şûnda nêçîrvan ji tîrbê dertê diçe gundê xwe û çendek derbaz dibe birê xwera tê wê derê. Ewana bi tevayî hirçê dikujin. Osman Sebrî dilbirîne. Ewî ew nexweşî, ew derdkêşî ji wê yekê girtîye, wekî nava kurdanda yekîtî tune. Nêçîrvan tenê bi hirçê nikaribû, lê gava hêz gihîşte hêzê, wana ew genîxwer kuştin û ewana serbest bûn.

Xwedê dayîn dabû Osman Sebrî bû helbestvan, him jî mêze kir, ku neyarêñ gelê wî, zimanê dîya wî nana dike, bû zîmanzan, dîroka gelê wî reş dike, bû dîrokzan, pirsa hebandin û ola gelê kurd hevdixin, bû lêkolînvanê olê.

Berî her tiştî Osman Sebrî ji zimanê dayîka xwe hîzdikir û bona paqîşîya wî şerkarî dikir. Bi gorîya me ber şêmîka 100 salîya bûyîna helbestvanê navdar wê him rindbe, him jî ruhê wîyê şabe, wekî em nîteke wîye derbarê zimînda bînine holê û çend xwestinêñ xwe bînine ser zaran.

Helbestvanê nemir dibêje: «Her bêjeyek kevirêkî avahîya zimane... Gava kevirekî neçêkirî bînî têxî nava kevirên şekirî û çekirî dîwar wê xwar bibe».

Hewcî nîne mirov nîta helbestvan şiroveke, ew zelale, şîretekî rîdansipîyaye, gotineke hişkûrare. Lê xwestina me jî eve:

-Sedsalîya bûyîna Osman Sebrîra girêdayî, me bi hewaskar bernameke têlêvîzorê mêze kir, guh da du caméra. Yek bernâme weşand, yek jî gotin lêkolînêre.

Çawa rehmetlêbûyê Osman Sebrî dibêje, her bêjek kevirekî avahîya zimîne, lê giliyê «lêkolinêr» nikare cîyên xwe zimanzanîyêda bigire. Ji ber ku di nava guhêrkerê zimînda ne «nêr», ne jî «êr» heye. Yek jî tiştekî lapî safî bêjin:

- Guhêrkerê bêjan, yên ku pêse didine kivşê yek jî-«van»-e. Awa şivan, gavan, baxçevan. Lama jî «lêkolîvan» daha raste, ne ku «lêkolinêr».

Mirov dewsa «Bêrîvan»-ê dikare bêje «Bêrînêr», yanî «Berîer», wekî na, lê çima tê gotinê «lêkolînêr»?

Em xwedanê zimanekî dewlemendin, rewş bi rewşin. Çima dikebine bin bandora zimanê cîran.

Lekolîvan, wêjezan, rexnekar şêwaz-janreke bedewnivîsarêra dibêن-«Çirok». Çirok nava hemû gelê kurdan da tê zanînê awayekî zargotina gel. «Hebû, tune bû, pîrek hebû. Bizineke pîrê hebû»... bi gorîya min wê janra bedewnivîsarêra bêjin:- Serhatî, yanê- serpêhatî.

Naha hinek dixwezin zimîn dewlemendkin, lê zirarê didin, ji ber ku, ewana dikebine bin bandora zimanê gelê dinê. Em dibêjin ziman-zimanzan, dîrok-dirokzan, ne ku tiştekî mayîn.

Têlêvîzoreke me dînivîse, dide kivşê: sibê, êvarî.

Sibê-sibê ezê herime bajêr. Lê gel dibê: ro. Minak: sibê ezê ro seheta deha herime bal dîya xwe. Êvarî na, lê êvarê.

Yek têlê dixe, yê bermame weşandî dipirse:

- Tu ji ku digerî?

Tera çi ez ku digerim, ez li mala xwe, li soqaqê digerîm, kêfê dikim. Pêwîste pirske:

- Tu ji ku têlê dixî? Yanê jî dipirşê:

- Tu kêderê rûdinêyî? Lê dewsa bipirse: - Tu kêderê dijîyî? Kêderê dimînî?

Dibên:

- Bernama me davam dike, çima nabêjin didome. Girtî bîrxist-na-girtî bîranî.

Jîyana xwe ji destdaye, awa dertê kesê mirî bi xwe, xwe kuştîye, lê rast eve bêjin: - Jîyana wî hate qusandin, yanê ew kes kuştin, yanê ew kes mir. Yekî bi tirkî namê stûdîyêra dişîne û dibê, biborînin ez bi kurdî nizanim. Belê, ev nerinde... Lê bernamebir, dibê: - Ev zora min çû.

Eva bersîv ji namenivîs xirabtire. Ew zora min çû-seranser hevoka tirkîyê. Dewsa wê mirov bi kurdî bi çend awayî dikare hevoka hev bîne. Minak: Ez ber xwe ketim. Dilê min êsiya... û yên mayîn...

Minakekê jî bêjîm:

- Yekî xwedêgiravî «rojnamevan» dinîvîse: Îmtîyaz u sernivîsar. Vira du gilî û gîhaneket heye. Hersêk jî şaşin, çewtin. Îmtîyaz bi erebîye, bi kurdî mafe, u ne gîhaneket, ew gotî - û bahata nivîsarê. Sernivîsar-wekî wergerinî tirkî-dibe yazı başligi. Ev bêvêc bi îmtîyaz u sernivîsar (ê) -dixweze bêje bêrpirsiyarê rojnameyê. Gel dibê, bihîstîye Hindo mirîye, lê nizane kêderê mirîye.

Ahmedê Hepo

Min tiştek bona xwe rind zelal kirîye, yê ku bi tirkî zane, bi tirkî mitale dike, bi kurdî diaxive, yê ku bi erebî, bi farsî zane ew jî wê rojêdane. Sedem çîye?

Ew kesena zehmetê nadine xwe, ji zimanê-giramêra kurdî, ji zargotina wê dûr ketine.

Bila her xwendevanek min biborîne ez ne zimanzanîm, lê nexweşê wê yekême bila zimanê me nekebe bin bandora zimanê dinê.

Apê Sebrî, rehma Xwedê li tebe! Ya me kurdan çîrokeke dirêje!

Rojnameya «Dengê Kurd»,  
Bakû

20/ 11-2005

## DERBA DİL

Dibêñ, zarok hatinê dunê, li ersê esmîn steyrka wî jî dixuliqe. Ew pirr, yanê hindik jîyanê, dunya xwe guhastinê «Steyrka wî ji esmana dirije». Eva behrê efrandarîya gele.

Ew çendek bû heval-hogir, dost-birayê min, helbestvan, zanîyar, lêkolîvan, welger, sergovendekî wêje, mirovê xwedanê ruhê paqîş Husêyn Kurdoxlû dunya xwe guhastibû û ya ecêb ew bû, gaveke şevê xew li min heram dibû, malda sebîra min ne dihat.

Baxê ser navê helbestvanê Azerbaycanêyi navdar Semed Vûrxûn pêşberî avayêmeye. Ji mal derdiketim

Ahmedê Hepo -----

diçûme wî baxî, êpêcekî ber peykelê Semed Vûrxûn disekinîm, diketime ramanê kûr. Ji mitala qetîyanê, çavê xwe dikuta erşê esmîn. Carna min tirê ewir mîna kewranekî giran-giran rê diçin, Husêyn Kurdoxlû jî serkêşê wane. Şevekê dîsa hatibûme wî baxî, dîsa ewir, li steyrkan mêze dikir. Min rind dît du steyrkên şewq-şemal dayî ji nava erşa birq vedan, derketin hatin rast fêza serê min sekînîn. Min ew hey mêze kirin. Welleh, billeh te hew dizanibû nuqandine dilê min, wekî ew steyrkên zo-yek ya Semed Vûrxûne, yek ya Hûsêyn Kurdoxlûye. Vê gavê ji qudraeta Xaliqê jorîn dengek hate min:

«Bizanibe, mirovan dunya xwe guhastinê ji hezar-hezaran steyrka yekê, duda narije. Ew steyrkên birq vedayî yek ya helbestvanê heq Semed Vûrxûne, yek ya Husêyn Kurdoxlûye navdare».

Dîsa şev ji şevê derbaz bûye, wî baxê ker-lalda ser rûniştekê rûniştime û bîranînê xwe pey hev didime rêsê, ew dibine torbendekê. Li ser wî bendrêzê bîranînê mine reng bi rengî-sipî, reş, qewir û yên mayîn hatine rêsê. Her morike torbondê şedetîya rojênu buhurîne. Him jî bi xwe pirsê didime xwe:

-Cara yekem min Husêyn Kurdoxlû kêderê dîtîye, em çawa hewra bûne nas?

Min dest avîte pêşa bîranînê xwe. Bi gorîya min ji hezar-hezar surêni dunyayê yek jî bîranînin. Ji wana hinek ser tê vekirinê, hinek heta-hetayê sergirtî dimînin.

Bîranîna ku pişta xwe dide heqîyan, rastîyan ew dibine gerzikê dîrokê. Bîranînên min derbarê helbestvan Husêyn Kurdoxlûda bê jimirin. Nasî, dostî û biratîya 30 salî zêdetir, kar kirin, behrê êfrandarîya wî her alî, rojêne meye reş-sipî, giran-sivik nava wan bîranînada hatine parastinê. Bixwezim, nexwezim ezê nikaribim wan gişkan ta-derzîyêrakim. Him jî minra dijware rûnêm şirîn-şirîn bîranînên xweye derbarê birîn, derd-kul, şîna xweda qalkim.

Bîranîn nivîsandina min ya derbarê Husêyn Kurdoxlû da bona min mîna mirovê ber şîritdarê sekinîye girane, dijware, zendegirtîye. Ji ber ku, ez hê jî bawer nakim Husêynê nûranî dunya xwe guhastîye. Ewî dunya xwe guhastîbe jî ruhê wî fêza serê mine û ruhêne me wê nasîyê, dostîyê, biratîyê, hogirtîyê hevra didomîne.

Bîranîn mîna mirovekî pispor, zane kete pêşîya min û ez birim derxistime Rewanê, salê 60-î yên sedsalîya derbaz bûyî. Zivistana sala 1960-î bû. Ez dîsa çûme dikana pirtûk-firotanê. Li meydana ser V. İ. Lênîn dikaneke pirtûk firotanêye mezin hebû. Wêda alîkî pirtûkên bi ermenî, rûsî, beşeke ne ewqasî mezinda pirtûkên bi Azerbaycanî û Kurdî dihatine firotanê. Esse heftê carekê dihatine wê dikanê. Pirtûkên bi azerbaycanî payê pirr ji Azerbaycanê dişandine vira. Li Rewanê salê bi çend nava pirtûkên bi Azerbaycanî û bi Kurdi jî dihatine weşandinê.

Xanîma pirtûkfiroş ez rind nas dikirim. Hema ku dihatime dikanê ewê pirtûkên bi azerbaycanî û yên bi

Ahmedê Hepo -----

kurdîye nûh ronahî dîtî dihanî nîşanî min dida. Min bi hewaskarîke mezin pirtûkên wêje, yên dîrokî distand.

Îcar jî pirtûkfiroşê çend pirtûkên bi azerbaycanî anî da ber min û got:

-Ev pirtûkana nûhin, yên ku me ji Bakûyê stendine.

Nava wan pirtûkada, yekê daha gellekî bala min kişande ser xwe. Ew pirtûka «Kurd edebîyyat almanaxi», («Almanaxa wêjeya kurdan») bû, ya ku dawîya sala 1959 ji alîye Neşriyyata Azerbaycanêye Dewletê da hatibû weşandinê. Hema wê rojê min ew pirtûk bi hewaskarîke mezin xwend. Wêda helbesten helbestvanêن Kurdan, yê Feqîyê Teyran, Hejar, Çigerxwîn, Ganê, Seyfûl-Gûzat, Hêmîn, Rehîm Qazî, Agrî û serpêhatîya Kerîm Eyûb hatibûne weşandinê. Ew helbestana û serpêhatî ji zimanê kurdî, ji alîyê helbestvanêن cuda-cuda da hatibûne wergerandinê. Nava wan wergerada navê Husêyn Kurdoxlû hebû.

Ewî helbesta Rehîm Qazî ya bi navê «Wêneyê hizkirîya min» wergerandibû. Rind tê bîra min ev herdu rêzen jêrîn ser lêvê hemû xwendevana bû.

Аш, кюнлцмцн илк сирдаши, бу эцн алдым шяклини мяң,

Юпцб гойдум эюзцм цстя, бу йухудур, нядир эюрян.

-(Ax, tu rewşa dilê min, wêneyê te stend îro min,

Ahmedê Hepo -----

Paçkir da ser çavaye, eva xewne, yanê cîye?)

Awa, min Husêyn Kurdoxlû dûreke naskir. Ewê jî bêjim ev pirtûka navkişandî zû hate firotanê. Paşê me çend cîwana wezîriya Çandê, ya Rêspûblîka sovêtêye sosalistê ya Azerbaycanêra name nivîsî, wekî ji wê pirtûke 100 hebî dubare bişînine Rewanê. Nava wedekî kinda Rewanê ji 100 zêdetir ew pirtûk stend. Ewa zû hate firotanê.

Bîranîn qewmandinên salanra girêdayîne. Ji dostîya meye 30 salî zêdetir ezê çend qewmandinên wan salan bîr bînim.

Sala 1961-ê

Êz cara duda dîsa bi dûreke Husêyn Kurd-oxlûra bûme nas. Wê salê berevoka helbest û poyê-mên helbestvanê Kurd-Hejar bi zimanê Azerbaycanî ronahî dîtibû «Kûrd nêîmêlêri» («Kilamên kurdî»). Cîye bêjin berî ronahî dîtina vê pirtûkê sala 1959-a helbestvanê mezin Hejar hatibû Bakûyê. Em ji çapemeniyê pêdihesîyan, wekî Bakûyê bi rûmeteke mezin helbestvanê kurdayî navdar pejirandîye.

Ev pirtûka pirr hêja, helbest û poyêmên ku daha gellekî Husêyn Kurdoxlû wergerandibû, alîkîda xwendevan bi wêjeya kurdanra dikire nas, alîyê dinêda navê Husêyn Kurdoxlû hate hezkirinê. Wê pêda ez hey pey vî navî ketim, her helbesteke wîye ku, dihate weşandinê, bawer bikî ez dibûme xwendevanê wîyî ewlîn. Ziman şirîn, nêt kûr-dibûne kilamên dayîkê.

Vira pêwîst û girînge pêşderekê (haşîye) binîme holê.

Sala 1970-î

Min ïdî ïnstîtût xilazkiribû û rojnameya «Rya teze»-da kar dikir. Lê hinek dijwarîyên jîyanê û pirsên sîyasîra girêdayî sala 1970-î min bi malbeta xweva barkire Bakûyê. Û beqî xêrxaza Îdara sereke, ya çapemenîyêda parastina sura dewletê da ketime ser kar.

Rojekê ez çûme Akadêmîya ulma, ya Azerbaycanê û Husêyn Kurdoxlûra bibime nas. Ew deh sala zêdetir bû ez wê hesretêda bûm, wekî Husêyn Kurdoxlû bibînim.

Ev yek minra hevhat. Hema dema rast hatinê ewî dilê minda cî girt. Axavtina wîye şirîn, ya bi zanîyarî, çanda wî, rewşenbîrîya wî, zanebûna wî ez heyr-hejmekar hîştim. Me çend seheta hevra axavtin da derbaz kirinê.

Ewî pirtûka xweye nûhe weşandî «Poêzîya helbestvanê kurdâyî nûhdem Abdulla Goran»da min.

Hevoka vê karpêkêye ewlîn çawa minak bînime holê: «Mîna hinek gelên Rohilata Nêzîk û Navîne hên wêjeya gelê kurd, ya ku bi sed salava rêke dirêje kûrra derbaz bûye heye».

Ev hevok şedetiya wê yekê dide, wekî ulmdar ne ku tenê wêjeya Azerbaycanêye zargotî û ya nivîsarê zanîbûye, lê bi tomerî wêjeya Rohilatêra nasbûye, ya gelê kurd bi her alî xwendibûye.

Ahmedê Hepo -----

Monografiya wiye hewaskar, ya ku bi zimanekî bedewî, lê bi ulmî, hunerî, bi zehmetê lêkolîvanîya giranva hatibû nivîsarê, ji tixûbê rêtîma Sovêtêye hişk derbaz bû, li Baxdayê bi erebî hate weşandinê.

Ji wê rojêda em hevra hatine girêdanê, paşê em bûne dost. Me ser pira dostiyêra gav da, em çûne malên hev, hatin, em bûne bira.

Havîna sala 1970 cara yekem bi fermî, bi komandîrovkê çûme Laçinê. Mera usa li hev hat ez û Husêyn Kurdoxlû bi maşîneke «Volga»yêda tev vegerîne Bakûyê. Ser wê rîyê karê min li Stêpanakêrtê (Xankendê) hebû, em çûne wira. Paşê hatine Axdamê. Em ji Axdamê derketinê, rêva min gote wî:

-Helbestvan, dinihêrî bona ermenîya her tişt hatîye xuliqandinê. Ewana ji gellek nehîyên Azerbaycanê rintir dijîn, rî-dirbêwan jî têne cuda kirinê.

Ewî qe dengê xwe nekir. Ci rast ev yek dilê min ket. Li rîbendêن Şamaxîyê em sekinîn, wekî hinekî hêsa bin û nîn buxun. Li wê derê Husêyn Kurdoxlû rabû, berê xwe da Laçinê û gote min:

-Naha,bihêle bersiva pirsa te, ya ku te li Axdamê da min bi du cînasava bidim.

Emê ji wan cînasa, yekê çawa minak bînine holê:

Yenê dê baş çêkim Aîdama gêrêk,

Qarqarin suları Aîdama gêrêk,

Bu yerin qêdrini bilmeyênlêrin

Qara gözlêrinê aî dama gêrêk!

(Gotî dîsa serîkî Axdamê xîm,

Avê Karkarê Axdamêra pêwiste.

Kî ku qedirê van cî-waran nizane,  
Bila avareş têkeve çavan)  
(wergera rastsere).

Ewî cînas xwendine şûnda me herda zûrbû êmekî rûyê hev mîze kir. Nizanim dilê wîra ci derbaz bû, lê dilê minra ew derbaz bû, wekî Husêyn helbestvanekî xwedanê dayîna Xwedêye. Seraser Azerbaycanêra girêdaye. Pey çend deqîqara ewî berê xwe da çîya û xwe-xwera got:

-Heyf!

-Husêyn, bira, -min ji wî pirsî, -tu heyfa xwe ci tînî?

-Ahmed muellîm, çawa tu zanî van nêzîka pirtûka min, ya cinasa wê ronahî bivîne, lê ev herdu cinasê nûh man.

-Qe ber xwe nekebe, hema naha rûnê wan cînasa binîvîse bide min, ezê bibim ser pirtûkêda bidime zêdekirinê.

Ewî ew herdu bend nivîsî dirêjî min kirinê, mîna zaroka soro-moro bû û got:

-Ev yek tiştekî dijware, ditirsim gilî bêne ser te.

-Tiş nabe.

Min helbest ji wî stendin. Bona xwendevanêna nahe bêjim, wekî Yekîtiya Sovêtêda her tiş bi plan dihate kirinê. Bona pirtûk bahata weşandinê, her kesî-ulmdar, nivîskar, helbestvan destnivîsara xwe dida weşenîkê dewletê. Paşê weşenîkê birîyar dikir filan pirtûkê ewqasî bi filan navî bê weşandine. Destnivîsar

Ahmedê Hepo -----

dişandine çapxanê dihate rêzkirinê, berî ronahî dîtinê didane sênzûrayê. Dergê wê Îdarê dergekî giran bû, her kesî nikaribû ew vekira. Çawa min jorê got, ez wê îdarêda dixebeitîm, min serwêrtî li çapxanên rêspûblîkayê, yek jî rojnamên nehîyan dikir.

Bi kurt, min ew herdu helbest cuda mora Glavlîtê lêda, rêdaktorê weşenîkêra da qayîl kirinê, bire çapxanê û pirtûkêda ronahî dîtin.

Êvarekê min helbestvanê hêjara qal kir, wekî min ew cinas ser destnivîsara te da, da zêdekîrinê.

Belê, dawîya sala 1970-î pirtûka Husêyn Kurdoxlû ya bi navê «Gulên zinaran» ronahî dît, ew herdu cinas rûpêlê 14-a pey hev hatine weşandinê.

Qewmandineke wê salê qewmî jî kete bîra min. Ew çendek bû min wîra têlênedixist. Êvarekê wîra têlêexistinê, ewî bi xwe desteka têlêfonê hilda, dengê min bihîstinêra got:

Soyuq qanîn Arazdîmî, Kûrdûmû?

Qêlbin yenê şiltaqdîmî, kûrdûmû?

Gözdêñ uzaq könûldêñ dê uzaqmış,

Heç demirsêñ yada salîm Kûrdûmû!

Wegera bi rêz:

Xwîna teye sar Ereze, Kure?

Dilê te dîsa nese, cî-war nabe?

Ji dûrî çavan, ji dûrî dil jî bûye,

Qe nabêjî bîr bînim, Kurdê xwe!

Min jî bersîva wî awa da:

-Bila Kurd jî bîra Xwedê derneyê!

Sala 1975-a.

Sal bi sal dostî, biratîya me daha jî zêde dibû. Îdî em ketibûne kirasekî. Husêyn Kurdoxlû efrandarîya minra şadibû, carna jî şêwir dida min. Ewî rind zanîbû, wekî xênî jî bedewnivîsarê, ez zargotina gelê kurdva jî mijûlim. Lema jî hey minra digot ez ji folklorê mijarekê hildim û dîsêrtasîyê binivîsim.

Ewî navê mijarê jî minra şêwir kir. «Beyt-serpêhatîyên Kurdanda motîvên mîrxasîyê»:

Sala 1975-a min ew mijar xwera hilda çawa mijara dîsêrtasîyê. Ew ji alîyê Akadêmîya Azerbay-canêye ulumda hate rastdandinê, ez bûme dîsertantê îstîtûta pêdagojîyê, serkarê min bû doktor profêstor Ferhad Ferhadov. Nava salekêda min taqî-îmtahanên bonaaspîrantûrê da, çend gotarêne mine ulmî hatine weşandinê. Sala 1976-a kovara here bi rûmêtîda «Azerbaycanêda» hejmara şesada, bi navê «Dastanlarda yaşayanlar» (yên beyît-serpêhatîyada dijîn) hate weşandinê. Ew gotar zûtirekê nava kurdzanîyêda bela bû.

Lê felekê nehîst ez wê xwestina Husêyn Kurdoxlû bigîhînime cî. Biraziyê minî mezin, Knyaz nexweş ket. Ewê bêjim Knyaz pey minra ji melbeta me yê ku xwendina bilind destanîbû mirovê duda bû. Înstîtûta pêdagojîyê kutakiribû, dersdarê zimîn-wêje bû. Ew xortekî bejin nîvce, bedew bû. Min ji wî gellekî hiz dikir. Xwendî-zane bû. Bi kurdî stranê hewasa

Ahmedê Hepo -----

mirova pêra dihat. Dengbêjekî şirîn bû. Ew nişkeva nexweş ket. Min her tişt hîst, pey nexweşîya wî ketim. Dawîyêda bire Moskvayê. Weke mehekê nexweşxanêda raza. Paşê doxtira bi vekirî minra gotin, ew rake. Dil li min peritî. Dunê serê min teng bû. Min ew por-poşman vegeerde mal. Meha gulanê sala 1976-a çû ser heqîya xwe. Wê şûnda salekê-duda min qelem neda destê xwe, wedê parastina dîsêrtasîyê hat derbaz bû. Îdî ez pey wê yekê neketim. Welleh Husêyn Kurdoxlû ji min gellektir ber xwe diket. Awa karê dîsêrtasîya min nîvcî ma.

Bîranînekê jî, ji sala 1975-a bêjim. Wê salê pirtûkeke Husêyn Kurdoxlû ya bi navê «Beşirandina kulîlka» ji alîye weşanîka «Gençlikê» hate weşandin. Eva weşanîka dewletê bû. Min ji kesên pêwîst hîvî kir, ew pirtûk kire planê û paşê jî da weşandin. Husêyn Kurdoxlû ser rûpêlê wêyî ewlîn ev rêz nivîsine û daye min: «Çawa bîranîn ez vê pirtûkê bi hestêن dilges rewayî birayê xwe, yê ku bona ronahî dîtina wê ji torîvan daha gellektir zehmet kişandîye, yê ku seranser xwedanê bilindaya Kurda-Ahmedê Hepo dikim.

15.X. 75. Hûsêyn Kurdoxlû.»

Ser van gotinê helbestvanê mezin û şekirdarda ci jî binivîsim ewê mîna tiştekî zêde bê kivşê.

Sala 1980-î

Destpêbûna sala 1980 îdara me-Glavlîte ji hu-kumeta ci evraqek stend û hinek pirsara tevayî wêda

Ahmedê Hepo -----

dihate gotinê, wekî destûrê nedin tu nivîsarek (hel-best, gotar, û yên mayîn) bi ìmza Husêyn Kurdoxlû bê weşandinê. Legeba wî Kurdoxlû hatibû dirixkirinê.

Ev yek weke birîn-nalîna bêmirazê min ez êşandim, dax kirim. Min hey mitale dikir, rê ji rîya dibijart evê yekê çawa bêjime Husêyn Kurdoxlû. Cara yekem ser qeydê heyî destûra min tune bû, ez ewê yekê bêjime Husêyn Kurdoxlû, eva tiştekî veşartî, sergirtî dihate hesabê. Alîyê dinêda minra dijwar bû, weke mirinê giran bû, evê yekê bêjime dost-hogirê xweyî nan-xoy xwerî, kesên ku rîya kurdzanîyêda karê dike. Wedek derbaz bû. Rojekê ewî minra têlê xist û bi dengekî lerîzî got:

-Ahmed muellîm, ez helbestên xwe didime kîjan kover, rojnaman li min vedigerînîn. Tu menîya jî nagirin, nabêjin. Lê îro yekî ker minra got ez berbirî Glavlîtê-sênzûrayê bim.

Vira dev-lêvê min hevket. Ewî wê deqîqê tiştek seh kir...

Werhesil, me birîyar kir em sibê li Akadêmîyayê rastî hev bê. Derbarê vê yekêda min serwêrê Glavlîtê-sênzûrayêra axavtin da derbaz kirinê û em hatine ser wê birîyarê, ewbin nivîsarên xweda binivîse: «Husêyn Alîşanov». Alîşanov paş -navê wî bû.

Em li Akadêmîyayê rastî hev hatin. Em êpêcekî hevra ketine nava derd-kulêن heyî, paşê ewî got:

Ahmedê Hepo -----

-Wekî ez sed salî bijîm, nehêlin ez Kurdoxlû binivîsim, ez jî tiştekî nadime weşandinê.

Nişkêva hate hişê min:

-Bira, were awa binivîse: «Husêyn K.».

Ew êpêcekî kete mitalên kûr, dereng-dereng, giran-giran berbirî min bû:

-Erê, diqewime ez wê yekêra qayîl bim.

Lê ez dudilî bûm: «Gelo, serokatîya sênzûrayê wê yekêra qayîlbe?».

Me ew pirs usa da safikirinê û helbestên wî-bi vê îmzayê hate weşandinê: «Husêyn K.»

Lê belê evê yekê gellekî nekişand, bila bi pesin nîbe, me ew dirix kirin ser Husêyn Kurdoxlû da hildanê, lê derba li wî ketî, deq-derza li dilê wî ketî nehate hildanê.

...Salê 1990. Yektîya Sovêtê dihate hilwesandinê, hejeke mezin hemû rêsپublikê Sovêtêye berê ketibû. Azerbaycanêda jî qewmandin pey qewmandina li hev dipicilikîn. Alîkîda pirsa Qerebaxa Çiya, alîkîda hundurê rêsپublikêda dew-xwestina kursîyê mezin. Ermenîya, Ermênistanê bi zorê bere 200 hezar azerbaycanîa, 20 hezar kurdên muselman kiribûn.

Van qetilkarîyara tevayî ermenîya Azerbaycan kiribûne nava dorgirtina û informasîyayê. Ermêniya li dunê dikire hewar-gazî, wekî Azerbaycanê qira gelê hindikjimar anîye. Wana bere talişa, kurdan, lezgîyan, rûsan û yên mayîn kirine. Gava ev pirs derkete holê hukumeta Azerbaycanê bangî gelê hindikjimar kir, rabin heqîyê bêjin û ermenîyan şermeze bikin. Pêwîst bû Azerbaycanêda Kurd, Taliş, Lezgî, Tat û yên mayîn sazمان, navendêne xwe bidine durivandinê.

Nîsana sala 1990-î barigeha Unîvêrsîtêta Bakûyêye Dewletê bi mirovava kim-kimî bû. Bi serkarîya me wê civînêda damizrandina Navenda çanda kurd û pirsa rojnamê dihate enenekirinê. Çivînê birîyar kir, ku navê navendê daynîn «Ronahî». Xwedanê van rêza jî hate bijartînê çawa sedrê navanda çanda Kurd «Ronahî»-yê. Çawa organa Navenda çanda kurd «Ronahî»-yê rojname pêwîst bû. Ser navê rojnamê pirr hucet çû. Herekê navek lêdikir, lê em hevra qayîl nedibûn. Husêyn Kurdoxlû jî beştarî wê civînê bibû.

Ahmedê Hepo -----

Ewî mîna şagirta destê xwe bilind kir û ji min destûr stend, rabû û got:

-Navê rojnamê daynin- «Dengê Kurd».

Min hê ne erê, ne na gotibû, mirovên civînêda destêن xwe hevxistin. Me qayîl bûna xwe da Husêyn Kurdoxlû û birîyar hate pejirandinê, wekî nave rojnamê daynin «Dengê Kurd».

Bi rôdaktorîya me meha çileyê paşin sala 1992-a hejmara rojnama «Dengê Kurd» ya yekem ronahî dît. Gotî bêjin ew rojname naha jî bi wî navî tê weşandinê!

Sala 1993-a

Husêyn Kurdoxlû pirr nexweş bû... Ez û bijîjk Dostelî Paşayêv (Ji Laçinêye) çûne mala wî. Ewî û jina wîye şîrhelal Ferîde xanimê bi besereke xweş em pejirandin.

Hetanî Ferîde xanimê mera çay-xurek amede kir, bijîjk li wî nihêrî, rêsêpt jêra nivîsî. Ewê jî bîr bînim, wekî me û bijîjk Dostelî zû-zû, tevayî serîk wî dixist. Husêyn Kurdoxlû ji Dostelîyê Müzeffer çawa bijîjk bawer dikir. Bijîjk jî him rûmeta Husêyn Kurd-oxlû digirt, him jî maşoqê efrandarîya helbestvan bû.

Gava me û wî idî «pêşa nexweşîya» wî berda, hatene ser efrandarîyê, Husêyn Kurdoxlî giran-giran ji cîyê xwe rabû, berbi pêşxwîna xweye nivîsarê çû, ser rûniştekê rûnişt, du pirtûk, ji pirtûkên serhev-serhev beravkirî, hilda ser nivîsî, da me. Em şabûn. Husêyn Kurdoxlû salêن dirêj helbestên Sarî Aşiq

Ahmedê Hepo -----  
berav kiribû, rîdaktorî lê kiribû û bi navê «Bayatîyên  
bijare» dabû weşandînê.

Xwendevanêن hêja!

Bîranîn, derd-kul pirrin, dijware merî gişka bîne ser zara. Pêwîste ewê jî bêjin, wekî hetanî dawîya jîyana wî me hevra biratî kirîye. Yek jî bila usa derneyê me hey ji xwe got, «kirina xwe», yanê jî «qencîya xwe» anî ser zara. Ez qestbende gilîyên «kirina xwe» û «qencîya xwe» dikime nava neynûka, ji ber ku ci ku min nivîsî ber kirin, zehmetê, ku Husêyn Kurdoxlû bona wêjeya herdu gela kirîye, ew hewcîne têkebine nava neynûka û qe neyêne kivşê. Lê derbarê Husêyn Kurdoxlû da pêwîste karpêk bê nivîsarê.

## AZAYÊ HEMÊZ KİN

Çi ku rûbayê dunyayê heye ew xemila wêye, lê mirov sertacê hemû rewşêye. Bi herêka hezar-hezar salava mirov gihîştine hev, paşê beş-beş bûne û gel pêşta hatine.

Dibên, naha dunyayêda weke 4-5 hezar ziman heye. Her gel bi zimanê xwe diaxive. Ji wan 4-5 hezar ziman, zimanek jî yê gelê kurde.

Her gel di nava qewilê dîrokêra derbaz bûye. Hinek gelan çarenûsa xwe kirine nava çarmedora aqar-axa Xwedê xuliqandî û lêbûne xweyî. Gelê kurd jî bi hezar salava ser axa xwe jîye, ew parastîye. Lê eva 500 salî zêdetire welatê vî gelî hatîye beş-beş

Ahmedê Hepo -

kirinê. Gelo, ci bû sedem, kî bû sûçkar-tawanbar? Bona bersîva van pirsa bidî, gotî sal bi sal, sedsal bi sedsal dîrokêra gavdî, têkevî nava kûraya wê, karpêkên bi lêkolîn, bi zanayarî derxî holê. Ew kara dîrokzana, ya akadêmîyan, ya înstîtûtane.

Lê her tenê bona heqiyê ewê bêjin, wekî ne ku di Rohilata Dûr û Nêzîkda, lê di gerdûnêda gelekî usa tune ku weke kurdan di rîya azayê, serbestîyêda ewqas xwîn rêtibe.

Dîsa pirs pêsta tê: lê kanê ew azayî? Bersîva vê pirsê jî ya dîrokzanaye. Em naxwezin têkebine kûraya dîrokê; gelo kurd gelê hêne, yanê ereb, fars û tirk. Gelo, kî ji ku hatîye, kuda çûye? Gelo, ew axa, ku iro him ereb, him fars, him tirk, him kurd ser dijîn ya kîjan gelîye? Bila ew nebe sedemê birakuştina gelan. Ya sereke, ya here ferz ewe, wekî iro ser axa ku hatîye navkirinê Tirkîya, Sûriya, Îraq û Îran, him jî hatîye navkirinê Kurdistan, kurd jî dijîn.

Lê belê, bona hinek me nelomînîn emê ji her çar besên Kurdistanê, çend rêz û hevokan derbarê şerkarîya rîya Kurdistana Îraqêda binivîsin.

Destpêbûna sedsalîya derbaz bûyîda li Kurdistana başûr (Îraq) bi serkarîya Şêyx Mehmûd Barzancî (1919-1923), paşê bi serkarîya Şêyx Ahmed Barzanî destbi şoreşen bona azayê bûn. Melle Mustafa Barzanî ji sala 1933-a (bi hinek navbirîyava) hetanî dawîya jîyana xwe (1979) şerkarîya azaya gelê xwe domand. Ewê jî bînine ser zaran, wekî di hafîyê van şoreş û şerkarîyada kurdên başûra Kurdistanê hinek destanîn

destanîbûn. Qe na, kurd bûne xwedanê çanda xwe. Vira bi zimanê dê mekteb, ûnîvêrsîtêt hatine vekirinê, bernamên radioyê hatine dayînê. Em bi heqî bêjin, wekî ev agirê azayê tu dema nehatibû temirandînê.

Me ew yek dît, ku xwîna neheq erdê nema. Rêjîma Seddamê qetilkar bi destî SAY hate hildanê, beşike gellê kurd kete dilana Azayê.

Pirsa kurdaye here hevalîyayî ew li Tirkîya-yêye. Li vira ew pirs kirine gilokeke mezine bi hezar girêfîkî. Sedemê wê ne gelê tirke, ne gelê kurde. Destpêbûna sedsalîya bîsta ser sîstêma kapîtalîzmêda sosîalîzm jî hate rûbayê dunê: kapîtalîzim û sosîalîzm.

Yekê dijî yekê şerkarî kir: şer rakirin, xwîn dane rêtinê, gelên dunyayê hevxistin. Dawîyêda sîstêma sosîalîzmê hate hil-weşandinê.

Naha jî du sîstêmên dinê pêşberî hev sekinîne, yek dijî ya mayîn him bi vekirî, him bi veşartî şerkarîyê dikin. Ew sîstêma xiristanîyê û ya îslamîyêye.

Gelê kurd bi piranîya xweva muselmane. Çar dewletên muselmanan-Îranê, Tirkîyayê, Îraqê û Sûrîyayê mîna gustîlekê kurd kirine nava xwe, hey dihincirînin. Yek dibê ew tirkê serê çîyanin, yek dibê ew farse zimanê xwe undakirîne. Lê dewletên xirîstîyane mezin, yêñ bi hêz, rind zanin kurd muelmanin û wanra dibên:

-Muselmanên we, we naxwezin naskin, binihêrin, wana zimanê we, çanda we, erf-edetê we, heyîtîya we

Ahmedê Hepo -----  
ji we stendine, her tenê emê alî we bikin, hûnê beqî  
me derêne azayê. Nîşana vê yekê Kurdistanâ başûre.

Eva çendî-çend salin xwîna herdu bira-ya tîrkan û  
ya kurdan tê rêtînê, gelo, serkarêne dewleta Tirkîyayê  
wê yekê nabînin, yanê tê dernaxin.

Warêne em hinekî salêne derbaz bûyî bîr bînin.

24 îlonê sala 1923 wedê li Lozannê, peymana nûh  
hate navandinê, wekîlê tirkîyayê İsmît paşa dabû  
beyan kirinê: «Tirk û Kurd-yekîtiya heyîtiya  
rêspûblikayêne. Kurd nehindik jîmarin, le netewîye:  
hukumeta li Ankarê, ew çawa hukumeta tîrkane, usa  
jî ya kurdane».

Wedekî şûnda Tirkîyayê sîyaseta xwe guhast û hat  
derket wê derê û got, wekî Tirkîyayêda kurd tunenin.

Sal pey sala hate domandinê, ruhê netewîyê,  
koziyên azayê hevalîya serhildan, berxudan pêşta  
anîn bûne şoreş. Ew şoreşana pey hev hatine  
temirandinê. Van serhildan û şoreşa pey xwe bayê  
azaya gur dihanî. Serkaran nihêrin bi zordestiyê  
tiştek nabe, gotin: -KURD HENE!

Tenê bona van herdu giliyan bi sedan, hezaran  
ewledên kurd û tirk hatîne kuştinê.

Kurdan ji serkara dew kir, wekî destûrê bidin, em  
bi zimanê dê biaxivin. Dîsa dirxkirin, dîsa kela,  
zîndan!

Dîsa meydana şer hate saz kirinê, dîsa ewledên  
herdu bira gulle avîtîne hev. Him hêzên hundure  
hevhizkirî, him hêzên dewletên xiristîyane mezîn

Ahmedê Hepo -

serkar lomandin û ew bêgav man gotin: Him kurd hêniñ, him zimanê wan!

Naha gava ew gavêñ mezin hatine avîtinê, kurd dibêñ:

-Bila zarêñ me bi zimanê dîya xwe bixûne, bila bi zimanê kurdî bernamên radio, telêvîzorê hebe, serkar geh dibêñ, erê, geh dibêñ na!

Ey serkarê hukumet, dewlet û serkarê çek dêstda! Çima bona van kirinêñ, ku li welatêñ mayîn tiş-qewmandinêñ biçûkin, gotî disa xwîn bê rêtinê!

Lo, birayêñ muselman!

Gava mîrovek xwe-xwe dukuje, întîhar dike Quran wê yekê napêjirîne, ser wî kesî ev kitêba evra nayê xwendinê. Bi gorîya me dema dewletekêda bira birê dikuje, serkar fermanê dide: -Dibê, êrişî filankesan bikin ew neyarêñ wenin, wana bikujin. Eva xwekuştin -întîhara bi sedan, bi hezaran ewledêñ wî welatiye, ya ku bi destî serkaran tê kirinê! Ew serkarana bîr dikin, wekî ew birayêñ gullan davêjîne hev ji paşila dayîkêñ cuda-cuda, ji paşilêñ dayîkêñ mîna xûşka hev hizkirî, cîranêñ here qenç hatine dunê, lê bi nan, ava axakê mezin bûne.

Hûn serkar ayêñ Quranê diteribînin. Hûn çavêñ dayîkan bi hêşir dihêlin, pişta bavan kûz dikin. Paşê navê ewledekî datînin şehîd, navê yê dînê terrorist. Na, rînd bizanbe herdu jî bi destê te hatîne întîhar kirinê. Navê te bi xwe Întîharkare!

Ger ji cîkî mayîn hinek bêñ êrişî axa welat bike, tu fermanê bidî, wekî hemû ewledêñ welat rabin nehêlin

Ahmedê Hepo -----  
neyar hatîye axa me dagirke, namûsa dê-xûşkên me  
pêpeske! Wê rîyêda kî bê kuştinê, kî ji ruhê xwe  
derbazbe ewe-Şehîd! Şîrê dîya te jî li te helalbe!

Van rojan pirsa efûyê derketîye holê. Ewê bi şert-  
şûrt, bi qewilava nedin.

Serkarêñ dewlet û hukumetan di nava salêñ  
rêvebirina xweda, ew bixweze, nexweze bona sîyaseta  
welat, bona kursîya xwe tişt, qewmandinêñ ne tê dike,  
gavêñ pêwîst, ne pêwîst davêje, xwera him qencîyê,  
him xirabiyê tîne. Lê gava ew kesekî, mirovekî, yê ku  
bona azayê, rastîyê, heqîyê şer kirîye û hatîye girtînê.  
ew bê qewil tê efükirinê, cîyê wî fermandarî esse li  
cinnetêye.

Di roj-wedê meda-çar kes prezidênt, serekwezîr,  
sedrê parlamentê, yek jî serek leşker rêvebirina  
dewletê, hukumetê welat dikin. Ey Çar kesno! Usa  
bikin nava muselmanada xwîn neyê rêtinê!

Usa bikin bila kitêba evra-Quran ser we bê  
xwendinê! Destê sar nekine nava netewîyê welat!

Li hezar-hezar gunda da dayîka tirk-kurd, ereb-  
kurd, fars-kurd tev dijîn. Gava jîyanê da  
qewmandinek, şipûkek, bobeletek diqewime ev  
dayîkan bawerîyê hev tînin, zarokêñ hev dispêrine  
hev.

Paşê têñ hev hemêz dikin, têne rûyê hev û zaran  
xwe hildidin dîbin!

Dibêñ, dayîkêñ meyê gerdûnê biflitînin! Hûn zanîn  
çîma usa dibêjin? Sebira dayîka pirre. Ewa hê dûrva

Ahmedê Hepo -----  
sekinîye û kirinên ewledên xweye kurîn mîze dike, lê  
rojekê dayikê bêje:

-Îdî bese! Lawo, wêda bisikine, ezê serkariyê  
bikim! Ger paşa venekişî, ezê şîrê xwe li te heram  
kim! Em dayîk hev hemêz dikin!

Nava wê hemêzêda cîrantîya qenc, hizkirin, xûşktî  
û bawerî heye. Rorobarîya cîrantîyê, hizkirinê,  
xûşktîyê-bawerîtîye, Azayîye!

Lawo, tu xwera Azayê dixwezî, yêñ mayînra  
girtinê. Tu destê sar dikî nava me, tu nahêlî em dayîk  
hev hemêzkin!

Rojnameya «Dengê Kurd»  
Bakû Gulan, 2003.

## TEYRÊ EYLO ZUMRUD

Rewayî xatirê mamosneyê  
birêz Elî Galavêj dikim.

Teyrê Eylo! Xuzla min tu vê rewşêda nedîtayî. Kezeva min kerî-kerî bû. Di nava qefesêda jî tenê bûnê, ji tengayê baskên te yên bona hesreta firînê daliqîne, nêrînê teye kawe-kaw temirîne. Teyrê Eylo, ne cîyê te li nava erşen esmîne hêşîndane, li bilin-dciyadane, tu çawa nava qefesa tengda cî-war bûyi? Qonceyê kevnî-rizîyayî mîna nîşana xwezaya te hiz-kirî, yê ku danîne bal te, ber çavêن te mîna daxekê tê kivşê. Seranser rewşa te, heyîtiya te nava xerîbiyêda hatîye hilatinê. Hesreta firînê, hesreta ewledan, hesreta hêlînê te dişewitîne, dipertîne, dikelîne.

Qefesa cîranda gur dijî, rûvî dijî, reşêlek, peranî, bûm dijî.

Çavêن gur dibiriqin, ew xwe diperitîne, hîviya mirare, rûvî ser gîhayê hişkîhola quncılıye ser hev, razaye. Reşêlek, peranî bi şevkorî li hatî-çûya mêze dikan. Jîyana qefesê bona wana çiqasî jî giranbe, ewana xwe weke te tengîjan, heyîtiya xwe derznakin.

Teyrê Eylo! Bedewî, bilindayî, mîzekirina te, fira te daye!

Gelo heqî, rastî, însaf kêderêye gava nahêlin tu bifîrî, jîyanê hizkî, hêlîna xweye helalda bijîyî,

Ahmedê Hepo -----  
nêrînên teye tavzer hizkirî danîşanî pêçiyêن qe ve  
hesin kirine!

Teyrê Eylo! Ez vê rasthatina, ku tu ewqasi  
nimizkirine, zêrandine, ya ku min dêşîne, diperitîne,  
naxwezim! Bona te bivînim, te naskim ev qefes çî  
minrane?

Teyrê Eylo? Qe qefes li te nayê, ji ber ku tu kawî,  
serbilindî! Kawtî tu cara qefesêda cî nabe!

Destêن ku tor li te alandine, qêmîşî te kirine bila  
hûrxas bin, qopbin. Bifire bigihîje hêlîna xwe,  
hizkirîya xwe, ewledêن xwe!

Bi çavêن têre-têr hey gerdûnê binihêre, bi dilê tijî  
şabe, jîyanê bi serfinîyazî derbazke. Kawîtîya xwe,  
bilindaya xwe, bedewîya xwe bide domandinê!

Ji azerbaycanî hatiye wergerandinê.

## بلاوكراوه کانى سالى 2007

- ٢٤٤- كتىبى ئەكادىمى / السنوات الاخيرة من حياة دولة الكورد الایوبية في مصر وبلاد الشام (٦٣٤ هـ / ١٢٣٦ - ١٢٦٠ م). للمؤلف / د. موسى مصطفى الھنسىياني.
- ٢٤٥- كتىبى ئەكادىمى / كوردستان لە بازىندى كىتىشەرى رۆزھەلاتىدا (١٩٠٠ - ١٨٠٠) لىكۈلىنەوەكى مېزۇوېيە - نۇرسىينى: كامەران مەممەد حاجى.
- ٢٤٦- ناوى كتىپ/ قۇناغەكانى حەجج و عومرە / نۇرسىينى: يوسف خوسىين وسو خۇشناو.
- ٢٤٧- ناوى كتىپ/ ديوانى صديقى جوانپۇقىنى / نۇرسىينى: مەممەد ئەمەن مەلا عەزىز جوانپۇقىنى.
- ٢٤٨- ناوى كتىپ/ ھونەرى ھاۋچەرخى عىراق، وەرگىپانى لە بىرۇسىيە وە / پروفېسسور دكتور محمد عارف.
- ٢٤٩- ناوى كتىپ/ چۈنیيە تى بەرىتەچۈونى ھەلبىزادەكان. نۇرسىينى / عەبدۇلخالق مەممەد مستەفا.
- ٢٥٠- ناوى كتىپ/ سەيرانى دلان / نۇرسىينى: غەریب عەللى عەزىز.
- ٢٥١- ناوى تىپ/ زىرىيى بىن مال / نۇرسىينى: ئەحمەدى ھەپقى.



نهجهه دی هه پو

# ریاست بین ممال

(بیبرانیزنا - پروفسنست)

۲۰۰۷ - هدویز

**PDF:**

# **Enstituya Kurdi ya Qefqasyayê**

**Web:**

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

**Tel.:**

+7 918 073 48 79

